



Ahmedê Hepo

Xemildarên jîyanê Bîranîn



Hewlêr - 2011

Ahmedê Hepo

Xemildarên jîyanê
(Bîranîn)

Bakû-2010



***Wazaretî Roşinbiriû Lawan
barêwebarayeti Gîştî Rojnamegeri Çap u Bilawkirdinewe
Barêwebarayeti Çap u Bilawkirdinewe Hewlêr***

Nawî Kitêb: Xemildarên jîyanê (Bîranîn)

Rêdaktor- Fexreddînê Muzeffer

Korrêktor-Esliya Îsmayil

Rêzkara tîpên komputerê: Ofêliya Mecîd

Çap: Çapxaney Roşnîbîrî - Çapa yekê - Hewlêr- 2011

*La barêwebarayeti Gîştî Kitêbxana Gîştîyekan
Jîmara Sipardinî (1039) Salî (2011) Pêdîrae*

*Hemû maf di paprastîne Ji bo
Wazaretî Roşinbiriû Lawanû xawenî Kitêbeke
Em Kitêw Kitêbeka Wazaretî Roşinbiriû Lawan
Le Ser Em Sayte bixwênawe
www.kurdchap.com*

Xwendevanên bi rûmet!
Her bîranînek wedê cuda-cuda da hatîye
nivîsarê; rê hatine gihîştine hev. Yek
bûye piştovanê yeke mayîn. Piştovanî-
Yekîtiye. Yekîti^{ye} alfabûne!

Xemildarên jîyanê 2

Xwendevanên hêja!

Her pirtûkek nexşeke. Nexşên tevinên me reng bi reng, cuda-cuda, nav bi navin. Nexşê vê pirtûka destê weda bi tomerî bîranînin. Bîranîn – ew xwenaskirine. Xwenaskirina çi? Xwenaskirina rojên buhurî, jîyana derbazbûyî, hinek rûpêlên dîrokê, wêje, erf-edet, çand û her wekî din.

Rîya van bîranîna dûr, dirêj, weteya wan kûr, fireye. Bav-pîrên me ew yek anîne serzaran wekî:

- Tevin ku hate daran,
Namîne li waran.

Tevin-bîranînen min salên dirêj tijî dilê min bibûn, di wîrda hilnedihatin, hiş-sewdayê min disotin. Lema jî gotî ewana bahatana qal kirinê, nivîsarê. Ew bîranîn ne tenê bona min bûn, min rojên ne rehat, şevên bê xew derbaz kirin ku, wana binivîsim, bidime weşandin, bila ewana bibine hebûn-heytîya gel.

Bi zanebûna min her bîranînek derbarê kesayetîyê dunya xwe guhastî da peykele, lê bona yên zindî nasandine. Pêwîste, pirr girînge ew kesana û gellekên mîna wana tu dema neyêne bîrkinê. Ji ber ku, ewana xemildarê dîroka gelê xwe û jîyanê bûne.

Ewana mîna pêşîyên xweye pêşketî dibînin, têderdixin çawa neyaran, kirasê bêpêşîr di gelda anîne. Nexastîyan, buxdankaran, dijmîna heyîtiya gelê pirr mîlyon nana kirine, nana dîkin. Û herek navekî lêdike.

Lê mêrxasên van bîranîna û yên mîna wane bê jimar bi kirinên xweva derdikebine hêlanên bilind û digihînine cahanê em hebûne, em henin û me teqil daye pêştaçûyîna gerdûnê. Him jî ew bûne alîkar û piştovanên bi dehan, bi sedan, bi hezar-hezar mirovan; di çaranûsa wanda weynekeke mezin lîstine. Yên usa hatinê bîrkinê, em dîroka xwe reş dîkin, der-cîran jî hew dizanin kesekî meyî navdar tunebûye ûtune. Û Kirin, şerkarîya rîya wan erafan him jî bona wê yekê pêwîste bila silsileta dahatî ji wana fêrbin.

Derbarê her kesîda bîranîn nayê nivîsarê. Nivîsara bîranîna ji hinek wekokên bedew nivîsarê dijiwartire. Ji ber ku, bîranîna ku, piştî xwe ne kute heqîyan, rastîyan, hêjaya wê, wê bibe hêjaya kefa sabûnê. Dibên bi çavan bibîne, paşê bi dil bihebîne. Wekî nîgara mêrxasê bîranînê bi kirinê qencva, bi qewmandinên dîrokêva ne kim-kimîbe, hezar-hezar çavan ew dûr-nêzîpk neditîye, navê wî kesî hatinê kişandinê hub-hizkirina berbi wî tijî dilan nebe, qelemê nede destê xwe û derbarê wîda, wêda nenivîse. Nîgarên mêrxasên bîranînên, ku vê pirtûkêda hatine nivîsarê, hatine nîtirandinê di hindava xweda her yek kesayete. Yekî bi kirin, çalekîyên xweva bi şûrkêşîya xweva gel derxistîye ser rîya azadarîyê, yekî nivîsîye,

efrandîye, hêlan daye ewledên gelê xwe, wekî rabin dewa mafên xwe bikin, yekî çanda gelê xwe dewlemend kirîye, rorobarîya kirinên wana didine kivşê ku, herek bi awakî bûye pêşewîtiye gelê xwe.

Bona vê nêta xwe makkin emê minakekê bînine holê û bila xwendevan bi xwe hafîyê derxe.

15 meha neha, sala 1947-a, ji bajarê Bakûyê, nemir Mustafa Barzanî serkarê Rêspûblîka Azerbaycanê Mîr Cefer Baxirovra nameke weke yanzdeh rûpêlan bi kurt derbarê dîroka Kurdan, rewşa wanda û derbarê wê yekêda çawa bi serkarîya wî 500 pêşmerge derbazî Azerbaycanê bûne, dinivîse. Ew nama bi dîrokî, ya pirr balkêş, hewaskar bi sererêzên jêrîn tê dawîyê:

"Ez bawer in hûnê min bipejirinîn û ezê bikaribim derbarê rewşa meda bi firetî wera qalkim.

*Bi rêzdarî, ewled û xulamê kurdan,
Mustafa Barzanî."*

Ahmedê Hepo,
Endamê Yekîtiya Nivîskarên
Azerbaycanê.

Bîranîn û xewin

Jîyana mirovan tu dema bê bîranîn û xewin derbaz nabe. Bîranîn û xewin him nêzîkî hevin, him dûrî hevin. Min pêşnivîsara pirtûka xweye bi navê “Rêwîyê bê mal”-da nivîsîye, wekî meydana gilîyê bîranînê gellekî fireye, him jî şîrîta wê dirêje. Wetaya wê kûre. Ya yekê, qewmandinê qewimî ta-derzîyêra dikî, ya duda, ewa ji xwîn-qinêtê, ji bîn-bawerîyê, ji hiş-sewdayê mirovan tê. Lema dibên bîranîna welat, bîranîna axa helal, bîranîna dayîkê, bîranîna zimîn, ya kesayetê dîrokê, ya malbetê, ya hub-hizkirinê û yên mayîn.

Lê xewin.... Derbarê xewinan da pirr-pirr nivîsîne... Ez her tenê wê dizanim, ew him rastin, him derewin. Xewin nava rastîyê û derewîyê da sekinîye. Ew carna derbazî alîyê rastîyê, carna jî derbazî alîyê derewîyê dibe; pîkî wê li vire, yekî wire. Lema jî gel gotîye:

- Xewin hene qasidin-diqewimin,
- Xewin jî hene – derewin.

Ezê vê nivîsarnasîyêda ji dehan bîranînekê, ji sedan xewineke xwe, ya ku hevra girêdayîne, xwendevanên birêzra qal kim.

Lêbelê, xewina min bi salan kişand, wekî bibe heqî. Bîranîna min jî, ji nava gewlezên salan derketîye.

Wekî jîyanêda yekî mayîn nebe piştovanê te, nebe sedemê pêşta gav avîtina te, tu nikarî serfirazbî.



Sala 1959-a.

Min dersxana deha xitim kiribû û bona înstîtûtêda bême pejirandinê, çume bajarê Rewanê (Êrêvanê).

Wê salê Partîya Komûnîstîyê ya Yekîtiya Sovêtê birîyar pejirand, wekî pey dersxana dehara, pewîste her kesê ku dersxana deha xilazkirîye, here nava deranînêda – kolxoz, sovxoz, fabrik, zavodan û cîyên mayînda karê bike, paşê here xwendina bilind destbîne.

Malbeta me pey nefîkirina deh salara hatibû li Azerbaycanê hêwirî bû. Min ne dixwest vegerime malê, ji ber ku, minê her tenê şivantî, yanê gavantî bikira.

Ez nivîskar, helbestvan Elîyê Evdilrehmanra bibûme nas. Ewî şewir da min, ez herime bal Nado Maxmûdov, bona ku, ew alîkarîyê bide min, bajêrda bimînim, têkevime ser xebatekê. Kurt-

dirêj, ez çûme bal Nadoyê Xudo. Ew bû piştovanê min, min zavoda ku, parên maşîna çêdîkir, çawa pale dest bi xebatê kir.

Nado Maxmûdoov

Sala 1966-a

Min înistîtût xilazkiribû, rêdaksîya rojnameya “Rya teze”-da dixebitîm. Avayê min tune bû, bi kirê malekêda dimam. Her sal hukumetê avayîkî du-sê çavî dida karkarên rêdaksîyê. Wê salê avayîkî duçavî dane karkarekî rêdaksîyayê, yê ku, ew salên dirêj bûn kar dikir. Ewî ew avayî nûh nexwest, ji ber ku, ew dûrî navenda bajêr bû. Ewê jî bêjin, nava bajêrda avayîkî wî rind hebû, her tenê hinekî kewin bû. Wê demê min dewa wî avayî kir. Lê bi qeyde-qanûnên heyî destûr tune bû, nava saleke kar – xebata min, avayî bidine min. Pêwîst bû, qe na, pênc sala bixebitîm... Ez dîsa çûme bal Nado Maxmûdov. Bona qedir-rûmeta wî, hemû qanûn hatine teribandinê, avayî dane mîn, ez bûme xwedan mal.

Kî bû Nadoyê Xudo Maxmûdov ? Nado sala 1907-a li gundê Garlûkê, nehîya Bayazîdê hatibû dunê. Pey xilazkirina mekteba dehera di ûnîvêrsîteta komûnîstê ya Pişkavkazêda tê pejrandinê û sala 1933-a wêya bi serfînîyazî xitim dike. Paşê dîsa xwendina xwe didomîne, para dîrokzanîyê ya ûnîvêrsîteta Yêrêvanêye dewletê kuta dike.

Ji sala 1933-a hetanî sala 1958-a ew karên bilind da dixebite. Lê ji sala 1958-a hetanî dawîya jîyana xwe (sala 1989) ew çawa dewsgirtîyê yekem, yê wezîrê negilîyat-transporta rêspûblîka Ermenîstana sovêtê, karê dike.

Ermenîstanêda ew mirovekî bi navdar bû. Çawa gel dibêje, qe katibê yekem, yê Partîya komûnîstîyê gilîki wî, ne dikire dudu. Di nava bera netewperestîyêda, ew hey dibû piştovanê ewledên gelê xwe.

Nadoyê Xudo him jî nivîskarekî hêja bû. Xenîc bedewnivîsarê, ew dîrokzanekî kûr bû. Ewî derbarê dîroka kurdan da pirtûka bi navê "Kurd" nivîsiye. Gelleka mixenetîya wî, çavnebarîya wî dikirin. Xwezila rojekê, ew pirtûka wî, ji ermenîkî bi kurdî ronahîyê bivîne.

Sala 1967-a

Wê salê, 60 salîya dayîkbûna Maxmûdov Nado Xudoyêvîç (ew awa dihate naskirinê) li Ermenîstanê bi fermî, bi heyte-hol hate derbazkirinê. Ji alîyê hokum-etêda bi xeletên bilindva hate rewakirinê.

Çawa bi fermî, usa jî bi taybetî, sersalîya 60 salîya wî kirane camêrî hate bîranînê. Em bûne şehedê wê yekê, wekî ewî mala xwe da, rojekê ermenî û rûsên heval-hogirên xwe beşter kir, rojekê jî tenê ewledên gelê xwe-kurd beşter kir û mêvandarî da. Vira kurdên karkarên cuda-cuda, awa Mêrxasê Yekîtiya Sovêtê, yê şerê wetenîyêyi mezin – Semend Sîyabendov, doktor-profêsor Hecîyê Cindî, helbestvan Casimê Celîl, nivîskar,

helbestvan Elîyê Evdilrehman, dîrokzan Şekroyê Mihoyî, dîrokzan Xalit Çatoyêv û gellekên mayîn beşter bibûn. Ez jî dewatî wê salvegerê, wê şayê bibûm.

Dawîya şayê da Elîyê Evdilrehman û ez man. Di pirseke biçûkda, gotî em kêrî Nadoyê Xudo bahatana. Ji oda mezin, ewî em derbazî yeke mayîn kir. Cî nîşanî me kir, xwe jî ser dîwanê rûnişt. Ew westîya bû, hinekî çavên xwe da ser hev. Êmek derbaz bû. Vê weşê radîoyê ji Moskvayê nûçe didan. Di nava nûçada navê Mustafa Barzanî hate kişandinê û hate serzara, wekî li Bexdayê ûnîversîtê da, dîsa beşa zimanê kurdî hatiye vekirinê, ewledên kurdan wê têda bixûnin.

Vê lezê Nadoyê Xudo mîna xortekî çardeh salî, banzda ser xwe, destên xwe hevxist, bi dengekî şa got:

- Heylo, ew çito mêre ! Elî, tu zanî ez kêra dibêjim Ez Mustafa Barzanîra dibêjim.

Paşê berê xwe da min û dîsa kêlimî:

- Ahmed lawo, Elî hinekî haj pirsar heye, lê tu rind bibihîze, binêhêre apê te, tera çi dibêje ? Payîza sala 1958-a Mustafa Barzanî ji Moskvayê hatê Ermenîsta-nê. Ev seredana ji alîyê hukumetê da ser pêgaveke bilind hatibû dirûvandin. Berî hatina wî, ji Moskvayê teme dane min û Mêrxasê şerê wetenîyêyî Mezin Semend Sîyabendov, wekî em wî çawa bipejirînin, çawa bibine gundên kurdan û pirsên mayîn. Ez hûr gilî qal nakim, her ewê bêjim, sibetira, ku ewê biçûya Moskvayê, min ew anî mal, a ser vê dîwanê rûnişt. Wedê

bernama radîoya Yêrêvanê bû, ya bi kurdî. Min dît ew çawa kêf-xweş bû. Kilam didan. Barzanî çavên xwe girtibûn û ketibû nava awaza strana. Bername hatinê dawîyê, ew nişkêva ser dîwanê rabû, destên xwe hewada ba kir û got:

- Birao, te çima deng birand ?

- Keko, - min bersiva wî da, - wedê bernamê pânzdeh deqîqeye.

Ewî destên xwe da piş xwe û nava odêda, du-sê gava virda, wêda çû, hat, got:

- Tişt nabe, çend rojan şûnda, tuyê hunerê mêra bibîn !

Bi rastî ez ewqasî nuqî nava van gilîyan ne bûm. Hê hevtekê nekişand, ji Moskvayê minra têlêxistin, wekî bi hîvîkirina Mustafa Barzanî, wedê bernama zimanê kurdî wê bibe sehetekê.

Nadoyê Xudo hinekî xwe ker kir, paşê ser gotinên xwe da zêde kir:

- Beqî mêrxas Barzanî îro wedê bernamê seheteke û 15-20 mirov radîoyêda karê dikin, mehtîyê distînin, hinek jî, ji derva dinivîsîn, ew jî gonararê distînin. Lê di alîyê heja azadariyê da, hişîyarbûna gel da, radîo bona me şoreşe.

Pey van nêtê xwera Nadoyê Xudo vegerî cîyê xweda rûnişt û ji sêrî, hetanî pîya, bejin – bala Barzanî-yê nemir usa nitirand, te qey digot, ewî firçe daye destê xwe û mîna hunermendekî resm – wêneyê wî dikişîne, diefrîne. Êpêcekî derheqa culetbûna wîda axivî.

... Cîye ez serda zêdekim, belê, rêdaksîya “Rya teze”-da dixebitîm, me karkarên rêdaksîyê

radfîoyêra dinivîsî, dirav distand û weke dewrê genc derbaz dikir. Sed car rehma Xwedê li Barzanîyê Mezinbe ! Pêwîste ev kirina Barzanîyê nemir timê bi şêkirdarî bê bîranînê. Bila îro hinek qure nebin û her tiştî navê xwera girênedin. Gotî em kurd hînî xwe mukurhatinê, şêkirdarîyê bibin, kirinên her kesî, weke kirina kirî, bihêjînin.

...Xwendevanên hêja ! Eva bîranîna min. Lê xewina min ? Hetanî roja 60 salîya Nado Maxmûdov, min Kurdistan xewina xeweda didît û rojekê jî, min helbesta rastserê, ya bi navê «Rabe, delala min» nivîsî û sala 1966-a rojnama «Rya teze»- da, da weşandinê. Rast, 40 salî şûnda çûnê Kurdistanê Başûr, welleh, billeh, bi sonda here evra, here şewat, bi xwîna şehîdakim, min çawa Kurdistan bi bedewî nitirandibû, jîyanê da, Kurdistan hema usa bedewe, xwedanê hebûna bêhinbere!

Ji roja 60 salîya Nadoyê Xudo wêda min xewina xweda Barzanîyê mêrxas didît. Yekîtiya Sovêtêda derbarê wîda çi dihate nivîsarê, min dixwend û rojekê jî hatime ser wê biryarê, wekî derbarê nefîkirina kurdên ji Ermenistanê, pirtûkekê binivîsim, nîgara Mustafa Barzanî jî wirda cîyê xweyî layîq bigire. Ew pirtûk rêke dirêjra derbaz bû û bi navê «Birîn» hate weşandinê.

Şevêkê min xewina xweda dît, wekî ez nava du çîyada sekinîme, serê xwe billind kirinê, nihêrînê, min dît, keskesorê ji vî serê çîyê, xwe avîtiye serê cîyayê mayîn. Di keskesorêda wêneyê azadarê gelê kurd, yê Mustafa Barzanî hatiye darda kirinê. Bin wênedada jî hatiye nivîsarê :

Barzanîyê, nemir !
Bona me kurdan,
Ji te bilintir tenê Xwedêye !

Meha rêzberê, sala 2005-a Xwedayê mezin minra rê vekir, bi dewatnama Wêzîrîya candê, ya Herêma Kurdistanê Fêdêral, çûme Kurdistanê. 18 rêzberê çûme seredanîya tirba Barzanîyê nemir ! Tirba nemir li gundê Barzanêye. Ew gund nava du çiyada- çiyayê Şirinê û çiyayê Pirîsê da hatîye cîwarkirinê. Ew çîyan şev-roj nûra xwe davêjine ser tirba bilindê bilindara û parezgehîyê dîkin.

Ez bawerim demeke usa wê bê, sê şîrîtên pola bi rengê ala Kurdistanê, ser tirba Mustafa Bîrzanîyê her timî zindîra bê kişandin, alîk li çiyayê Şirinê, alîyê dinê li çiyayê Pirîsê bê bend kirinê û wênayê nemir pêda bê dardakirinê. Kî bê, here, wê serê xwe bilindke, wêne mêzeke, rêzên bîntarêda nivîsî bixûne:

Barzanîyê, nemir !
Bona me kurdan,
Ji te bilintir tenê Xwedêye !

Bîranîn û xewina min, ya derbarê Kurdistanê û derbarê pêşewîtî, rikndarê wê – Mustafa Barzanîda, ya bi kul-derd, jan-êş, bi telî-tengasî salan kişand, lê bû heqî, rastî; ji bin barê giran derketim, derdê bê derman hate melhem kirinê. Hevtê sal ser xwera derbazkirinê şûnda, min seredanî-zîyareta Kurdistanê, tirba her tim zindî – Mustafa Barzanî kir, vir wêda, roja ruhê min ji devê min derê, ezê bêjim:

- Ez hetabê gerdûnême !

Pey mirinêra, ruhê minê jî, li herdu bilindaya
biqeside:

- Kurdistanê û tirba Barzanîyê nemir.

Xwestineke xwe jî bînime serzara:

- Xwezila, roj ew roj bûya, dew-doza
Ermenîstanê – Azerbaycanê bi rîya aşitîyê safî
bibûya, ezê her tenê bona wê yekê biçûyama
Rewanê, wekî bibira qevze gul danîya ser tirba
Nado Maxmûdov, kevirê serkêlka wî maçkira û
bigota:

- Hêmîn razê ! Min xewinêda dît, ruhê te li
Kurdistanê digere, roja ku, tu û Barzanîyê nemir
rastî hev hatinê, çawa salveger, ruhê te tê
seredanîya tirba dost-birakê te.

ROJA NEBÎRKIRÎ

Havîna sala 1959-a bû. Min dersxana 10-a xilaz kiribû û bona înstûtêda bixwînîm ji Azerbaycibê hatibûme bajarê Rewanê.

Rojekê meha tebaxê min birîyar kir xwera bilûzekî bikirim.

Gotine min, ez herime dikana mezin "Ûnîvêrmag"ê. Ew jî gotine min ew dikan nêzîkî meydana ser navê Lênîne. Ez hatime meydane.

Li wir min dîsa ji yekî pirsî ew dikan kuye? Wî kesî pêşîyê bi destên xwe rê nîşanî min da, paşê got:

- Hema vê kuçêra raste-rast here, tuyê rastî dikana kitêbfirotanê bêyî, ew jî pêşberî wêye.

Min hey çavên xwe digerland rastî dikana kitêbfirotanê bêm. Çend deqîqa şûnda ez ber wê dikanê sekinîm. Li pêşenîya dikanê ermenîkî, rûsî û azerbaycanî nivîsibûn: "Kitêb". Evê yekê bala min kişand û ez ketime hundurê dikanê. Avayîkî pirr mezin bû.

Min çavên xwe li hundurê avayî gerand. Arîkda dardakirî ser kaxezan nivîsibûn: Kitêbên bi ermenîkî-rûsî, azerî-kurdî, bi tîrê nîşan dabûn, wekî berbi kîjan beşê çawa herî. Çawa dibên, avayî pareveyî du beşa kiribûn.

Alîyê rastê kitêbên ermenîkî-rûsî, alîyê çepê azerî-kurdî.

Min berbi çepê gav da. Ji kitêbên azerbaycanî derbaz bûm û pêşberî nivîsara "Edebîyata Kurdî" sekinîm.

Min ev herdu gilî bi dijarî xwend û çavên xwe ji kitêbên bi kurdî nedikişand. Hinekî awa, kerlal sekinîm û rengên kitêban mêze dikir. Vê demê bûkeke qemer wêda hat û bi ermenî karnîyarî min bû.

Min hê bi ermenîkî nizan bû. Me hevra rûsî axifî. Paşî eyan bû ewa azerbaycanîye. Pirs wêye yekem ev bû:

- Hûn kurdin?

- Belê, - min bersîva wê da.

Ewa dor xwe fitilî, dest avîte rêzên kitêbên bi kurdî û du heb raberî min kir û got:

- Ev kitêbana nûh hatine weşandinê.

Min diravê kitêban da, spasîya xwe gihande wê û ji dikanê derketim.

Ber dikanê çend dar hebûn. Min pîlê xwe kuta yekê û li kitêban mêze kir. Min kitêbek girte xwe û bergê wê xwend: "Berbang".

Min berge wê gatkir, li rûpêlê wêyî ewlîn wêne hebû. Zûrbibûm, wêne mêze dikir. Vê gavê yekî parava destê xwe da ser pîlê min.

Ez zivirîme ser milê xwe.

Ew mêrekî bejin nîvçe, dêmtijî û cindî bû. Ewî destê xwe ji ser pîlê min hilda û got:

- Ez jî dikanêda bûm. Min dît te kitêbên bi kurdî kirîn û vira sekinîyî awa bi hewaskar wan dinihêrî. Xorto, tu kurdê kêderêyî?

- Ez ji Azerbaycanê hatime.

Ew dêm xweş bû. Navê min pirsî. Navê min bihîstinê şûnda serda zêde kir.

- Ez Erebe Şemîlovim.

Min ji guhê xwe bawernekir û bi ecêb li wî nihêrî.

- Xorto, - ew bi şîrînayî berbirî min bû, - metelokeke me dibê: "Ya kurdan bi çavan bawere".

Wê gavê min wateya vê gotina bav-pîran fem ne kir. Salê derbaz bin, ezê wê metelokê derzkim: Kurd ji vir-viza, gotinên badilhewa bawernake, hetanî bi çavên xwe nebîne, bi guhê xwe nebihîze.

Ereb Şemîlov dûmayîn da axaftina xwe:

- Ew kitêb min nivîsîye.

Ez nava dûmanekêda xalîfîbûm, nizanbû çî bikim. Dîsa wênê kitêbêda heyî nihêrî, vegerî ew ji sêrî hetanî pîya mêzekir. Min hê bawer kir, ku rastî jî ev camêr Erebe Şemîlove, kitêb nivîsî ewe. Şabûna min li erd û esmîn hilnedihat.

- Ahmed, lawo, - ewî got, - mala min ser vê kuçêye, nêzîke, were em herine mal. Malê naske, him jî ezê ji te pirs-hewala bikim.

Deng ji min derneket.

Em tev kuçêra diçûn. Erebe Şemo pirs didan, min jî bersîv. Min wîra qal kir, ku sala 1937-a em ji gundê Şiranê, nehîya Qemerlîyê (Ermenîstan) nefîkirine. Em sala 1947-a jî nefîkirinê vegerîne, lê nehîştine em bêne çiyê xwe. Li nehîya Yêvlaxê (Azerbaycan) dersxana 10 xilazkirîye, hatime qebulî înstîtûtê bibim.

Ew li ber avayîkî pênceta sekinî.

- Ez vî avayîda, qatê dudada dijîm. De keremke em herine mal.

Ewî çiqasî kir, nekir ez neçûme mal.

- De wekî nayêyî mal, bihêle apê te, tera çend gilîya bêje. Cara ewlîn serpêhatî-jîyana te tîfalî bi ecêbe. Ez jî çend sala hatime girtinê. Girtin û nefîkirin hema mîna hevin. Rojekê emê rûnên ezê hûr-gilî her tiştî tera bêjim. Lê temîya min li te: îroda despêke bi kurdî bixwîne, binivîse. Vira bi kurdî rojmame dertê. Navê wê "Rya teze"-ye. Bi kurdî radîo heye.

Erebê Şemo navnîşana rêdaksîya "Rya teze", ya radîoyê gote min. Ew jî serda zêdekir, wekî xwedanê kitêba din, ya ku te stendîye, "Xatê Xanim" Elîyê Evdilrehman di rêdaksîya rojnama "Rya teze"-da karê dike. Here wîra jî bibe nas.

Lê kitêban bixwîne, paşê here.

Me xatir ji hev xast. Erebe Şemo çû mala xwe, lê ez kuçêda ker-lal êpêcekî sekinîm. Kê zanibû, demekê bê ezê zû-zû bême vî avayî, bêmherime mala nivîskarê navdar, korrêktorîyê li romana wî "Dim-dim"-ê bikim. Kê bawer dikir yê ku îro elîfba kurdî nas nake, rojê bê wê bibe cewt-şaşî rastîkirê sewtan, gilî-gotinan. Lê ne tenê ev...

Min dewsa bilûz herdu kitêbên stendî-"Berbang", "Xatê Xanim" bi dijarî, lê bi hesretî, bi hewaskarî, bi bînekê xwend. Paşê çûme rêdaksîya rojnama "Rya teze" nivîskar Elîyê Evdilrehmanra bûme nas. O! kulê tu mala mêra nekevî! Ew kirane bû, bejn-bal, namil pen, enî fire bû. Min elbêra te derxist ew xemxur, rênîşê mirovaye.

Ji wê rojêda çûme rêdaksîya rojnama "Rya teze" destê maqûl, rewşenbîr, helbestvan û nivîskaranra bûme nas. Hînî sura, rîya weşandina çapemenîyê bûm. Him jî kê zanibû, çend sala şunda ezê dîsa bême vê rêdaksîyayê, lê îcar çawa karkarê rojnamê.

Ez çûmê radîoyê, rêdaksîya bernama kûrdî, li wir jî destê karkarên kedkarra bûme nas. Hîn bûm çawa dertêne êfirê.

Ez çûme Akadêmîyayê, beşa kurdzanîyê, ulmdar-zanîyarara bûme nas.

Hînbûm ewana çawa ser zargotin, dîrok, wêje, zimanzanîyê û çandê lêkolîna dikin.

Ez çûme mala nivîskaran, sêktora (beşa) Kurdî. Min dît çawa ulmdar, helbestvan, nivîskar, rewşenbîrên kurd beşter dibin û destnivîsara kitêba newşandî enene dikin, çawa ser kitêba ronahî dîtî mitalên xwe dibêjin, çawa êvarîya, rasthatina derbaz dikin.

Wê salê kê zanibû, demekê bê, hema li vira, bi serkarîya ulmdar, helbestvan, nivîskar, mirovê xwedanê kana zanebûnê – Hecîyê Cindî destnivîsara kitêba mine yekem wê bê enenekirinê. Bi xêrxwezîya hemû beşterbûya, bi redaktorîya doktor, nivîskarê navdar Şehîdê Îbo "Adar"-a minê sala 1965-a bê weşandinê. Ji wê roja rasthatinêda bi tomerî ketime nava çembera kurdzanîyê.

Evê rasthatinê seranser rojên jiyana minra gavda, heta heme ewê gavde.

Tema nivîskarê mezin, wekî hînî elîfba kurdîbe, yanê ku, hînî zargotinê, wêje, dîrok û

çanda wêye dewlemendbe. Boy Welathizîyê, boy
Gelhezîyê binale, biçerçire, xwîdanê birêje hetanî
roja azayê. Wê şûnda bila ewledên we wêya mîna
ronahîya çavên xwe bîparêzin.

Ax, xuzula wê rasthatinê, wê roja nebîrkin!

KIRIN PÊŞÊ MÊRANE

Tunebûna Welêt boy mirova ew tenîya sêlêye, dişoyî, naşoyî ew reşe, sipî nabe. Tunebûna Welêt destên te girêdide, çawa çîrokanda dibên, te dike bîreke çil arşûnî. Tunebûna welêt te ber destê hinekan dike xulam, tu bêgav dimînî, hiş – sewdayên xwe boy hineke mayîn pêktînî. Lê ewledên bi qîret, şîrhelal, yên bi culet, yên bi zane ser hemû asteng, dijarîyanra derbaz dibin, bi kîrnê xweva sipîtayê dikine nava tenîya sêlê, dijî qetîlkarên zemîn û dewrê pêpelîkan dikine nava roja îro û sibê, wekî paşdemîyê mirov xwe wê rê bigire derê dunya şewq-şemal û bibe xwedanê dunya ronahî, xwedanê Welatê xwe!

Dîroka gelê kurd, ya ku eva şend sedsale bê welate, ewledên usa gîhandîye, wekî wana nehîştîye ruhê gel bimire, mirov mîna belgê binavê zerbe, bicilmise. Ew ewledên gel, yên pêşewitî, dilperitî hinek bi şûr rabûne azaya gelê xwe, hinek bi qelemê. Hecîyê Cindî ji wan ewledê kurd bû, wekî hate dunya ronahî, hema hinekî der-dor derzîkirinê, dît gelê wî di her alîyada kîrîna nava mengenê digivişin, him jî hinek dixwezin bidine peyitandinê, ku ne gelekî awa heyê, ne ew xwedanê çandêye, ne çirokeke wê, ne klameke wê heyê. Lema jî bi gorîya meye heq mirovên mîna Hecîyê Cindî nebûyana mênas, serkar, şerkarên rîya azayê, dîrokzan, wêje-zîmarzan, bi

gilîkî nebûyana xulamê gelê xwe, diqewimî îro me
tu kesî negota;

- Ez kurdim!

Kî bû Hecîyê Cindî? Wekî bikaribim qe na
hinekî bersîva vê pisê bidim, ezê xwe hetab
bişêvînim. Hema serê sêrîda bêjim ew neçûbû
hec, lê bi kara xweye salaye dijwarva bû hecîyê
wêje, bû folklorzan, zimanzan, ferhengzan,
elîfbazan, ulmdar, kurdzan, danezanê kurdnasîyê,
lêkolînvân, hebestvan, nivîskar, wergerê pîspor,
dersdarê zaneyî hemdfîre, bû rewşenbirekî
xwedanê çanda bilind; bû serkar, rênîşandar û
rûspî.

Berî her tiştî çend gilî derheqa serkarî,
rênîşandarî û rûspîtiya wîda. Ewî bi dûrdîtina
xweva ewledên gelê xwe, yên zane, destemel, jîr
dora xwa beşter dîkir, şêwir û rê nîşanî wan dida,
pêwîst bûnê dikete pêşîya her yekî derê girtî ser
wanda dida vekirinê. Çend salan şûnda didît,
şadibû, firnax dibû, wekî ji wan kesan yek bûye
helbestvan, nivîskar, bijîk-înjênêr, ulmdar,
sazbend-awazsaz, peykelkar û xwedanê pêşeyê
mayîn.

Lê çarenûsa vî camêrê, ku jîyanêda mîna
pola bû, bi çi awayî hat, bi çi rewşî çû?

Biçûktîyêda sêwîtî bû para wî, hinekî çavên
xwe vekir, bi helalî, bi dilê paqîş ked kirinê,
buxdantî pêsîra wîda anîn, şer avîtinê, giringeh bû
qismetê wî.

Hecîyê Cindî sala 1908 li gundê
Emençayîrê, qeza Qersê hatîye dunya ronahî. Ew
hê biçûktîya xwe da him ji alîyê dêda, him ji alîyê

bavêda sêwî dimîne. Derdê sêwîtîyê derdekî bê dermane. Hinekê dişewitî wî dibin sêwîxana Qersêda cî-war dikin. Çend salan şûnda ewî cîguhastî sêwîxana Gumrîyê dikin. Hecî sêwîxanêda dixwîne û sala 1929, çawa dibên dibe mirovekî gihîştî û dest bi dersdarîyê dike. Lê Hecîyê Cindî bi vê destanînêra qayîl nabe û dîsa gaveke bi şidîyayî berbi xwendinê davêje.

Sala 1930 ew dikeve para ziman û wêje ya zanîngeha Rewanê, ya dewletê û sala 1933 bi hêjayên bilindva wêya xitim dike. Hema wê salê ew dikeve aspirantûrayê.

Dema wî aspirantûra bi serfinîyazî xitim dikir, dema ku ew bi kel-bin ser rênîşên dersdarîyê, ser pirtûkên dersan, ser ferrehgan kar dikir bobelata salên 1937, ya ku îro ketîye nava dîrokê, çawa salên Stalîne şeravîtinê, derê mala Hecîyê Cindîyê bêgune kuta, ew sala 1938 girtin. Navê "dujminê welêt", "dujminê gel" bi pêira wîye, ame-tamva, dizeliqînin. Evreqên wîye wa gotî, "xayîntîyêda" ew hatibû nivsarê, wekî Mîr Celadet Bedirxan wîra kovara "Hewar"-ê, yek jî nameke bi nêtên neqenc" şandîye.

Rast salekê şûnda, 18-ê adarê, sala 1939-a dadgeh wî efû dike.

Pêwîste vira biranîneke biçûk bînine serzara. Ji sala 1959-a hetanî dawîya jîyana Hecîyê Cindî me hevra dostî kir. Bona makkirina wê nêtê ewê jî bêjin, ku sala 1985-a Hecîyê Cindî pirtûkeke nêzîkî 800 rûpêlî ya bi navê "Meselok û xeberokêd cmaeta kurda" daye weşandinê. Di pêşgotina wê, rûpêlê 27-da bi şêkirdanî navê me jî

kişandîye. Vê yekêra tevayî îro bona min ew yek daha bi ziyaretîye, wekî kekê Hecî (min wîra keko digot) bi destên xwe ser wê pirtûkê awa nivisiye: "Bi hizkirin û bi xwestinêd here qenc Anmedê Hepora. 3-ê adarê, sala 1985-a".

Ewî her sal roja 18 adarê, roja ji girtingehê derketinê, dida derbazkirinê çawa roja ji dayîk bûyîna xwe. Hecîyê Cindîyê navdar timê derheqa wê sala zulim-zêrandinêda bi şewat, bi kîn-buxs qal dikir. Digot, ku ez bona wê yekê ber xwe dikevim, wekî qe gunê min tune bû, ez ku xirabî, xayîntî ku?

Ger em hinekî paşta vegerin û ji sala Hecîyê Cindîyê karkirinê hetanî sala girtina wî bînin rorobar kin, emê bibine şehedê kedrêjeke zelal.

Ji sala 1934 hetanî sala 1938-a ew weke 35 kitêban û kitêbokan dinivîse û dide weşandinê. Ewana çi bûn?

Navê çend heba bînine ser zara: "Mêtofîka zimanê kurmancî" (1932), "Ziman-nema kurmancî" (s.1935) "Xebernema têrmînologîye" (sala 1936), "Programa zimanê kurmancî" (s. 1936) û yên mayînra tevayî "Folklorê kurmanca" tevî Emînê Evdal, (s. 1936).

Derheqa vê pirtûkêda, ya ku ji 500 rûpêlî zêdeye, ya ku 33 guhêrbarî- variantê beyt-serhatîya "Ker û Kulik" ronahî dîtîye tenê nêtekê bêjin.

Gava ew pirtûka sertaca zargotina gelê kurd dikeve destê serokê komela Mahabadê Mehmed Qazî, dinihêre, dixûne û dibêje: "Ev kitêb weke Qurana meye".

Hecîyê Cindî, yê ku bi ruhê xweva îdî zargotina gelê xwera hatibû girêdanê hema pey giringehêra di nava salekêda, sala, 1940-î dîsêrtasîya bi navê "Ker û Kulikê Silêmanê Silivî" xweyî dike û navê kandidatê ulmê filologîyê distîne.

Ev karhizê zargotina gelê kurd ji sala 930-î hetanî dawîya jîyana xwe, ji 60 salî zêdetir, bi beravkirin, bernivîsar, lêkolîn û weşewanîya folklorêva mijûl dibe. Berra jî helbestan, serpêhatî, romana dinivîse û karên mayîne hêle dike.

Hema em du minaka bînine holê û bibînin Hecîyê Cindî çito amadekar, karhiz, ewlekarê mexlûqetîyê bû. Ya yekê. Ewî ji sala 1932, hetanî sala 1967-a serkarî para nivîskarên kurdan ya Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê kir. Ya din. Di sala 1959-a li sêktora Rohilatzanîyê, ya Akadêmîya Ermenîstanê, beşa kurdzanîyê vedibe. Hecîyê Cindî hetanî sala 1968-a dibe serokê wê û desta ulmdarên kurdan dora xwe dicivîne, kurdzanîyê di nava ulmên dunêda dide naskirinê.

Me jorê rêbarî got, ku Hecîyê Cindî 60 salî zêdetir jîyana xwe rewayî zargotina gelê kurd kirîye. Ewî pirtûkên dersanda, di berevokên cuda-cudada mesele-metelokek hey wekilandîye: "Kurdistan-Gulistan".

Bi gorîya me ev nêta, ya ku boy wê, bi sedsalîyanva şerkarîya azadarîyê hatîye kirinê, hê cîwantîyêda di nava ruhê Hecîyê Cindîda cîyê xweyî sereke girtîye, lema jî "Kîlamê cimaeta Kurmanca" (s. 1936), "Folkora Kurmanca" tevî E.Evdal (s. 1936), "Ker û Kulikê Silêmanê Silivî

êposa cimaeta kurda" (s. 1941), "Folklor a kurdî" (s. 1945), "Şaxêd êposa, Koroxlî" (sala 1953), "Folklor a Kurmancîyê" (s. 1957), "Hikîyatên cimaeta kurda" pênc cîld, sala 1961, 1962, 1969, 1980, 1988-a, "Beyt-serhatîyên kurdaye êpîkîyê", bi zimanê rûsî, kurdî, Moskva (s. 1962) û gelekên mayîn bi kedeke giran, weke kareke înstîtûtekê da weşandinê û bi wê yekêva bi sedan kilam, çîrok, beyt-serhatî, bi hezaran mesele-metelok, têderxistinok û minakên folklorêye din ji undabûnê da xilaskirinê, bi hezar salan gel ewana bi xwera dabûne jiyanê, ewî careke mayîn bi mora weşevanîyêva vegerande wana, ku çiqasî gel bijî, ew xezine kêrî wan bê.

Armaca doktor-profêssor Hecîyê Cindîye sereke yek jî ew bûye, wekî payê pirr pirtûkên folklorêye ronahî dîtî ewî bi pêşgotin, nivîsarnasîyêva daye weşandinê. Di pêşgotin-lêkolînêda dewlemendîya folklorê, erf-edet, wetenhizî, dunêdîtin û fîlosofîya gelê kurd bi ulmî daye pete kirinê. Awa "Beyt-serhatîyên kurdaye êpîkîyê" yên bi zimanê rûsî, ku sala 1962-a Moskvayêda ronahî dibine, pêşgotina bi ulmîda, dinivîse:

"Beyt-serhatîyên kurdanda weteya şerkarîya gel, ya dijî zefîtkarên dereke cîyê herî berbi çav digire. Wanada nêta hişîyarbûna serxwebûnê, nêta yekîtiya hemû hêzên gel zelal tê kivşê. Di beyt-serhatîyada mîrxasên gel pêşta nayên boy wê qebîlê, vê qebîlê. Ewana boy namûs û azaya hemû gelê kurd şerkarîyê dîkin û tene kuştunê".

Gava mirov karkirina Hecîyê Cindî dihesê, dibîne, ku ew boy gulvedana wêje, çand, dîrok, dunênasîya gelê xwe bûye sergovendê gellek pêşekan.

Di salên 30-da, di sedsalîya derbazbûyîda Hecîyê Cindî di para radîoya bernama kurdî, li Rewanê, dîktorîyê dike. Ji sala 1930-î, hetanî sala 1957 rojnama "Rya teze-"da dibe bersivdarekî wê û hetanî dawîya jiyana xwe bona serketina rojnamê tu dema ew xwe paştta nade, wêra tevayî behrê qelema wî zû-zû, rûpêlê rojnamê dixemilîne.

Belê! Sed car belê! Bona ked-karê wîyî mezin û hêja sala 1964-a navê doktorê ulmê filologîyê didine wî, hinekî şûnda ser vî navîda profêssorî ji zêde dibe û ew dibe doktor-profêssor. Navê Hecîyê Cindî tenê nava goveka Yektîya Sovêta berêda namîne. Sala 1972-a Hecîyê Cindî tê bijartinê çawa endamê gotarvan yê Akadêmîya Kurda, li Îraqê, lê sala 1983 hîmdarekî înistîtûta kurdî, ya li Parîsê.

Dawîyêda ewê yekê bînine serzara, wekî mirov ji karxebat, efrandin-kitêbên Hecîyê Cindî pêşangehekê bide drûvandinê tu kesekê bawerneke, ku ev gişk beqî keda mirovekî hatîye xuliqandinê.

Kurdno, delalno! Wekî ev ronahîdarê gelê kurd îro bi mera bijîya meyê 90 salîya wî bi heytehol derbazkira, lê îro em 90 salîya wî him bi poside, him bi şabûn birtînin û dibêjin: "Kek Hecî, hûn nemirîne!"

Navê we di nava her kilamekê, dîlokekê, çîrokekê, beyt-serpêhatîkêda tê wekilandinê. Navê

weyê timê ser lêvê gelê kurdbel! Me çi derheqa weda got kurt got. Emir-jîyana we çîyayê bilinde, hewcî û hêjayî kitêbane!

Kirineke we jî bi şêkirdarî bîne holê. Sala 1978-a Knyazê Îbrahîm li Bakûyê dîsêrtasîya parast-xweyîkir. Bona wî karê pîroz hûn çawa apanêt bi jina xwe Zeynev xanime, ji Yerêvanê, Qanat Kurdoyêv ji Sankt-Pêtêrbûrgê hatine Bakûyê, bûne mêvanên meye here ezîz.

Ji wê hatinê, ji wê rasthatinê wêneyê me tevayî kişandî çawa bîranîna nebîrkirî maye.

Kek Hecî, gel gotîye, we jî nivîsîye û daye weşandinê: "Kirin pêşê mêrane". Hecîyê zagotina gelê kurd, ev gotina bi dewra xût bona camêrên mîna we hatîye efrandinê!

Şemdangerê gelê kurd – Hecîyê Cindî gulana sala 1990-î li Rewanê çû rehmetê! Rehma Xwede li wîbe!

s.1998-a

Nanê sêlê, zikê birçî

Ji rûyê ne yekîtîyê û bîn-bawerîya bêxemîyê dîroka gelê kurdra bûye avbez. Minak... Gellek ewledên vî gelî-mêrxas, hişkûr, rêvebir, dîrokzan, zanîyar, helbestvan, nivîskar, hunermend, nûhvedan û yên mayîn hatine dunê mêrxasî kirine, xuliqandine, efrandine, nitrandine, teqil dane pêştaçûyîna dîrokê, jîyanê, lê zû hatine bîrkirinê, yanê jî avbeza dîrokê ew kesana tevî sêlafekê mayîn kirîye û hineke din ji wan bar û pişt bûne. Sedem çi bûye? Ya here mezin-bê welatî! Paşê jî bê xemî!

Ji dehan, sedan minakekê bînine holê û bêjin, wekî çarenûsa dersdar, helbestvan û ulumdar-Emînê Evdal jî vê bê xemîyê alîyaye.

Bîranîneke nebîrkirî

. Sala 1960-î bû. Wan salan Yêrêvanêda rojnama "Rya teze", salê bi çend nava pirtûk dihatine weşandin, radîoyêda bi zimanê kurdî bername, di Akadêmîya Ulmada beşa kurdzanîyê, li rex Yekîtîya Nivîskarên Ermenîstanê sêksîya nivîskarên kurdan hebû. Îdî ez gellek nivîskar, helbestvan, ulumdar, gotarvan û rewşenbîrên kurdanra bibûme nas, usa jî ulumdar Hecîyê Cindî û Emînê Evdalra. Wana Akadêmîya Ulma da, ya Ermenîstanêda kar dikirin û herdu jî tev, odeke tengda rûdiniştin.

Bala wana hey ser min bû. Her ku, ez diçûme bal wan, wan camêra êpêce pirs didane min. Derbarê nefîkirina me, derbarê rewşa kurdên Azerbaycanê, derbarê zargotinê, erf-edetda... Çawa dibên, herekê pêşekê xwera girêdayî pirs-hewal ji min dikirin û çî ku hişên wan dibirî kere-ker dinivîsîn. Carekê jî ez hatim, rehmetsêbûyê Emînê Evdal odêda tenê bû.

Ew çendek bû, hatibû hişê min, wekî ez careke mayîn herime Akadêmîyayê, şermnekim ezê ji wan pirsxim, hûn çawa hatine derketine vira û karê we çîye?

Gava min dît Emînê Evdal tenêye, ez dilşidîyayî bûm.

Min ya dilê xwe wîra got. Ew ji pirsên min kêfxweş bû û awa dest bi axavtina xwe kir:

-Timê em berê te didine pirs-hewala, lê îro ezê derheqa xwe da kurt tera qal kim.

Vî mirovê bîn fire, xemxur ji pirtûka jîyana xwe çend rûpêl qal kir, rûpêlek qe ji bîra min naçe.

-Ez sêwî bûm, ewî axaftina xwe domand, -mala dewlemendekîda xulamî dikir.

Zivistanê êzing hûr dikir, pixêrî vêdixist; zivistanê tendûrêda, baharê, havîn, payîzê carîyan ser sêlan nan dipetin, min jî ew nanê germ şivan, gavan, pale, cotkar, çandinkararan dibir. Çavên min ji dû zer dibû, min hey pif dikir, wekî êzing hev bigirin, bişewitin, destên min ser sêla sor dişewitî, bîna nanê germ davîte pozê min, ji devê min ava reş diçû, hesreta kerî nanê tisî bûm, zikê min tîfalî ji birçîda dikire qure-qur.

Carekê min birçîda taw nekir, nanek kerî kir, hinek penêr kire nav û rêda xwer. Êvarê axê ez dame ber peyîna. Naha ez pey erf-edetê me diçim, ez dibêim, îdî bese, bila sêla me xwe nanê me bipêje.

Ulumdarê birêz serbuhurîya xweye reş-sipî hûrik-hûrik minra qal kir. Naha jî ezê bi bîn-bawerîya heq rêbarîkê têkime nava wê şirovekirina ulmdar.

Çend salan şûnda min nêta ulmdar xwe-xwera şirovekir. Belê, ulmdaro, we ji sêla sê kuçik destpêkir monik-monik pêşta hatina gelê xwe bi ulmî nivîsî, erf-edet, rabûn-rûniştandina wan ronkire ser kaxezan got, wekî em xwe dikarin nanê xwe ser sêla xwe usa bi tem-lem bipêjin, bila yên din bi heyr-hejmekar bimînin.

Sala 1906-a binelîyê gundê Emençayîrê, nehîya Dîgorê, qeza Qersê gişkan bihîst, wekî Evdalê Basora kurek bûye, navê wî danîne Emîn. Wê demê te ji dê-bavê zarokê, yanê ji hemû binelîyê gundra bigota, ku ev tîfalê bi hezar dijarî mezinbe, wê bibe dersdar, nivîskar, helbestvan û ulmdar, wê bi te bikenîyana, qerfê xwe bi te bîkarana.

Gava ew 13 salî bû ji destê rev-bezê, ji tunebûna bargiran dê-bavê wî dunya xwe duguharin. Hinekî şûnda sala 1920-a Evdalê xizan derê sêwîxanê dukute û li wir cî-war dibe.

Jîyanêda rîyên usa hene te berbi rîya sibêye qenc dibe. Rêke awa bona Emînê Evdal, sala 1923-a vedibe û ew ji sêwîxanê dertê, bere xwe dide bajarê Tblîsê, tê mala apê xwe.

Vira ew qebûlî rabfakê (Fakûltêta bona pala) dibe, dixûne. Emînê Evdal ew xwendîngeh xitimkirinê şûnda, diçe Ermenîstanê û li gundên kurdanda dest bi dersdarîyê dike.

Emînê ciwanî xwedanê kel-bîna pêşta çûyîne sala 1931 qebûlî unîversîtêta Yêrêvanêye Dewletê dibe û ewê sala 1936-a bi serfinîyazî, bi zanebûneke kûr kuta dike. Lê gotî neyê bîrkinê, wan sala Emînê Evdal Têxnîkûma Kurdaye Pişkavkazêye pêdagogiyêda dersê dide, rêdaksya rojnama "Rya teze" da jî çawa katibê berpirsîyar dixebite.

Ji salên 30-î hetanî dawîya jîyana xwe ew nivîsara bedewnivsarîyêva jî mijûl dibe, serpêhatîya û helbestan dinivîse. Serpêhatîya wîye ewlîn "Casim û Tosin" da kivşê, wekî torîvanê wê xwedanê ruhekî efrandarîyêyî hêleye û ew şedetîyê dide, ku ji behrê qelema wî efrandinên nebîrkiwî wê bêne hunurandinê.

Rastî jî Emînê Evdal şev-roja xwe dike yek dinivîse, diefrîne û dibe stûneke wêjeya Kurdên Yekîtiya Sovêta berê. Helbest û poyêmên efrandî û yên salên cuda-cuda da weşandî, yên mîna "Bhara min", "Gulizer", "Memê û Zînê", "Perîşan" nava wêjeya kurdên Sovêta berêda cîyê xwe digire.

Emînê Evdal derê xezineke mayîn jî vedike. Ew xezine zargotina gelê kurd, ya dewlemend, hên pirçiqil bû. Emînê Evdal mal-mal, gund-gund digere, ber kal-pîran, rîdansipî-porsipîyan çokvedide rûdinê çîrok, beyt-serhatî, kilam, dilok, mesele-metelok û wekokên zargotinêye mayîn

tomar, berav dike, dinivîse. Û sala 1936-a tevî ulumdar Hecîyê Cindî pirtûka weke hezâr rûpêlî, ya bi navê "Folklorê Kurmanca", didine weşandinê, bi wê yekêva efrandinên gel ji undabûnê didine xilazkirinê.

Emînê Evdal, yê xwedanê keda girane-hêja usa jî xwedanê çend pirtûkên dersane. Ew van pirtûkanva bi sedan zarên kurdan hînî xwendina zimanê dîya xwe dibin, paşê jîyanêda xwera rîyan ji rîyan dijberin.

Van hemû kirinara tevayî kana ulm ewî berbi xwe dikişîne.

Emînê Evdal qebûlî aspirantûrayê dibe, ewê bi serfinîyazî diqedîne û sala 1944-a dîsêrtasîyayê diparêze û dibe kandidatê ulmê filologîyê.

Ew bê westandin, bi kel-bîn ji sala 1944-a hetanî roja, ku dunya xwe diguhêze Akadêmîya Ulmîda karê dike û kêrî gelê xwe tê.

Zimanê kurdî bê şik zimanekî dewlemende, lê di alîyê zaravada, rastnîsandinêda dijarî, cewtî hebû û îro jî hê ew yek ji holê nehatîye rakirinê. Emînê Evdal evê yekê rind dibîne, derz dike û di vî alîda karekî ber bi çav dike, vê valatîyê tijî dike, berga kêmasîya digire. Sala 1958-a pirtûkeke bi nave "Xebarnama Kurdîye rastnîsandinê" dide weşandinê.

Ev efraniika hêja dibe ya ser pêşxwîna her kesên xwedan qelem.

Dibên, di karkirina her efrandar, xuluqdar, ulumdarekîda karpêkek dibe sertaca efrandariya wî.

Belê, wekî Emînê Evdal her tenê pirtûka xweye bi ulmî, ya bi navê "Heleqetîyêd pizmamtîyê nav kurdanda" binivîsîya, dîsa navê wîyê bi şêkirdarî bahata kişandinê. Ew pirtûk kulîlkeke kurdzanîyêye.

Lê bi dilêşî dixwezim bêjim, pey vefatbûna vî ulmdarî, nivîskarî, helbestvanî û dersdarîra kêmezêde derheqa emr-jîyan, efrandarîya wîda hatîye nivîsarê, lê gellek cara navê vê karxebata wîye hêjada tiştek nehatîye gotinê.

Berî her tiştî, ez çawa zimanhizek, yê ku hey pey paqîşîya zimîn revîye, dixwezim bêjim, di vê pirtûka navkişandîda gilî-peyvîn-gotin, têrmînên usa bi zanebûn, bi hostetî hatine pêkanînê, veçêkirinê, ku wana kirasê ulmî xwekirîye û di alîyê zimanzanîyêda bûne nexşekî nûh.

Wêra tevayî gotî wede jî, sal jî bêne ber çavan. Bona xatirê gilîyan, gilîyan nabêjin, emê bi çend wekokava nêta xwe makkin: Heleqetîyên pizmamtîyê, rikinê malhebûna ber, qebîla, tevrabûn, mîratxwerin, xwîn û qinêt û yên mayîn.

Derheqa êtnoqraf-erf-edetê gelê kurdan da gellekan nivîsîne, lê di vî alîda kêmasî pirr bûn. Ulumdarê kurd Emînê Evdal ji roja pêşta hatin, sazûna gelê kurd qal dike, monik-monik, bi hûr gilî ser jîyan û pêşta çûyîna wana disekine. Bi ulmî, bi petekirin dinivîse, wekî kurd gelekî dunyayêyî hêne û xwedanê bi sedan erf-edetê qence. Ji koçerî, nîvkoçerî, ji kurdên edilî, ji holikan girtî, heta avayê wane bedew, ji hasiletê, hetanî xurekên pirr cuda-cuda usa şirove dike, te tirê tu romaneke şirîn dixûnî. Awa ew dinivîse:

"Nav jîyîna kurdan da alîyê malhebûnê da, cîkî ferz digire sînorêd oba, cîyê çêre. Sînorêd oba bi dest wekîlêd hukumetê û serekê êlê dihate kivşkirin. Gellek cara sînor bi texmîna çava, bê çapkirin kivş dikir" ... Yanê jî, nîşanêd heywanara dibêjin: "paşguh", "pêşguh", "Hîv" ... "Nîşanêd usa çava me go, çava nexş li xalîça, kulava, têra dixistin".

Bê şik mirov dikare hêjayeke awa bide pirtûka "Heleqetîyêd pizmamtîyê nav kurdanda":

- Ew efranîk neynûkeke erf-edet, dîroka gelê kurde.

Dawîyêda bi dilêşî bêjim:

-Ew nêzîkî salekê bû Emînê Evdal pirtûka navkişandî nivîsîbû, xilaz kiribû û destnivîsara wê bi birîyara Akadêmîyayê dabû weşenîkê, bona weşandinê. Lê mirina malwêran ser ulumdarê gewre birî, ew xwera bire axa sar; hesret, keser dilê wîda hîşt, ne hîşt ew behrê kar-zehmetê xweyî giran, ya çend salan, bibîne.

Fîlosofê Çînê Lao Dzî dibê: "Kî ku pey mirinêra nayê bîrkinê, ew her tim zindîye".

Gel jî dibê: "Mamo ne li male, mala Mamo bi galegale."

Wedeyê bê ew pirtûkê çendî-çend cara bê veşandinê, him jî ewê di nava Kurdzanîyêda hêjaya xwe bistîne.

Dersdar, helbestvan, nivîskar, ulmdar, destşewîtîyê ser sêla gelê xwe-Emînê Evdal sala 1964-a diçe

ser dilowanîya xwe.

Rehma xwedê li wî be!

Malbeta bi rûmet

Malbet heye ku, tenê çira mala xwe vêdixe, malbet heye dibe rewşa gundekî, navberîkê; malbet heye dibe xemildara dîroka gelê xwe. Çawa minak malbetên usa di dîroka gelê kurd da ne yekin, ne dehin...

Awa, malbeta Qazîya, malbeta Barzanîya, malbeta Bedirxanîya, Mîrsêvdîna...

Ew yek wê demê diqewime, gava pêşîkaşê wê malbetê jîyanêda bi hezaran dijiwarîyan dibîne, lê ji daxwezên xweye heq dest venakişîne, him ewledên xwe, him gelên xwe nava kûraya dewra xwera derbaz dike. Ew yek wê demê çareser dibe, gava ewledên wê malê, wê malbetê herek navekî bilind, bi qîret, bi nav-namûs qezenc dike. Ewana rîya jîyana xwe çawa xelat pêşkêşî qencîyê, pakîyê, rindayê, bedewîyê, rîya azadarîyê dîkin û rojên gel, yên bi tengasî, bi kirinê xweye hêlava pêpes dîkin û dibine piştovanê her kesî.

Ev peyvîn-gotinên ku, jorê hatine jimarê ne bona gulxemilandina xwezayêye, lê bona mirov û mirovatîyêye. Ji hemû bilindcîyan bilintir ew mirove. Wekî tu jîyanêda her tenê, qe nebe carekê, bikaribî dest bavêjî mirovekî litimî, erdê ketî, ji erdê rakî, bibî alîkarê wî, rind bizanbe hê tu însanî! Lê wekî tu hemû temenên xweye femdarîyê rewayî serfînîyazîya mirovan dikî, wê demê navê te dikeve nava dilê mirovên der-dorên te, paşê tixûbê wê yekê ewqasî fire dibe û tu xwe

jî tê dernaxî, dilê mirovanda peykelê te hatîye danînê.

Emê vê nivîsarnasî-bîranîna xwe da ji wê malbetê biaxivin ya ku, pêşîyê bû rewş, piştovanê gundekî, paşê ya navberîkê û wê wêda nav-dengê wê bû ya tixûb fire. Ew malbet ya Evdilrehmanê Momin bû. Evdilrehmanê Momin û jina wî Amîna Nebî begê jîyanêda bûne xwedanê çar kuran û keçikekê.

Cîyê wekî navbendekê bînime holê-jîyanêda minra usa li hev hat min di kaltî û pîrtîya wanda ew dîtî. Evdilrehmanê Momin yekî nûranî, ji bejinê kin, jêhatî, Amîna Nebî begê yeke zerîn, bejin bilind, zarşirîn, rûken, bi tivdîr bû.

Lê wana jîyanêda çi dîtî û ew çawa derbaz kirin? Çarenûsa wan pênc ewlada çawa hate hûnandin? Keremkin em bêjin, hûn jî bi xemxurî têkevîne nava jîyana wana, xwera hafîyê derxin.

Salên cîwantîyêda koçberbûna ji welat, rev-beza ji Romê, qeydê Yekîtiya Sovêtê, nefîkirin, şerê cahanêyî duyemin ûÛ rojên yek ji yekê xirabtir. Lê wana ewledên usa firêxistin, usa bi tore mezinkirin, usa dane ber xwendinê, wekî her çar kuran xwendina bilind destanîn. Her tenê keçika wane bedewa ser bedewara nexwend, xwezgînan zû derê bavê birîn, ewa çû mêr û bû xwedanê kozî-kulfet.

Jîyan mîna pilekanêye. Mirov bona karekî, meremekî bi pêpelîngan hildikişe jorê, paşê jî dadikeve jêrê. Em jî dixwezin ser bingeha vê rizmê, pê, pêger pey vê malbetê herin.

Sala 1918-a li gundê Bûyrekê, qeza Wanê dewatek, şayîk jî hate derbaz kirin. Ew dewata ya du cîwanê wî gundî, ya Evdilrehmanê Momin û ya Amîna Nebî begê bû. Qenc, yanê xirab roj, meh, sal ser wanra dihatin derbaz dibûn. Hema li vî gundî sala 1920-a, van cîwanara zareke kurîn bû û dê-bavê navê tîfal danîn Elî.

Mirovên usa hene pêwîste jînenîgar-serborîya wan neyê bîrkinê, ji ber ku, gotî kirinên kirî bi şêkirdarî bê hêjandinê, him jî ew dikare bona silsileta dahatî bibe minak.

Sal ji salê tengezar, bêzar, xirabtir dihat. Tengezarî, xizantî roj bi roj li hev zêde dibû. Xelayê, zelûlîyê, şerê hundur, neheqîyên dijî gelê kurd çawa bi hezaran malbetên kurdan, usa jî malbeta Evdilrehmanê Momin bêgav kir û sala 1926-a destê ewledê xwe girtin, cara dawîyê bereka çîyayê evra-Agirîyêra derbazbûn, hatine vî alîyê Erez, Şewîstanê.

Hemû malbetên ku jêra digotin êlarengîn, yên ku penaberî Yekîtiya Sovêtê bibûn, usa jî malbeta Evdilrehmanê Momin, nikaribûn li cîwarên nûh bîdilin. Alîkîda rewşa jîyanê, alîyê dinda xerîbîyê, kesera welat, ewana kiribûrîe nava tengasîyê. Çawa dibên, wana rojan cî nedidîtin rûnên, şeva xew ne dikirin. Axinîya mezina, ji destê birçîbûnê, nexweşîyên cuda-cuda, zaîn, nalîna zaran li der-doran hilnedihat.

Ew şeş sal bû qeydê Sovêtê li Azerbaycanê hatibû sazkirinê. Kurdên ku, bi sed salan jîyana xwe, li ser axa xwe, ber kuçikên xwe, ber qelexên xwe, li serê çîyayên xwe derbaz dikirin, naha

ketibûne nava sazman-rêjîma hişke-holan. De, qenc-xirab wan koçberan nava du rêspûblîk-komeleda- Azerbaycanê û Ermenîstanêda war digirtin.

Elîyê Evdilrehman 14-15 salîya xwe da mekteba menteqa Şawlîka (Rêspûblîka Sovêtêye Sosîalîstîyê Azerbaycanê-Nexçivan) li gundê Şewlîka xilaz dike.

Navbendek... Gava, sala 1937-a, ji Ermenîstanê hemû kurdên musulman-(xêncî çend malbeta) nefî kirin, usa jî, ji Nexçivanê kurd, qebîlên kurdaye here mezin-Şawlîka, Beşka hatine nefîkirinê.

Ew qebîlana jî anîn derxistine rêspûblîka Qazaxstanê. Hezar dijwarîyara tevayî ewledên wan li vira xwe xwendinê girtin. Ji wana desta dersdaran, xwedanê pêşekên cuda-cuda pêşta hatin. Ji nava qebîla Beşka akadêmîkê Kurdayî yekemîn, yê dunê eyan Nadîr Nadîrov derket. Ewî rûmeta gelê xwe bilind, bilind kir.

...Dîsa koçberî. Malbeta Evdilrehmanê Momin ji Naxçivanê bardike Ermenistanê. Daxwaz, kela xwendinê Elîyê Evdilrehman tîne derdixe têxnîkûma pêdagogîyêye bi kurdî, ya Yêrêvanêye Pişkavkazê. Elîyê Evdilrehman têxnîkûm xilazkirinê şûnda, di nava jîyana wîda bi her alî guhastinên geş dertêne holê. Ji wê rojêda nuxurîyê Evdilrehmanê Momin û Amîna Nebî begê-Elî vê malbetêra serfinîyazîyê tîne. Çawa gel dibêje, pêparê wî dibe pêparê xêrê.

Ew li gundên kurdan-Mûsakendê û Emo çawa dersdarê zimanê kurdî dersê dide û di gellek

pirsada jî dibe piştovanê binelîyên wan gundan. Salên dersdarîyê rêke mayîn jî ber Elîyê Evdilrehman vedike. Dema hê têxnîkûmêda dixwend dilê wîda bilqînîya helbesta têne bihîstinê. Lema jî xortê êgîn, dersdarê zimanê kurdî rojekê derê rêdaksîya rojnema

“Rya teze”, (Ew rojname ji sala 1930-î bi kurdî Ermenistanê da dihate weşandin) dukute û helbestên xwe radest dike. Helbestên ewlîn ku, têne weşandinê, îdî ew dibine rênîşa efrandarîya wîye paşdemîyê. Dilê xortê êgîn bi hêzeke mayînvî jî tijî dibe. Hub-hizkirina Pakîzera Hecî Sadiq dilê wî diso û rojekê destê wan digihîje hev.

Dem, wede hukumdarên mezinin. Carna ewana qewmandin, bûyerên usa tînin ustuyê dîrokê dialînin, wekî mirovayî zendegirtî dibe û dikeve nava sêlafa wê.

Gava bîna kurdên penaber hinekî hatibûne ber wan, ewana ketibûne kolxozan (malhebûna hevteyayî), sovxozan (malhebûna dewletê) kar dikirin, ewledên hinekan qulixêda bûn, hinekan dixwend dest bi şerê hemdunyayêyî duyemîn bû.

Ewlêdên gelê kurd jî, ji vê bobeletê paşda namînin. Çawa dibên Elîyê Evdilrehman jî bê gav dimîne, kincên malê derdixe, qelemê datîne, dest davêje qundaxa tîfingê. Ya sereke xortê nûh zewicî bêxwestina xwe, bûka serî bi xêlî dihêle diçe şêr.

Elîyê Evdilrehman weke çar salan nava agir-alava şera derbaz dibe, partîzantîyê dike. Dîrokzan Xalît Çatoyêv di pirtûka xweye bi navê “Tevbûna kurdên Yekîtiya Sovêtê di şerê Wetenî

Mezin"-da dinivîse, wekî bona şerkarîya wîye bi mêranî, ya ku Elîyê Evdilrehman dijî faşîstên alman dikir, ew bi mêdala "Partîzanê şerê Weten"-va tê rewa kirinê.

Pey şêra Elîyê Evdilrehman birîyar dike xwendina xwe bidomîne, xwendina bilind destbîne. Bi wî meremî ew dikeve înstîtûta Yêrêvanêye dewletêye pêdagojîyê, beşa dunêzanebûnê bi azerbaycanî û wê sala 1949-a xilaz dike.

Ew dîsa pêşekê xweyî hizkirî didomîne. Zûtîrekê wî kivş dikin çawa dîrêktorê mektebê. Sal bi sal, gav bi gav pêşta diçe. Sala 1953-a ewî pêşta dikişînin-wezîrtîya xwendinê ya Ermenîstanêda karê dike. Lê ji sala 1955-a hetanî dawîya sala 1988 ew rêdaksîya rojnameya "Rya teze"-da dixebite. Ew dibe serwêrê beşa bersivdar-ya partîyayê.

Rêdaksîya rojnameyêda dest bi kar kirinê, devê kanîya efrandarîya wî jî bilqînî dikebê vedibe. Gotar, oçêrk û usa jî serpêhatîyên wî, helbestên wîye hewaskar di "Rya teze"-da ronahîyê dibînin, him jî radîoya Yêrêvanêye beşa kurdîda têne dayînê.

Elîyê Evdilrehman roj bi roj, bi kel-hêza mezinva alîkîda diefrîne, dinîtrîne, alîyê dinêda ji zimanê azerbaycanî wergera dike.

Sala 1957-a cara yekemîn kerîk ji serpêhatîya wîye bi navê "Morf" di berevoka "Nivîskarên Kurdên Sovêtê"-da tê weşandin. Bi wêva jî navê wî dikebe nava nivîskar, helbestvanên kurdan, çawa yên mîna Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Wezîrê Nadîrî, Nadoyê Xudo,

Eminê Evdal, Casimê Celîl, Qaçaxê Mûrad, Sehîdê Îbo û yên mayîn.

Dawîya sala 1959-a pirtûka wîye ewlîn, ya bi navê “Xatê Xanim” tê weşandin.

Sala 1960-a bû. Ew çend meh bû pirtûka Elîyê Evdilrehman ya bi navê “Xatê Xanim” ronahî dîti bû. Min ew pirtûk ji dikana pirtûkfrotanê stendibû. Wê salê mala Elîyê Evdilrehman devê çemê, “Gêder Çayê” ser rîya înstîtûta pêdagojîyê bû.

Berêvarê ez ji înstîtûtê derketinê, dagerîyame mala nivîskar. Meremê min ew bû, wekî pirtûkê bivim bidime Elîyê Evdilrehman, wekî ew bi xwe ser wê binivîse, bide min.

Çawa dibên, rojeke baharêye xweşda min derê mala nivîskar kuta .

Nivîskar bi xwe derî ser mindavekir û ez dewatî hundur kirim.

Oda wîye mezin tijî mirov bûn. Qewm-pismam, dost-hogirên wî û dayîka wî fêza gişkan rûniştibû. Cî nîşanî min dan, ez jî rûniştim.

Rêdaktor-rastsere li pirtûke kirî, helbestvan Qaçaxê Mûrad bada hilda, rabû, êpêcekî axivî, dawîyê da got:

-Belê, pirtûka “Xatê Xanim”-ê kete nava wêjeya kurdan, ez bawerim ewê navekî bilindî hêja Elîyê delalra bîne. Yek jî, wekî ji vir wêda Elî ser xwe bixebite, qelema xwe daneyne erdê, ewê berhemê pir hêja bide wêjeya me.

Paşê berê xwe da Amîne xanimê got:

-Dayîkê, tu him dîya Elîyî, him dayîka minî. Ez gellekî mala weda mame, min nanê destê te

xwerîye. Şîrê te. li Elî helal be, wekî ewledekî mîna Wî gihîştîye vê derecê. Pey vê kasêra tuyê îro mera tişteki bi hewaskar bêjî.

Mêran badînên destê xwe hevxistin, vexwarin.

Çavên gişkan li Amîne xanimê bû. Ewê dest avîte biskên xweye reş-sipî bada, serê xwe hinekî bilind kir û berbirî hemûya bû:

-Lawno, şukur vê rojêra! Ezê qewmandineke bûyî wera bêjim.

Welleh seqirtîke usa ode hilda, mêş bifirîya wê bahata bihîstinê. Ewê axaftina xwe domand:

-Rojê em ji Roma reş derketin, hatin gihîştine rîya bereka çîyayê Agirîyê, bi serê Elî nuqîtî dilê min, emê careke mayîn çîyayê Agirîyê nevînin. Min destê Elîyê xweyî 6 salî girt, talde kir û xarbûm ji çîyayê evra hinek ax hilda, mîna tiberikê hinek avîte devê xwe, xubarek jî reşande ser porê Elîyê tîfal. Paşê min bi van tilîyên destê xweva (Ewê du-sê tilîyên destê rastê nîşanî beşterbûya kir) ew ax nava porê Elîyê kurişk-kurişkda da mehandinê. Bi min nekenin ezê çend gilîyan jî bêjim.

Gişka hevra-hevra gotin:

-Em çi karenin bi te bikenin!

-Xêncî şîrê xweyî helal,-ewê axaftina xwe domand,-min axa welat nava porê Elîda mizda û derbazî nava hişê wî kir, lema jî Elî bû yekî bi navdeng, welathiz, bû nivîskar.

Dîsa helbestvan Qaçaxê Mûrad ji cîyê xwe rabû, hat Amîne xanim mîna dayîkê hemêz kir, hate enîya wê û karnîyarî wê bû:

-Dayîkê, ez ber te bejina xwe ditewînim!
Kirina te kirî giringe bê nivîsarê û bi salan bimîne!
Axaftina te çiqasî zelale. Bila Elî qure nebe, ew
zimîn ji te hînbûye.

Yên ku derbarê efrandarîya nivîskar,
helbestvan Elîyê Evdilrehmanda kê-m-zêde
nivîsîne, bawerkî gişkan nêtek wekilandine, wekî
pirtûka "Xatê xanim"-ê wîra navê nivîskarîyê
anîye. Çima? Ji ber ku, mijara wê ji rûpêlekî
dîroka kurda hatîye hildanê, derd-kulên gel,
daxwazîya wane sal-zemana bi bedewî hatîye
nitirandinê.

Mêrxasê êlê Têmûrê Elî, pey şerkarîya çend
salan nexweş dikebe, lê teme dide kurê xwe
Sultan û dibêje:

-Sultan, ronaya min, îdî ezê bimirim.
Weyseta min li te ewe, wekî tu kolosê bavê xwe
bilind bigirî, ji gotina cimaetê dernekebî. Mîna
bavê xwe xêr û şerê cimaetêda bisekinî.

Têmûrê Elî, çawa mêrxasekî povêstê dimire,
kurê wî Sultan dewsa wî digire, ji bavê xwe zêdetir
di rîya gelda disekine, bi alîkarîya gel dijî Roma
reş şerkarîyê dike, qaymeqaymê Romê-milazîmê
dewletê dikuje û tê girtinê. Îcar jî dayîka Sultan
Xatê Xanim derdikebe holê. Pêwîste bê serzaran
Xatê Xanim çawa nîgareke pirtûkê ji destpêbûnê,
heta dawîyê di nava qewmandina da weynekeke
mezin dilîze.

Kurt bêjin. Xatê Xanim dest dide destê gel,
pişt dide piştê wan, hêza dijî dewletê çend bare
dike, him dewa wê yekê dike, wekî azayê
destbînî, him jî xerc-xerac, bergîrê ku, dewlet ji

gel dixweze kêmkê, him Sultan bide berdanê. Bona wê yekê di nava gelda yekîtîyê pêşta tîne û dewletê dike nava bêgavîyê. Ewa du cara padşêra têlêgramê dişîne, wekî kurê wê Sultan berdin. Padşa têl stendîne dibê:

-“Canîm ev kurdêd qeza Dêrsîmê xwîna xwe dane ber çavên xwe. Ji kuştin û ketina xwe natirsîn. Kurê wê kelbê, him milazîmê dewletê kuştîye, him dixweze kurê xwe bide azakirinê. Na, tu wexta ez fermana azakirina kurê wê nadim”.

Paşê padşa wa bersîva têlê dide:

-“Fermana dewletê fermane. Sê roja şûnda kurê teyê bê dardakirinê”.

Cara sisîya Xatê Xanimê têla bergerandîne na, ya bi hukûm, bi xezab dişîne:

-“Raste kuştîye kurê min negedeye,
Qaymeqaymê Romê-milazîmê dewletêye,
Dûmeka dinê nedirêje, kurte.
Herge kurê min berdidî, berde,
Bernadî, şerê kurda tera şere,
Xudê koka te kokêda bibire”.

Padşa kirina kurdan, bi yekîtîya wan dihesê, ditirse û kurê jina kurd-Xatê Xanimê berdide.

Nivîskarê xwedanê nivîsara şîrîn, bi teqîl, bi cî, gaveke şidîyayî pêşta davêje. Pirtûka helbestvan Kurê Kurd ya bi navê “Hişyarbûn” ji azerbaycanî werdigerîne û sala 1960-î dide weşandin.

Kî bû Kurê Kurd? Kurapê Mehmed Qazîya-Rehîm Qazî. Min li bajarê Bakûyê ji 20 sala zêdetir Rehîm Qazîra hevaltî, hogirtî, biratî kir.

Sala 1945-a Partîya wî dişîne Azerbaycanê-Bakûyê bona xwendinê. Komala Mehabatê hatinê hilweşandinê, birîyara darda kirinê Rehîm Qazîra jî derdixin.

Lê Sovêt wî nahêle here, ew hetanî dawîya jîyana xwe Bakûyê dimîne.

Rehîm Qazî-kandîdatê ulmê dîrokê, bû him jî bedewnivîsarêva mijûl dibû. Bona neyar nizanbin ew navê xwe duguhêre – çawa Kurê Kurd dinivîse.

Me nêt nedaye pêşîya xwe derbarê Rehîm Qazîda bi hûrgilî binivîsin, ew mijareke dine.

Ji pirtûka “Şikilê hizkirîya min” emê seranser helbesta bi navê “Şikilê hizkirîya min” bidin. Bi wê helbestêva xwendevanê tê derxin, wekî çawa Rehîm Qazî derdê Welat, mal-malbeta Qazîyan kişandîye, kul-merezê efrandarîya wî çi bi çi bûye? Çawa rêjîma qetilkar şirîtdar damizrandin, şirît pey şirîta hevalandin, badan û mêrxasên bê tawanbar dane dardakirin. Alîyê din da jî kana karkirina Elîyê Evdilrehman wê derê holê.

ŞIKILÊ HIZKIRÎYÊ MIN

Ax, tu rewşa dilê min,
Şikilê te stend îro min,
Paçkir, da ser çevaye,
Ev xewne, yanê çîye?
Dilê minda gul vebûn,
Kulê min jî belabûn!
Eva cara pêşîn bû,

Ku qelama min şa bû!
Teyrada jî selam da,
Gulustana bask veda,
Hertim bona dê-bava,
Law şîrîne, her gava.
Çevê te reş, karbar,
Mîna kurda, zef kubar,
Belg-belg dil min maç dike,
Ew derdê kevn qenc dike.
Vaye, tuyî cem minî,
Tuyî mîna horyanî.
Ji lêvê min xebardan,
Tu ronaya herd çevan.
Bedewetya her benda,
Çevê minda gul veda.
Çevê teye bi xem bûn,
Qey neynika kurda bûn.
Wirda hezar pirs hebû,
Ew hîvîya cava bû.
Ew çeve pir melûlin,
Azabûnê dixazin,
Mîna tirbê Qazîya,
Wetenê min digirya.
Mehebade bi sosin,
Çya-banîye zef rindin.
Avêd kanîa dikişin,
Huba merîya ew tînin!
Darê çînar bask vedan,
Dora rya sî vedan.
Ew bajarê meyî rind,
Bêşîka te dihejand.
Beyreqa sor bilind kir,

Azabûna me sazkir.
 Cara pêşîn bajêrda,
 Stêrka kurda, şewq veda!
 Keç û kurê warê min,
 Axa û beq pûçkirin.
 Zulm temamî unda bû,
 Azabûn li me vebû.
 Bira dijmin bizanbe,
 Xelqê me kurd wê rabe...
 Wextê ez te dinhêrim,
 Kurda melûl dibînim.
 Kurd mêrxasin mîna şêr,
 Nawestin ji qal û şêr.
 Gul-rihanê warê me.
 Baska dide kurdê me.
 Bira dijmin bizanbe,
 Kurd ber wana nimz nabe!
 Şehedê vê yekêye,
 Tirbê hersê biraye!
 Guhar, tuyî yara min,
 Cara pêşîn, huba min!
 Bila derd pûç nekin te,
 Ji wana yek bavê te,
 Yek apê, yek xalê te.
 Ax, êtîmî nepake!
 Tu her roja berwara,
 Topke gula li wira.
 Datînî ser wan tirba,
 Tu têr digrî, ji kerba!
 Ji hemû cîyê Kurdistanê,
 Ew tên bona dîtinê.
 Avê çema dikişin,

Qey sê bira paç dîkin.
 Tirbê wana pir geşin,
 Çimkî, kurd wan hiz dîkin.
 Bihara kurd digirî,
 Wek nexaşê ber dêrî.
 Ax, ruhê te posîde,
 Nolî gulê bi derde.
 Gulîyên teye zef reşin,
 Nolî bextê kurdê min.
 Digerînî şev çeva,
 Ezimana û derva.
 Ruhê te min digere,
 Ji stêrka min dipirse,
 Ezmane reş, rê jî dûr,
 Felek xerab, derbê kûr.
 Hindikek ma, mala me.
 Çira bitemire li me,
 Mala meda hindik ma,
 Çira me geş vêsîya.
 Dihejinî bêşîkê,
 Wî tîfalê, zarokê.
 Lêv dibên, -lûrî-lûrî,
 Tu ji mêranîyê ne dûrî.
 Ew îmdada ruhê min,
 Tîfal şevqa dilê min.
 Dê mê wîyî bi kene,
 Ew huba me herdane.
 Nedîtîye wîya bav,
 Bavê bîr tîne hergav.
 Dişewitim, di xuda,
 Peritî dil, gişk pêda.
 Tu ewledê mêrxasa,

Tê tab bînî ber daxa.
Daxê me ne yek-hezar,
Tu ewledê çûkî-zar.
Wextê ez te dinihêrim,
Xastinekê dibînim.
Tu metirse, kurê min,
Royê bê, emê azabin.
Xema neke, reng navê,
Sebir rinde, got bavê!
Van gotinê bavê xu,
Bêje heval-birê xu.
Ûrt û ruh-berxê min.
Tu îşîqa çevê min.
Bavê te çû ken bîne,
Seba welat bikene!
Tava teze, wê derê,
Wê şemalde, wê derê.
Gulê teze, wê şînbîn,
Wê awazî xebêrdin,
Beyraqê sor wê pêldin,
Kurdê minê zef şabin"...
Bila dayîk binihêrin,
Warê aza têr şabin.
Bi azayî lûrîkin,
Zara serbest mezinkin.
Kurdê zulmê wê pûçkin,
Wê welatê me şênkin.
Welatê me wê gulde,
Gul û sosin wê vede.

XXX

Ax, tu rewşa dilê min,
 Şikilê te stend îro min.
 Paçkir, da ser çevaye,
 Ev xewne, yanê çîye?
 Dilê minda gul vebûn,
 Kulê min jî belabûn.
 Eva cara pêşîn bû,
 Ku qelama min şabû.
 Teyrada jî selam da,
 Gulustana bask veda.
 Vaye tuyî cem minî,
 Tuyî mîna horyanî.
 Çevê teye reş karbar,
 Mîna kurda zef kubar!
 Hertim bona dê-bava,
 Law şirîne her gava!

Sala 1958.

Dewra hênda ew yek edet bûye, wekî yekî
 tişteke pêşkêş-rewayî yekî kirîye. Ew di nava wêje û
 hunermendîyêda jî hebûye, îro jî heye.

Helbestvan, nivîskar Elîyê Evdilrehman jî ev rêç
 domandîye. Li quncikê rûpêlê sisîya ya pirtûka
 “Xatê Xanim”-ê awa hatîye nivîsarê: “Ez vê kitêba
 xweye pêşîne çûk, pêşkêşî nivîskarê kurdayî
 eyan, dersdarê xweyî ezîzî rehmetî Wezîrê Cabar
 Nadirî û birê xweyî bêmiraz Qulîxan dikim.

Elîyê Evdilrehman Mamêdov sala 1958”.

Bona bîranîn, xwestin, rehet-hêmbûna dil, avreşandina agirê dilê xwe nivîskar ew pêşkêşî nivîsîne.

Kî bû Wezîrê Nadirî? Mamoste, nivîskar, helbestvan, dramatûrg, zimanzan, ulumdar û kesayetê civakîyê. Bona derbarê van hemûyada binivîsî karpêkeke cî bi cî pêwîste. Rehmetlêbûyê Elîyê Evdilrehman û Wezîrê Nadirî kurapê hevbûn. Ne ku, bona pismamîyê, lê bona heqîyê, rastîyê ewî timê Wezîrê Nadirî bîrdihanî û bi şêkirdarî derbarê piştovanîya wî, gelhizîya wîda bi dilekî berîstan dixivî.

Wezîrê Nadirîra girêdayî emê du bîranîna, çawa me bihîstîye usa qalkin.

Ji bîranîna Elîyê Evdilrehman:

-Rojekê Wezîrê Nadirî tramvayê sîyarbûye, rê diçe. Li sekinandinekê tramvayê didine rawestinê, mirov hinek peya dibin, hinek sîyar dibin, gava jineke kurd bi dîzika mastva dixweze tramvayê sîyarbe, bîlêtfroş bi dengê bilind dibêje:

-Wêda here kotîyê! Neyê van dera nehermîne!

Ewa awa dibê, tramvay rêdikebe, jina kurd nikare wê sîyarbe!

Wezîrê Nadirî ser tramvayajoda diqîre û wê dide sekinandinê. Û hukumî ser bîlêtfroşê dike, dibêje:

-Ew jin meta mine, alî wê bike, peyabe dîzîka mast hilde, bila ewa bê nikî min rûnê.

Gişk şaşmayî dimînin. Usa jî dikin.

Ji bîranîna Rehîm Qazî:

-Salên damirazandina komela Mehabadê Wezîrê Nadîrî çawa serbazê Yekîtîya Sovêta berê şandibûne wira. Li wira ew tevî Mehmed Qazî, Sêyf Qazî, Mustafa Barzanî û yên mayîn kar-xebateke mezin dike.

Baylozxana Sovêtê li Têhranê bûye. Wezîrê Nadîrî bona pirseke ferz ji bajarê Mehabadê tê Têhranê. Sibetîrê avtoajokekî kurd û maşînekê didine wî, wekî ew here nikî Têhranê maleke kurdan. Ew karê xwe bi serfinîyazî tîne sêrî û paşda vedigerin.

Rêda, nêzîkî dukanekê Wezîrê Nadîrî avtoajora dibê vira raweste. Ew derdixe dirêv dide avtoajo, wekî here minra cixarê-sîgarêtê bikire. Avtoajo dikebe dikanê, lê dereng dertê. Sebira Wezîrê camêr nayê, pey wî diçe. Êmê çend deqîqa şûnda ewana vedigerine maşînê, Wezîrê Nadîrî dinihêre fahîkê wî tune, dizîne.

Dibên qayde usa bûye pêwîst bûye ew wê yekê bêje baylozخانê.

Dibêje. Li baylozxane teme didine Wezîrê Nadîrî, çî dibe bila bibe, gotî ew diz bê eyan kirin.

Avtoajoyê kurd dibêje:

-Kek Wezîr, ew cîyê ku, em sekinîbûn, nêzîkî sûka heywanfirotanê bû. Roja bazarê em herne wira.

Ewana usa jî dîkin. Hinekî li bazarê digerin, nişkêva Wezîrê Nadîrî dinihêre xortekî bejinbilind li sûkê virda, wêda digere. Ew nêzîkî wî dibe û dibêje:

-Xorto, hanê tera ewqas dirav, were minra em herine mala min. Tu gellekî xweşa min hatî. Êvarê mêvanê bêne mala min. Pêwîste pezekê, duda serjêkî, postkî, goşt hûrkî, sêleqeliyê mera bipêjî.

Xort bi şabûn dirav hildide û gotina Wezîrê Nadîrîra qayîl dibe. Tê maşîna wîda rûdinê.

Wezîrê Nadîrî dizînkava avtoajora dibê, emê xort bibîne mala te. Avtoajo tişteki nabêje. Ji bazarê pezekê jî dikirin. Ewana tene mala avtoajo. Wezîrê Nadîrî teme dide avtoajo miqatî xortbe, pezê bidê bila şerjêke, karê her tiştî bike, hetanî ez tîm.

Odeke xwedanê malê hebûye, çawa dibên, wêya dixemilînin. Paşê diçe baylozخانê û dibêje, wekî wedê ez hatinê vira jina min bi hemle bû, îro ez pêhesîyam ku, minra kurek bûye. Ezê êvarê mala avtoajo da mêvandarîyê bidim, kî dixweze bila bêne şaya min. Hinekî berî hatina mêvana Wezîrê Nadîrî wî xortî dibe, jorê dide rûniştandinê, demek derbaz dibe mêvan tî. Gellek bi xelat tî, hinek dirav didin.

Pêşxwîn tî-tijî bûye.

Hemû kes beşter bûnê Wezîrê Nadîrî radibe û dibêje:

-Hevalno, biborînin, minra tu kur nebûye. Fahîkê minî ku, unda bibû min dîtîye.

Paşê karnîyarî xort dibe:

-Kerema xwe rabe ser pîya!

Ew destê xwe berbi xort dirêj dike û axaftina xwe didomîne:

-Ew fahîkê li xort yê mine! Ewî xortî fahîkê min dizîye. Lê ez pir şame, wekî kurdekî, ji kurdekî dizî kirîye. We çî xelat, çî dirav anîye, ezê gişkî bidime

vî xortê kurd. Wekî ew kurd belengaz, desteng
nebûya dizî ne dikir.

Dibên, ew mêvandarî, ew qewmandin qedirê
Wezîrê Nadirî daha jî zêde dike.

Me ev herdu bîranîn bona wê yekê bîranî, wekî
bila bê zanînê her mirovê gewre nikare hevra du
bilindaya bide meşandinê. Bona wê pêwîste tu
welathiz, mirovhiz, pêşewitîyê gelê xwe bî. Wezîrê
Nadirî jîyana xweye kurt nava van qenderada
heland. Him jî Elîyê Evdilrehman hey
digot, dişêkirand, wekî Wezîrê Nadirî çawa
jîyanêda, usa jî zanîgehêda bûye mamosteyê min,
bin bandora wîda ez gihîştîme destanînan.

Elîyê Evdilrehman welathiz, kurdhizekî bi agir-
alav bû. Dîroka gelê xwe, dunêzanebûna wê,
xwezaya wê rind zanibû; hey pey qewmandina
diçû. Wekî em seranser helbesta wîye ku, sala
1962-a pêşkêşî gêneral Barzanîyê nemir kirîye
çawa minak bidin, bi wêva emê nêta xweye jorgotî
makkin.

GÊNÊRAL BARZANÎRA

(Bi miqamê kilamê cmaetê)

Heylo, dayîkê canê, Barzane,
Xweş Barzane, cîyê bok-barane,
Roja dibe şer û oxrmê grane.
Kurd bi çek-sîlah qeydê mêranî,
Dcivine dora mêrxas Barzanî.
Dipirsî, -wetenêm ezîz Kurdistanê,
Cîyê nivtê, meskenê kulîlkane,
Hîve, roye, cineta me kurdane.

Tu Barzanî, Barzanî,
Tu mezinê kurdanî,
Tu ronaya kurdanî,
Tu gumana kurdanî,
Hey Barzanî, Barzanî,
Hey Barzanî, Barzanî.

Heylo dayîkê, ezê Kêrkûkê,
Slêmanîyê, Sulhedînê, Zaxokê,
Ketim xûn dikişê weke ave,
Bextê minra ne rêye, ne delave,
De, min go,-basîstê teleqreşo,
Destê xwe bi xûna kurda meşo,
Kurd hene lehengê binê bera,
Esker û xura mekole qebra.

Tu Barzanî, Barzanî,
Tu mezinê kurdanî,
Tu ronaya kurdanî,
Tu gumana kurdanî,
Hey Barzanî, Barzanî,
Hey Barzanî, Barzanî.

Dayîkê şere, ev rast du sale,
Qasimî kfire, basîstî decale,
Ordîya nizamê, teyra, tanka,
Dişîne ser kurda bi bêlûka.
De, min go,-basîstê telaqreşo,
Destê xwe bi xûna kurda meşo,

Kurd hene lehengê binê bera,
Esker û xura mekole qebra.

Tu Barzanî, Barzanî,
Tu mezinê kurdanî,
Tu ronaya kurdanî,
Tu gumana kurdanî,
Hey Barzanî, Barzanî,
Hey Barzanî, Barzanî.

Daykê, porî kurbe şeş dûzana,
Kurd şêr dîkin mîna partîzana,
Şere, şerekî kefilî-demane,
Li basîsta bû agirdewrane,
Jin, zara, kal û pîra diku jin,
Bajar, gunda, qîşla wêran dîkin.
De min got,-basîstê teleqreşo,
Diprsî,-wetenê ezîz Kurdistane,
Cîyê nivtê, meskenê kilîlkane,
Hîve, roye, cineta me kurdane.

Tu Barzanî, Barzanî,
Tu mezinê kurdanî,
Tu ronaya kurdanî,
Tu gumana kurdanî,
Hey Barzanî, Barzanî,
Hey Barzanî, Barzanî.

Şerê kurda, şerê heqîyêye,
Bo azabûn û bextewarîyêye,

Serokê me gênêral Barzanîye,
Mêrxas, efat, egîtê me kurdaye,
De lêxin, lêxin, bav û birano,
Bila tu kes me neke lomano.
De min go,-basîstê teleqreşo,
Destê xwe bi xûna kurda meşo,
Kurd hene lehengê binê bera,
Esker û xura mekole qebra.

Tu Barzanî, Barzanî,
Tu mezinê kurdanî,
Tu ronaya çevanî,
Tu gumana kurdanî,
Hey Barzanî, Barzanî,
Hey Barzanî, Barzanî.

1962.

Jîyanêda usa minra li hev hat, wekî ji sala 1965-a, hetanî sala 1970-î, tevî Elîyê Evdilrehman rêdaksîya rojnama "Rya teze"-da xebitîm. Ew mîrovekî xwedanê gotina xwe bû. Kêmasîyên xwe jî, yên hevalan jî merd-merdane digot. Ew merd-comerd û nandar bû. Mala wî mala mêvana bû. Ez jî gellek cara bibûme mêvanê vê malê. Pakîzer xanima jina wî di vî alîda ji wî paşta ne dima. Çendî-çend cara min bihîst, ewê digot:

-Roja mêvan nayê mala me, ez hewdizanim min tiştêkî bi hêja unda kirîye.

Pakîzer xanim yeke bejinbilind, qemere xwîn şîrîn bû. Paqijîya wêye bi her alî, xurek petina wê, tore kirina ewledan, şêwirên wêye cî bi cî mirov

hey-r-hejmekar dihîşt. Xêncî van destanîna Xwedê zanebûna zimanê kurdî jî dabû wê. Em pirr caran bûne şehedê wê yekê Elîyê Evdilrehman karnîyarî wê dibû:

-Bilbila zimanê kurdî, ça bêje binêm min ev peyvîn rast nivîsîye yanê, na?

Filan tişt bi kurdî çawa tê gotinê?

Ewê bi hewaskarîke mezin bersiv dida. Me bi xwe jî gellek peyvîn ji wê dipirsî. Ewê carna bi henek digort:

-Heyfê xwendina min tune, minê ji we rintir binivîsîya.

Ez hey pey wê yekê ketim gelo ev qenderên jorgotî ji ku bûne qîsmetê Pakîzer xanimê? Ewa di mal-malbeteke navdar, dewlemenda mezin dibe. Bavê wê Hecî Sadiqê Şemo xwedanê hebûneke giran bûye. Dibên, çend kerî pezê wî, garana dewarê wî hebûye. Xwedanê dilekî fire bûye. Bûyareke wîra girêdayî îro jî di nava hinek qebîlên kurdan da bi şîrînayî tê bîranînê.

Ewê jî qal dikin, wekî salekê, wedê Hecî Sadiqê Şemo bi dostekî xwe Kerbalay Îsmayîlra diçe hec. Havîn bûye, kîne-kîna germê bûye. Sadiqê Şemo dinihêre yek dew difroşe. Ew şerbikek dew distîne û vedixwe. Dew xweşa wî nayê û Kerbalay Îsmayîlra dibê:

-Dewê ji vî rintir bal me bê dirave. Qenebe mehê carekê, duda derê mala min hasilat tê kilandinê. Jinên feqîr, kasib, belengaz ku, tên dêw dikilên, herek elbekê tijî dew dike, lepe rûnê nivîşkî dike nav, xwera dibin. Dewê mayîn jî, hinekî ji malê dût çeleke mezin hatîye kolandinê, tijî wir dikin, ji wê

çewek hatiye kişandinê, wura dew dikişe tê, tijî dalîna sa dibe, ewana têt-têt duxun.

Kerbalay Îsmayîl awa bersîva wî dide:

-Hecî Sadiq, tu neheq hatî hec, hec derê mala teye.

Ev gotin nava hinek kurdanda dibe mesele. Yê ku, qezenc-kara derê mala xwe dihêle, dixweze rêke dûr here, wîra dibên, hec derê mala teye.

Elîyê Evdilrehman timê bi şêkirdarîkê mezin Pakîzer xanim bîr dihanî (ewê çend salan berî wî dunya xwe guhastibû), keda wê, kirinên wêye qenc, çawa dayîka helal dihêjand, lema jî romana xweye dîrokî pêşkêşî wê kirîye: "Ez vê romana xwe pêşkêşî bîranîna komekdar û helala xweye hizkirî-Pakîzera Hecî Sadiqê Şemo dikim".

Gotî bêjim di jîyana Elîyê Evdilrehmanda Pakîzera rehmetsêbûyî weyneke mezin lîstîye. Ulumdara hêja, kurdzana navdar M. B. Rûdênko di gotareke xweda dinivîse, wekî jîyanêda serfinîyazîya mêrê kurd gellek cara beqî jina kurd bûye. Ev nêt serensar li Pakîzera Hecî Sadiq dihat.

Barkêşekî wêjeya gelê kurd Elîyê Evdilrehman pirtûken bi navê "Morof", "Xatê Xanim", "Dê", "Gundê mêrxasa", "Gulustan", "Bîranîn û serhatî", "Hesreta min" dinivîse, dide weşandin, lê hesreta wî avreşîn nabe, ji ber ku, dilê wîda hê gellek pirs hevalîyabûne û nivîskar dest davêje qasir nijinandina bedewnivîsara here mezin, fire-romana bi navê "Şer çyada" nava 15 sala da diefrîne û hinekî hêmin dibe. Çima?

Ji ber ku meydana romanê fireye. Nivîskar berê xwe dide dîroka gelê kurd ya hên, ji wir çawa mijara romana "Şer çyada" qewmandinên salên 20-30-î yên sedsalîya bista hildide, ser qewmandinên qewimî, ser evraqên dîrokî disekine, bona neheqîyên dujmin bide kivşê wana bi bedewî dinitirîne û xwendevana avbeza dîrokêra dide derbaz kirinê.

Kandîdatê ulmên filologîyê, rexnakarê xwedanê qelema rast û tûj, tel û şîrîn Çerkezê Reş di pêşnivîsara ku, bona romana "Şer çyada" nivîsiye, dibêje: "Himlî Ereb Şemîlov û Elîyê Evdilrehman wa gotî "turişkirin" xwe li "şovkirina" mezîla romanê bigirin. Hilbet pirseke mayîne, çika wan qewlê tunebûna cêrbandina tradîsiyêda ça "şovkirin", xwendevana çito "ekine" ruh û hiş-sewda stendin".

Dost, birayê minî salan, Çerkezê Reş, bila cîyê te bi cinetbe, rehma Xwedê li Ereb Şemîlov û Elîyê Evdilrehman be ku, nava "şovkirina" roman nivîsîsarêra derbaz bûn û pey hatîyê wan bi romanên xweva em şa kirin.

Vira dixwezim ser girfîkekê vekim. Dema derbarê roman nivîsên yekemînda pirs tê holê, qe navê Elîyê Evdilrehman nayê kişandinê.

Pêşekzanno, min biborînin, tu dema heqîyê nedine neheqîyê. Reş reş, sipî sipî binivîsin. Ev yek çandêke mezine!

Sala 1974-a bû. Ew 4-5 sal bû, wekî min bi malbeta xweva ji Yêrêvanê barkiribû Bakûyê û Îdara çapamenîyêda parastina sura dewletê-sênzûrayê da kar dikir. Wê salê pirtûka Elîyê Evdilrehman ya bi navê "Gulustan" ronahî dîtibû.

Ewledekî gelê meyî hêja, helbestvan, lêkolîvan, wergervan, ulumdar Şamîl Eskerov li nehîya Kelbecerê dijîya û serwêrê para xwendinê, yê nehîyê bû.

Cîyê bêjim, herdu rehmetlêbûya-him Elîyê Evdilrehman, him Şamîl Eskerov zûva hevra nasbûn û haj efrandarîya hev hebûn.

Karra girêdayî Şamîl Eskerov zû-zû dihate Bakûyê. Di rasthatina dorêda ewî ji min pirsî:

-Elîyê Evdilrehman pirtûka xweye nûh-"Gulustan" tera şandîye?

- Belê.

-Minra jî şandîye. Nêtek hatîye hişê min. Ez dixwezim helbestên Elîyê Evdilrehman çawa dibên, yên bijarê, bijbêrim û wergerîname zimanê Azerbaycanî, lê weşandin diware.

Bila xwendevan bizanbin dema Sovêtêda her tişt bi plan dihate kirinê. Min tê derxist-Şamîl Eskerov çi dixweze bêje.

-Bira,-min got,-tu helbestên wî wergerîne, ezê jî têkime planê û bidime weşandin.

Nava wedekî kinda wî jî, min jî gilîyên dayî qedand û sala 1975-a berovoka helbestên Elîyê Evdilrehman bi azerbaycanî, bi navê "Ehtîram" ("Sîyanet") hate weşandinê. Ev pirtûk bû rûmeteke bilind.

X X
X

Ser qewilê heyî emê pilekanekê jî dakebine jêrê.

Pey hatîyê birê mezin Ûsivê Evdilrehman. Ew nehîya Baserkêçerê, Komela Ermenîstanê, dersxana 10 bi zanebûneke kûrva xilaz dike û tê Bakûyê, înstîtûta bijîjkîyêda tê pejirandinê. Ew wê înstîtûtê bi qîmetê bilindva xilaz dike û wî dişînine bajarê Kîyêvê, çawa bijîjkê leşkerîyê. Dema Yekîtiya Sovêta berêda înstîtûta bijîjkê ya here hêja dihate hêjandinê, him jî yên ku, rind dixwendin bi birîyar dişandine ser kar. Ûsivê delal nava wedekî kinda çawa têrapêvt navekî pak qezenc dike û wî dişînine welatê dereke-Mongolistanê, çawa bijîjkê parîşkerê Sovêtê. Çend salan wira kar kirinê şûnda îcar jî pêşekê xweyî bona tendirustîya mirovan li Almanîyê dide domandinê.

Carekê, sala 1967-a, min ew mala birê wîyî mezin, mala Elîyê Evdilrehmanda dît.

Ewî ji portfêlê destê xwe, çendî-çend name derxist û mera xwend. Ew name bawerkî ji hemû quncikê komelên Sovêtê, dê-bavên eskeran, yanê jî eskera bi xwe wîra şandibûn, qayîlbûna xwe didane wî. Hineka jî şêwir dixwestin. Ûsivê Evdirehman bi axaftineke kurdîye zelal got:

-Ez herro nama distînim. Roja ezê bahatama vira, ser rê, min qutîya poçta xwe vekir û ev name hildan, wekî rêda bixûnîm. Usa dibe wede nabe wana bixûnim, bersiva wan bidim. Gellek dê-bavê eskerê ku, ber destê min qencbûye, hîvî dikin ez çawa mêvan herime malê wan.

-Bira,-Elîyê Evdilrehman bi şabûn got,-şukur li hemû Yekîtiya Sovêtê malên te hene!

Min jî serda zêde kir:

-Bijîjkê destemel, timê bi mal, bi nan-dewbî!

X X
X

Warên em pilekanekê jî dakevin. Bêne ser pilekana navîn, ser birê navîn-Qadirê Evdilrehman.

Pey xwendina bilindra wîra rêke karkirinêye fire vedibe. Min gotîye, dîsa dibêjim gellek cara jîyanêda yek nebe piştovanê te, destê alîkarîyê dirêjî te neke, jîyana te nayê hevkêşkirinê. Kesayet-karkarê civakîyê, dîrokzan, nivîskar Nado Maxmûdov salên dirêj dibe dewsgirtîyê Wezîrê transporta Komala Ermenîstanê. Ew camêr Qadirê Evdilrehman di karê rîya hesinda dide cî-warkirinê. Ji hemû quncikê Yekîtiya Sovêtê çiqas kirîn-firotana barê giran ya Ermenîstanê hebû, çiqas bar şandin, bar stendin hebû bi şanenava (îmza) vî efatî dihate çareserkirinê. Min bi xwe jî çend meha bal wî kar kir. Evî zîlamî nizanbû westandin çîye? Pîsporê karê xwe bû, monik-monik ji vî karê giran, bersîvdar serederî derdixist.

XXX

Xwendevanên hêja!

Emê pilekanekê jî dakebin, bêne ser birayê biçûk-Îsmayîlê Evdilrehman.

Navê vî êginî, kirinên vî mêrxasî hey ser zaran bû. Rîya jîyanê ne rîya baxçê gulane, her kes here ji wana baqekî biçîrpîne û bînke. Na! Sed car na!

Ew jî mîna bira dersxana 10-a kuta dike. Dê-bav dixwazin ew jî bibe xwedanê pêşekî. Ew têxnîkûma malhebûnê, beşa mêxanîkayêda tê pejirandinê.

Dîploma têxnîkûmê stendinê şûnda Rewanêda di îdara Avto înspektorîya dewletêda dikebe ser kar. Îsmayîlê çeleng bi kirina xweva roj bi roj tê naskirinê. Ew pêşîya gellek qezîya digire, rîya rast nîşanî avtoajoyan dike. Nava wedekî kinda wîra dibêjin:

-Bizotê rîyan!

Rojekê min weteya vê gotinê ji wî pirsî:

-Bi gorîya min,-Îsmayîlê Evdilrehman bersiva min da,-hemû mirov rêwîyê rîyanin. "Hespê" wan maşîne him bi hêmîn, him bi xofin. Pêçek-rol, çerxa wan destê avtoajodaye. Gava avtoajo avtomobîlê sîyar dibe, pêçekê dide destê xwe, gotî bizanbe him jîyana wî, him ya rêwîyan, xêncî Xwedê, destê wîdaye. Nava wanda jî, merd hene, namerd jî hene. Carna yek vednxwe, yek bê xew dimîne, yek jî quretiyê dike û desteka avtomaşînê dide destê xwe, ne derheqa xweda, ne derheqa mirovên rêwîda mitale dike, çep-rast wê dajo, mirovên usa, kî dibe bila bibe, ew namerde. Çawa dibên, rêçûyîna avtoyêra têderdixim avtoaja merde, yanê namerde, ew ser hişê xweye, yanê na? Ya sereke pêwîste, tu ji pêşekê xwe hiz bikî.

Hizkirîyê pêşekê xwe-Îsmayîlê Evdilrehman nava 2-3 salada tê naskirinê çawa pêşekzanekî navdeng. Sala 1968-a wî pêşta dikişînin, wî dişînine nehîya Vêdîyê, çawa serkarê avtoînspektorê dewletê. Nehîya Vêdîyê di Ermenîstanêda nehîke

here mezine. Li gundên vê nehîyêda pêda-pêda azerbaycanî, kurd, hinekada jî ermenî dijîyan. Xêncî zimanê dê Îsmayîlê delal him azerbaycanî, him bi ermenî rind zanibû. Digotin, wekî Îsmayîlê Evdilrehman, rind zane, kîjan mal xwedanê kîjan maşînêye, kî çawa dajo.

Sala 1970-ê Îsmayîlê Evdilrehman bona xwendina bilind dişînine Moskvayê. Ew akadêmîya polîsayê bi serfinîyazî kuta dike.

Vê şûnda ser serbuhurîya jîyana wîda bilindayî, kirinên yek ji yekê xweş zêde dibin. Sala 1976-a ewî dîsa kivş dîkin serokê avtoînspektorê dewletê. Li vê nehîya Ermenîstanêye dûr-Amasîyayêda jî navekî hêle qezenc dike. Dema mirov bi helalî, bi zanebûn, bi efatî karê dike, wê weşê, rastî, bawerî xwe dide alîyê te û tu dibî hizkirîyê hemûya.

Lê pêwîste bêjin, sal bi sal Ermenîstanêda pîrsa netewî-miletîyê xirab, tûj dibû. Te tirê ev yek ne bona Îsmayîlê Evdilrehman bû. Ewî ji sala 1980-a hetanî sala 1988-a li nava goveka bajarê Yêrêvanêda karê xwe didomand.

Lê îdî pîrsa zeftkarîya Qerebaxa Çîya, pîrsa netewîyê, ermenîyên Ermenîstanê mîna nexweşîya zerikê hingavt. Ermenîya bi zorê bere azerbaycanîya û kurdan dîkin. Vê yekêda culetîya Îsmayîlê Evdilrehman bi her alî derkete holê. Ewî bi sedan malên azerbaycanan û kurdan ji şewitandinê da xilazkirinê û kawranê maşînên koçbera ji tixûbê Ermenîstanê da derxistinê, ji wan gişkara jîyana dubare anî.

Îsmayîlê efat sala 1989-a hate Bakûyê, ji ber ku îdî Ermenîstanêda ne kurdên musulman mabûn,

ne azerbaycanîya. Vira mêrxasî, culetî, efatîya vî ewledê kurd bi her alî hate eyankirinê. Cara ewlîn ew bi rezedilî çû Qerebaxa Çîyada qulix bike. Ew nehîya Axderêda çawa dewsgirtîyê reyîsê nehîyeyî polîsê hate kivşkirinê.

Vira roj bi roj agirê şêr zêde dibû. Ermenîstanê bi alîkarîya piştovanê xwe gav bi gav axa Azerbaycanê digirt, gund-bajar dişewitandin. Rojekê Îsmayîlê Evdilrehmân oda xweye karkirinêda rûniştibû, du polîsên ermenîyan derda ketine hundur û emir kirin:

-Destên xwe bilindke! Dora avayî hatîye girtinê! Bawernakî pencerêra binihêre! Emê te kefîl hildin!

Îsmayîlê efat dît, rastî jî usane, lê ewî qe xwe şaş nekir nişkêva qirma xwe kişand û mîna agirê bizotê ser yê hatî birî û qirme kuta peleguha wî, bi hukum got:

-Emirke bila merivên we ji dora avayî vekişin, wekî yek culet bike têkeve hundur, ezê we herduan jî bukujim!

Îdî rêke mayîn nema bû, wana usa jî kirin. Wê demê hê wekîlên Moskvayê li Xankendê rûdiniştin. Îsmayîlê mêrxas têlê xist û çend seheta şûnda ewana bi çek hatin û herdu polîsên ermenîya xwedê giravî girtin, birin.

Vê qewmandinê şûnda gellekan gote Îsmayîlê çargurçik, wekî ji vir derê, here, lê ewî got, ku mirin heye, paşta vegerîn tune. Lê ermenîyan mîna nêçîrê pey wî digerîyan û rojekê wedê ew diçû Axdamê, nêzîkî gundê Peprevendê dora wî çaralî birîn û ew dane ber gulla. Mêrxasê kurê mêrxasa ji

maşînê derket, xwe da ber qirş-qalû, devîyan, sê seheta zêdetir wanra kete şêr.

Îdî tarîyê erd higavtî bû, Îsmayîlê efat bihîst, ermenîyan hevra kirine qîre-qîr, wekî ji wana yek giran hatîye birîndar kirinê! Vê demê Îsmayîlê Evdilrehman ji qeleça xwe derket, berbi maşînê çû, derê wê vekir, rûnê bajo, parava li pîlê wî xistin. Ewî li tu tiştî nenihêrî û maşînê sîyar bû, wextekî nihêrî ew li Axdamêye. Ewê birîna xeder gellekî kişand, lê şukur îro mayor Îsmayîlê Evdilrehman Memmedov mîna xortekîye û ewê hê gellekî navê gelê xwe bilindke.

X X
X

Xwendevanên bi kubar!

Bîranîna me, ya derbarê malbeta bi rûmrt da ser hevda tê. Lê şewata dilê me natemire! Bila wekilandin nîbe bêjin, pirsê dew-doza Ermenîstanê-Azerbaycanê-Qerebaxa Çiyara girêdayî ermenîyan bi zorê, bi qetîlê bere 200 hezar azerbaycanî, 20 hezar jî kurdên muselman kirin.

Biçûktîyêda rev-bez kete pêşîya mezinên Elîyê Evdilrehman, ahaltîyêda jî ew kirin bû para wî. Ewî serkarî bi dehan malbetên kurdan kir, anî derxiste bajarê Bakûyê.

Em zû-zû rastî hev dihatin. Mirina Pakîzer xanimê, ahiltîyê, koçberîya bi zorê bibûne bandoreke girane mezin û ew roj bi roj diljan, dilêş dikir. Rojekê jî ew kete nexweşxanê. Me pîyê xwe ji ser wî nedibirî. Carekê jî em çûne bal wî, ewî gopalek dabû destê xwe û li hewşa nexweşxanêda giran-giran diçû, dihat. Ewî ez pêşberî xwe dîtînê bi posîde got:

-Ahmedê bira, zanî encamê gopalê destê min çîye?

Min dixwest bersiva wî bidim, lê ewî ser da zêde kir:

-Min jîyana xweda gellek neheqî, dijarî dît, şêrda hatime birîndarkirinê, lê ew kirina bayavîkên ("Şervan") ermenîya, ya ku, êrişî mala min kirin, hemû pirtûkên bi kurdî, destnivîsarên min derxistine derva agir berdanê, her ku ewana ber çavên min dişewitîn, min hew zanibû celat buhust-buhust min post dike.

Naha min hemû giranîya derd-kulên xweye salan, bindestîya welat, şewtandina pirtûkên bi kurdî, mirina Pakîzera xwe, ya ji wede zûtir, kirîye nava gopalê destê xwe, ser hev, ser hev wan gişkan nava dilê xwera derbaz dikim dixenîqim, naxenîqim, dimirim, namirim.

Em ber dilê wîda hatin û di wê rewşêda me ji wî bona bernama zimanê kurdî hevpeyvîn hilda. Naha her tenê ew dengê wî mera çawa bîranîna salan maye.

...Rojeke meha bahara sala 1994-a kurê biçûk Fexreddîn ew bi maşînê dibire ser bîjîjk. Rêda ew kurra dibê:

-Lawo, maşînê hêdî bajo. Dilê min tê ji qefesê derê. Tu hew dizanî dilê bargiran dixweze hêmînbe.

Pey van gilîyara carekê-duda dike axinî! Kur vedigere li bavê dinihêre, dibîne bav ser alîyê çepê quncilîye ser hev.

Tirba wî li Bakûyê, merzelê "Îrevanîya"-daye. Ez zû-zû tirba wî bi deste gulên sor zîyaret dikim!

Rehma Xwedê li wîbe!

Deva Sipî

Миров эевлазя салан сер хвера дербаз
кириня, ессе ромян бушурь, ъуда, заротъя хве бър
тъне ц йа еъѣб еве, вець еѡ салана решбин, йаня
сипьбин, фиргъ туне, ту хвезилбцна хве вана тънь
ц хве- хвера дибяжь:

-Хвезила ван салан, хвезила ез дьса заро
бцйама!

Наща, ведя рязан салан сер минра щатине,
чцне, дербазбцне, эава эопал дидиме дестя хве,
сагна сер пйя растя, сагна set pîyê ъепя
дихинэирим, эиран-эиран ря дичим, хвезилбцна
хве салян заротъя хве тъним. Веллещ, биллещ
заротъя мин не би зул бц, ля би кул бц.

Жи рцйя нещегъя девря ем, ченд мал-
малбетян курдан пей деро-деркириняра щатибцн
фярмеке колхозеяда кетибцне сер кар. Ду керъ
пезя колхозя, эарана дявяр, ревойя щеспан ц деван
щецц.

Мин ъар-ѡаран дибищъст мезинан щевра
диэотин:

-Ме жъяана хведа ге деве хайънекирине.
Евана небине бела серя ме, щер тиштя генъбе.

-Ло мал авао, деве жи щейваня дин даща
сернермин.

Йець диэот:

-Ля кьна деван?

-Миров нещегъйя ли девя неке, деве би кын набе.

-Gotine деве эиране, рабцйе сер щякя, щяк нешкестъе.

Мин уса ринд эушц дида ван нята, ту небаже, чендека дербазбе, езя бибиме хемхуркяшя деван.

Фярма жи эунд-колхозя ченд км дцр бц. Фяза фярмя рязян эир-топикан бц, бинтаря раст-бест бц. Еw тъяя бажона щейwън ц зевъяа бц. Ли wир, тещ, эеним дищате ршандиня. Ля ли бинтара топикан бостан дищате авътиня-ширьнайа зебеш, киндор, хъяр, памъдорян wя деря жи тема девя мирован не дичц. Еw bejĭ бцн. Хwезайа wя деря би съяб бц. Щер чар демян саля щим байя эур, щим байя нерм дищат. Щавъня къне-къна тавя бц, дигижиланд. Шев щева дишкест, щяник дибц,дестя бербанэя гиравъйя давьта дер-дорян топикан.

Ли фярмя жи зарян эирик, щетанъ мяря мезин шивантъ, эавантъ, ревовантъ дикир, жина жĭ bēĭvanĭ. Ез 9-10 саль бцм. Чирпъке эермешойа дабцне дестя мин ц мин revovanĭ ли деван дикир. Ринд тя бъяра мин дешц деве ц ду-ся кудикя ван щебцн. Ряшя мин еw бц, ку нещялим деве тякевине зевъяан, явара деренэ жъ wана бинъме мехел. Хяньъ Дева сипъ, эишк бер кап-синэя ван щетанъ бербанэя дищатине эиряданя.

Нава девада девек щебц, пцртик-щиръяа wя гергаш-сипъ бц, лема жъ жяра диэотин: «Дева Сипъ».

Дева Сипъ жи деван эишкан мезин, эир бц. Мехел щатиня, мирован дцрва еw мязе кирина, те щевдизанибц керъ пез ли эущаря мехел щатъе.

Рожян еwльн эава Дева Сипь жи ъйя хве радибц, сим-лєря хвейе пенъавъть датань ердя, щцрик-щцрик мешъйяня, мин тиря щеж чъйакъ билинд кетъе, щим жь хоф-тирс тижь диля мин дибц, вець weхта ерд алькъда харбе, келефейя пяхта бя, езя тядя щериме харя.

Эеллек недътъйян Дева сипь, йян би шейр-щежмекар щеццн.

Еwя не дихвест явар, явар wяйя капкин, синэва зирядин. Яваря ли зушаря мехел дищат, кънэя деве бердидан, радикирине бажоня, еw жь, жи мехел радибц, деве алькъда дичцн, еw алькъ майьнда.

Щер явар мин беря хве дида бажоня, дичцм деве дищанѣн зушаря. Девян майьн дуду-дуду, сися-сися, щинекъ дцрь шев дичярьйан. Мин еwана беравъ ъикъ дикир, берби зушаря ажотиня, Дева Сипь чигась дцрбцйа, дида пей ме, дищате зушаря. Мин жь хwера кирибц едет, дичцм япяъекъ серя Дева Сипь, чавян wя тъмар дикир, миздида, еwя жь шей ез бьн дикирим.

Рож би рож ез ц Дева Сипь щънь шев дибцн. Чи ку дикете дестя мин-галикя зебешан, киндоран, наня кутчцйь дибир ц кере-кер дида Дева Сипь.

Ъарека, дема мин еw тъмар дикир, нишкява жи девя мин деркет:

“Йих”!

Еwя wя weшя чокян хве дань ердя, мьна авайкъ рцхъйа, мерихъ. Ез wя сьйарбцм ц еwа щядь-щядь рабц. Ез щим тирсьйам, щим жь гуре-гуре дер-доря хве нищярь, мин эо, ка биня ге кесек мин дибъне, вець ез девя сьйар бцме. Ля ту небаже,

дѣа мине рещметлябцѣй, деря маля секинѣбцѣе, ли
вя йека мязе дике. Евя кире гѣре-гѣр ц бер би ме
шат:

-Риззано, лаowo, би фесалбе, девейя те ердяхе!

Ля мин гирмика девя би щерду дестава
эиртибц. Дѣа мин берби ме щатиня, девя жѣ бер би
дѣа мин да зава. Ем эищѣштине щимберѣ щев.
Дева Сипи щядѣ-щядѣ жорда щате ердя, щямын
мерихѣ. Дѣа мин ез щемез кирим ц би денэкѣ
берерѣйайѣ эот:

-Дева Сипѣ, щинѣ ез щатиме эищѣштине вѣ
емрѣ, евя дунѣа эеврик би дерд-кулавaн ез
баркириме, щим жѣ даха ду еwледа ли сѣнѣа мин
хистѣе. Йек бирчѣда мир, йек тѣда бищѣѣ. Сала
хелайя мин йек бер дѣwяр щѣшт, чѣме гурфѣа, зарока
ся салѣ тя бер тендѣря, жорда тендѣря динищѣре ц
дикебе вѣа дифетисе, йек зава ем деро-дер, нефѣkirin,
рява ав туне бц, тѣда кире гѣре-гѣр ц бер чавян мин
тѣда бищѣѣ. Дева Сипѣ, ту жѣ би дестѣ мирован
щей щатѣ баркириня, ѣарна мировян бя ѣнсаф
сербар жѣ серда дане пишта те. Ърода езя нещѣлим
те баркин.

Жи вѣа рожѣа Дева Сипѣ бц щизкирѣа щемц
мировян ли фѣрма.

Еря, жи вѣа рожѣа япѣѣе ав кишѣйайе, саян
диряж кетине бер щев, ля гевмандинян зоратѣа
мине dīn jī, ѣян ку би тевзѣльѣа Дева Сипѣ щатине
серѣа мин ге бѣра мин начин. Еwана йек жи йека
щеваскарин. Езя жи wана dūda бяжим, галким,
дигевиме щинек мировян, ку зц нан-хойа хверѣ
бѣр дикин, ѣян ку бона нефса хве, бона kērhatina
хве саян достѣа диряж пѣпес дикин, сера дербаз

дибин, йян ку сьр-пъвазека нещяжане, ля бегъ шинекѐ дин дердикебине шоля, бер чавян хве тиштекъ набьнин, йян ку чавян ван жи мал-милк-щевцна дуня тяр набе, йян ку гетилиа дикин, бухдана давяжине мировян пагиш, йян ку шера радикин, эелан би щев дидине гирия, йян ку щей дихвезин парьйя би рцн tenѐ девя вандабе, белкъ беря хве бидине кирина Дева сипь, жи вана шермкин, серя хве бержаркин ц хвѣра шафьйан дерхин.

Еw салека зядетир бц, векъ ез мигать дева дибцм. Нава вѣ ведейда ез щьнь щемц щерекетян ван бибцм, бя шик еw жь щьнь кириян мин бибцн.

Рожеке щавьняйе эерм бц. Ме нищярь машьнек щате фярмя ц хянъ автоажо ся мировян шукуметя жя пейа бцн. Дизотин йек седря шяwира эунде, йек дьрякторя мектебйе, йек жь, жи нещьйя щатьйе, лап мезине. Вана щемц мировян фярмя тывандине тькъ ц шировекирин, векъ шукумета Совятя бирьйар пежирандьйе, ку ту зарек жи мектебя дер немьне. Щате занья фярмѣда ся-чар зар щене, зоть йека сянтьабря щерине мектебя, йаня на, вя серяшаня бидине дя-баван, седря шяwира эунд жь берпирсьйаря вя йекйе. Мировян шукуметя нав, пашнавя дя-баван, йян зарян ку вя щерине мектебя нивсьн ц сер щев, сер щев теме дан, щьштин чцн.

Салян бян дербаз бин, езя бихцним, кар биким, тякевиме нава реwш-рявебирина шукумета Совятя ц мьна би мьльона мирован тядерхим, векъ альки да хведяэиравъ еw дѣвлетеке хемхуре, альйя диняда ду чялек, эак, щеспек ц ченд пезян кя щевцйа дизотин ту кцлакь-дѣвлемендь, еw кес, еw

малбет дида нефькириня, жи ъъ-варян кал-баван
деро-дер дикир, дида зиртиня... Чава ев ченд
малбетян ме! Йекътѣя Соятя хведаня ду баран бц.
Барекьда киринян чавэиртонеке, хве песнандин,
барекь да жь вир-виз, дерев бц. Лема жь щевтя саль
щцнда щеж стцнян вя кет ц еw би ъарекаява
нилwешѣя. Де ло! Ло! ло!

Беля, йека сянтѣабря чава малбетян меда
диэотин, йека мѣща нѣща, щат деря ме бирь. Ем чар
зар, теvь биря минь мезин бербанѣя жи фярмя
деркетин ц ме беря хве да мектеба эунд.

Мектеба эунд ся-ѣаг кѣломятран дцрь фярмя
бц. Девса зарян майѣн ъро жь никарим тиштеке
бѣжим, ля мин тиря пер-баска мин щейе ц ез берби
мектеба дифирим. Шабцна мин ли ерд-есман
щилнедищат. Ем эищѣштине мектеба. Щевѣша
мектебѣе фире, дарян пѣда-пѣда дор чармедоря
чигил би чигил, кулькян ренэ би ренэ, зарян ку
десте-десте дищатин, денѣя мигам, дер-дор
щинэавтѣ, авайя мектебѣйѣ йек та, шибегян вѣйе
сипѣ щейр, щевесеке уса тижѣ диля мин кир, мин
хвест бигърим, бѣжим:

- Ъдѣ ез, жи вя деря, ту дѣрада начим!

Я растѣ жь хвезила вя рожа! Биря мин ем
спартине дѣрякторя мектеба, теме да ме, ем би
торѣбин. Еw чц, ем ман.

Бона мин рожян мектеба йек жи йека хвеш
дербаз дибц. Щѣр теня рѣя ме дцр бц. Ъар-ѣара
зарян дин мѣнѣ дикирин, ъро йек не дищат, сибя
дуду не дищатин, кѣ дищат, кѣ не дищат, мин щѣро
рѣя мектеба би шабцн дукута, дичцм-дищатим.
Dersxana sisîya da xwendinê îdî tik-tenê diçûme

mektebê. Би щеваскар дерс диханд. Пей дерсара, зава дищатиме мал, ез дьса мигать дева дибцм.

Ръйа мектебя щинда мехеля деванран дербаз дибц. Девян майън дцрь мехел дичяръян, ля Дева сипъ жи мехел щинекъ вяда, дора ръйа ме дичяръйа. Ем вяда щатиня, евя девя хве жи ъяре дердихист ц ли ме диніщяръ. Зарян майън кялека вяра дербаз дибцн, ля ез нязкъ вя дибцм, мин серя вя тимар дикир ц пащя дичцм диэищыштиме шаэиртян щевалян хве.

Давъйа рожян пайъзя бц. Шиль-шилопе, ба-баран, щерь-щерьрешк тев щев бибцн, чцйън-щатина мектебя дижвар бибц. Ъдь жи фярмя тень ез дичцме мектебя. Дя-бавян шаэиртян дин щерека менък derxistibûne щоля, зарян хве не дишандине мектебя. Ез тень мабцм.

Щеро дъйа мин шебега ез жи хвея радикирим. Мин зц-зц кинъян хве хведикир, сер-чавян хве дишцшт, di nava wî wedeyîda dayîkê nanekî tendûrêyî qalin dikire çentê min, him jî minra qûçek amede dikir.

Gellek cara, wekî hebuya, hêkeke êvarda petî dikire nava parî nan, dida destê min, ez ji mal derdiketim. Min rêda ew qûc dixwar. Rê dûr, wede kurt, gotî wededa bigihîştama mektebê.

Рожека щинекъ деренъ кетибцм. Гцця нън дестя мин да эищыштиме девя.

Девя Серя хве щилбиръ, девя хве кире мирче-мирч, ли рцйя мин нищяръ. Paşê çentê min bîn kir. Мин беря хве да вя:

- Дева Сипъ, -эот, -йегън бьна нън авъте поэя те.

Пей вя эотиняра мин дест авьте ченте, наня тендиряйь галим дерхист ц нивь кир, диляжь девя кир. Евя пашья нан бьн кир, пашя девя хве авьта, парь-парь ew хвер. Нан хвериня щцнда серя хве билинд кир, те гей дизот:

-Хведайя Мезин, шукур вя рожяра!

Пашя би позя хвева ничанде мин, серя хве кире бер хве ц жи тья хве легья, чц.

Жи вя рожяда, эава жи мал дердикетим, дичце мектебя, вяда берби зушаря щатиня, мин динишарь Дева сипь жи зушаря рабцье ц щатье сер рья мин секинье, стцье хве диляж кирье, щим дев давяже въ аль, щим въ аль эщайя дор ря дичаре. Ез нязькъ вя бцня, евя девя хве жи чяря дикишанд, чавян хве даньшань мин дикир. Ез диэищштиме вя. Серя вя, чав, поз, зушя вя тмар дикир ц дест давте чентейя хве, наня тендиряйь галим дердихист, нан дикире ду керья, керьк дикире чентейя хве, керьк диляжь девя дикир. Евя уса ширьн-ширьн ew нан дихвер, миров щейр-щежмекар дима.

Рожека жь дйа мин ез жи хевя ракирим ц эот:

-Lowo, рабе зц-зц киньян хве хвеке, сер-чавян хве бишо, жи бириньешьра яваря щинек мае, мин эерм кирье бухwe,eva jî sê manat hwera bidê kalêta bistîne, бухwe. рякеве.

Мин бириньешьр хвер ц щатим эищштиме Дева сипь. Мьна щер тар мин жи ченте нан дерхист, нивь кир ц диляжь девя кир. Дева наня пара хве хвер, хаст щере, щате щишя мин: "Мин бириньешьр хверье, se manat jî diravê min heye,

ezê bidime kalêt buxum”, лема мин керъйя nanê para xwe диражъ девя кир.

Ewya керъйя дестя мин нищяръ, серя хве билинд кир, ез мязе кирим, мьна мировя хейъдъ, пишта хве да мин, чц.

Sibetirê min dîsa ew kirina xwe wekiland: nan kerî kir, dirêjî devê kir. Ewê dîsa kerîyê nîn şîrîn-şîrîn, bi mirçe- mirç xwer. Min kerîyê din dirêjî wê kirînê, ewê qe rûyê min nenihêrî, serê xwe kire ber xwe, pişta xwe da min hîşt kire boqe-loq çû.

Wedekî dirêj min kir-nekir devê ji kerîyê para min parîk jî nexwar. Deva sipî timê para “xwe” kuncî-kuncî, bi mede dixwer, qe çav bernedida para min.

Rojekê dîsa devê kerîyê para “xwe” xwerinê şûnda, min kerîyê din dirêjî wê kir. Ewê sere xwe bilind kir, hinekî zûrbû li rûyê min nihêrî, tû kir, da gova, ji min dûrket.

Pey vê yekêra min hero tenê kerî nan dîrêjî wê fikir, vira mesele-meteloکه gel kete bîra min:

Bila parîyê mirovan nîvcîbe,

Bila namûsa mirovan cîbe.

Eva qewmandinek... Ya duyemîn:

- Min dersxana sisîya da dixwend. Nava wan sê salanda tişteک nehatibû guhastinê, her tene rîya min hinekî alîkî dinêda dagerî bû.

Dîsa berbangê dayîkê ez hişîyar dikirim, dîsa min qûçek dida destê xwe, rêda dixwer, dîsa deva sipî derdikete ser rîya min, ez gihîstînê tûşa wê, min nan dikire du kerîyan, kerîk dida wê, ewê nan xwerinê şûnda, min rîya xwe didomand.

Şiverîya ku, têra diçûme mektebê, nava şoveke mezinra derbaz dibû. Çawa min jorê got,

kolxozê wira genim, ceh direşand. Payîzê dext-ber hildidan, ka dikirine çend lodên dûrî hev. Lodek ser rêça min bû.

Zivistan bû. Zivistaneke hişk bû. Hero şilî û şoyî bû. Rê qevz kirina min dubare, sêbare dijar bibû. Herîreşkê davîte teşkê min. Te hewdizanibû ew ne herîye, lê qetrane, benîşte teva zeliqîye.

Rojekê ji rûyê bêxemîya min da, wê zivisranê, hindik mabû jîyana min biquşide. Pey dersanra şagirtên dersxana me pev ketin herin barîgeh-salona mektebêda volêybol bilîzin. Ez jî wanra çûm.

Lê êmekî min bîr kir, wekî ez ne ji wan zarên hetabim, çawa dibên, mal-avayên wan ber pîyê wane, lê rîya min dûre, rojên zivistana kurtin, tarî zû dikeve.

Nizanim me gellekî lîst, yanê hindikî, dema ez ji mektebê derketim, min dît îdî derange, ronahîyê daw û delingên xwe hildiçine, wekî bi carekêva minêbe, him jî sare. Min da ser rê. Ba û baran, mij û dûman tev li hev bibûn pêrava li min didan, ez paşta dev didam. Min tîfalî têderxist ez serma dikim. Te hewdizanibû rûyê min didine ber gûzana. Min destê xwe da dêmên xwe, têderxist kulîyên berfê ser hev, ser hev dibarin û li rû, bijangên minva dizeliqin, dimînin.

Min carekê ji bavê xwe bihîstibû, gava mirov dikeve nava seqemê, bahozê cîkî bisekine, ewê biqerise, paşê jî xwedê zane wê çi bibe?

Lema jî min gavên xwe fire-fire avît, wekî di nava livitandinêda bim.

Hindik mabû bigihîjme loda ser rîya xwe. Li wir rîya min nîvî dibû, kurt dibû. Xofeke giran ez hingavtim. Dengên terewilan guhê minda hatin. Li vira gur, wawîk, rûvî hebûn. Min nizan bû, ew deng çi denge, gelo ji dûr tê, yanê nêzik?

Min rîya xwe domand, gihiştîme ber lodê. Ew dengên gava din ne dihatin, lê tirs, xof laşê minra dibezîyan. Min piştî xwe da lodê, xwest çentê pirtûk dayînme erdê, dest, ser-çav, guhên xwe mizdim û zû rêkevim.

Nişkêva kûze-kûza çend gurên ku, pêşberî min sekinîbûn, ez lerizandim, hej bi min ket! Min her carekê kire qirînî! Zimanê min hate girtin, guhên min xitimîn, çavên min reşevêhatin, çok li min babûn, hindik mabû ez hişê xwe undakim. Çeqe-çeqa dev-diranê guran notla mêkutekî serê min diket. Çavên guran dibiriqîn, diçiûsîn, vêdiketin. Min centê pirtûkan dabû ser sîngê xwe, bi her du destava digivişt. Wana dev vekirî, bi qirce-qirca qîlên xwe êrişî min dikirin, cake din gavekê-duda paştî vedikişîyan. Nêçîr ketibû nava lepên wan, lê nêçîra xwera dileyîstin, deng didane dengê hev. Gavekê şûnda dengê usa hate bihîstinê te tirê erdu-esman hevket, guhê min vebûn. Ew dengê nirîna Deva sipî bû. Ronahî hate çavên min. Deva sipî ketibû nava guran. Çivane-çivane, dorhêl-dorhêl fitil dida xwe, nire-nira wê bû, parava çivî davîtin, pêrava derbên giran davîte hovan. Herîya ku, loqe-loq ji bin lepên devê derdiketin mîna derbên giran guran diket. Hovên birçîda delîyayî nedixwestin dest ji nêçîra xwe bikişînin. Deve jî bona van peranîyan bibû

zinarekî; devê xwe davîtime wê, devê wanva tişteke nedihat, serbarê serda derb li wan diket.

Piştê devê min da bû. Gurekî parava xwe avîte devê, ewê çivteke usa dev-diranên wîda lêda, pêşîyê gewro kire kûze-kûz, paşê wêda ketinê, mîna sa kire ewte-ewt. Min rind didît derb ser derban van perenîyan dikebe. Yek ji derba pîyên devê erdê diket, yê din dihat ser wira derbaz dibû, diçû, cake paştê vedigerîya. Di nava vê heşir-meşirêda tişteke kete bîra min. Mezîna gotibû, min jî hilda bû. Digotin kul-merezeke gurên serên çilan ewe, wekî ewana zo-zo nagerin, yek-yek, sisê-sisê, pênc-pênc, heft-hevt digerin, ji ber ku, bowerîya xwe hev naynin. Min ew jimirîn, ew pênc bûn. Nizanim çawa bû, weşekê şûnda du gura hevra kirine kewte-kewt.

Pey vê yekêra min dît gur paştê vekişîyan, ji lodê dûrketin, serhevra banzdidan, ber hevra diçûn-dihatîn, kûze-kûza wan, ewte-ewta wan hev ketibû, nalîna wan dihate bihîstinê, rev bi wan ket.

Deva sipî pêşberî min sekinî bû, ustuyê xwe ber bi min dirêj kiribû, çavên xwe kuta bû çavên min. Êmek derbaz bû, ewê çokên xwe da erdê û te qey digot, wekî ware min sîyarbe, nanê dayî li min helalke. Ez hinekî ser hişê xweda hatim û devê sîyarbûm. Ewê berê xwe da malan. Ez hê ditirsîyam, min xwe-xwera digot:

-“Diqewime gur dîsa êrîşî me bikin”. Em ji lode êpêcekî dûrketibûn, min dengê sa bihîst, çirikek-dudu jî derbaz bû, hewar-gazîya yekî hat:

- Qolo, ha qolo nehêle!

Pey vî dengîra dengê dîya min ez hingavtim,
hejandim:

- Hewar, hey hewar, zû warên!

Hema vê gavê çend seyên fêrmê, rex
devêra, bi ewte-ewt derbaz bûn çûn. Wana bîna
gura hilda bû.

Bayê gur mij-dûman bela-bela kiribû, berfa
gava din ne dibarî, sayî ketibû erşê ezmîn. Min
nihêrî apê min pêşîyêye, dîya min, bavê min û
hineke din dane pey wî, deng dane dengê hev
berbi me tîn. Gava em gihîştine tûşa hev, devê fitil
da xwe, rîya xwe guhast, kire loqe-loq, gavên xwe
zêde kir. Dîya min kire qîre-qîr:

- Weyla min porkurê! Dûrî serê kuran! Weyla
min çav rijîyayê!

Mirovên ku, hatibûne hewara min gişk paştâ
vegerîn, dane pey devê.

Deva Sipî berî gişkan gihîşte derê malê, wê
deqîqê çok danî erdê, hemû mirovên malên me
derva beravî serhev bibûn, birê min ez hemêz
kirim, ji ser devê hildam, hate rûyê min.

Hinekî şûnda mirovên wê derê hev qesidîn,
herekê tişteke digot. Ez birime hundur, minra cî-
nivîn danîn, dîya min destê xwe ber serê minra
biribû bû. Hê kesî ya bûyî bi hûr-gilî nizan bûn.
Çend seheta şûnda gişk pêhesîyan eva sê sale,
min nanê para xwe kerî kirîye, kerîk daye devê,
min kirîye, nekirîye devê kerîyê din nexwerîye, îro
devê ez ji devên guran xilazkirim.

Hê bû kûre-kûra dayîka min, wêlîya jî deng
dane dengê hev.

Bavê min bi kesereke kûrva, bi dengekî şidîyayî got:

- Deva Sipî, mal-halên min qurbana tebin!
Deva sipî, nanê te xwerî li te helalbe! Xwezila hinek mirov jî nanê xwerî pêpes nekin, bîr nekin.

Çîya bû, zû hedimî

Meriv hene... Lê meriv hene, ku bi hatîna xweva pêşîyê malekê, malbetekê, êlekê şa dike, paşê, dîroka gelê xwe dixemilîne.

Meriv hene... Meriv hene, dunya xwe guhastinê ne ku malek, malbetek, êlek, lê gel şîna wî dike. Xelîlê Evdile ser milê bi sedan mirovan çûnê merzel, ewî nizanibû, îro ne ku tenê şîna qewm-pizmamane, lê şîna bi hezaran kurdane. Wê rojê dê got:

- Min kur unda kir, jinê got: min mêr unda kir, ewledan gotin: me bav unda kir, lê gel got:

- Me baskekî çanda xwe unda kir, dora miqamên meye dewlemend reş xemilî.

Dibên, wekî her kurdek dilê xweda dengbêje. Lema timê ji mala bavê Xelîl him dengê bilûrê, him dengê tulumê dihat. Ew hê xizan bû ser bilûr, tulum, meya bavê xwe bûbû maşoq. Mal xewle bûnê, ewî bilûra bavê hildida, dida ser lêvên xweye kaxetî, pif dikirê, tilfîyên xweye biçûk hildida, datanî, lê ew deng tenê li wî tesele dibû, wextekî bav pê hesîya, îdî kurik çend miqamên sivik lêdide. Ew şa bû. Bilûrekê xweye kevin da Xelîlê biçûk û got:

- Xwera lêde. Naha zivistane, em derketinê zozanê, ezê te hînkim.

Ji wê rojê hetanî dawîya sala 1991-ê ne bilûr,
ne zurne ji destê Xelîlê Evdile ne ket.

Ji gotina Xelîl:

- Bavê min şivan bû. Her havîn em diçûne
zozana. Li Gizil Zîyaretê kon vedigirt.

Ewî rojekê ez xwera birime ber pêz. Kerîyê pêz
rihaşte beroj. Bavê min zurne derxist, ser kevirekî
rûnişt, piştî xwe kuta zinarekî û gote min:

- Were rex min bisekine.

Ez hatim kêlekê sekinîm, ewî gote min:

- Hela van kevir-zinaran, van newal-gelîyan, ava
kanîyan-çeman mêzeke, binihêre çiqasî şûştî-mûştî,
kûr û zelalin. Bil xweda xweyîke, miqamên me kurdan
mîna van zera mehkemin, mîna van gelîyan, kûrin,
mîna ava zelalin.

Paşê zinarek nîşanî min kir û got;

- Here wî zinarî bi herdu destava bigire,
bihejîne.

Çawa wî got, min usa jî kir. Ez vegeirîme bal wî,
ewî ji min pirsî:

- Lawo, te zinar ji cî leqand ?

- Na, bavo.

- A, miqam, sazbandîya me jî usa giranin, bona
ewî zinarî ji cî bileqînî, gotî, mehekê, salekê bêyî ber
zinêr çok vedî, bikolî, paşê leqem lêkeve. Naha bi serê
min sond buxwe, wekî tuyê bi mehan, salan çok vedî
sura miqamên me hînbî, ezê te hînkim, him jî çend
bilûr, zurneke mine nû heye, ezê bidime te.

Min him sond xwer, him jî bi mehan, salan pey
sura miqamên kurdan buhust-buhust gerîyam.

Miqamên kurdan bi sureke gellekî ecêb hatine pêçandinê. Dibên xwedê giravî ez rind lêdidim, bi nêta min, min her pê avîtiye ber şêmîka wê surê. Êpêce sal derbazbûnê şûnda, min têderxist, ku bavê min hê hindik gotiye.

...Xelîlê Evdile qurefî hez nedikir, lema usa digot. Gilîyek zêdeke. Di alîyê lêdana miqamada, hevanîna wanda ew bibû hunermendekî hêle!

Xelîlê Evdile, ne ku tenê miqam lêdida, lê dicedand wana ji destên lepreşa derxe.

Ji gotina Xelîlê Evdile:

- Dilê min dêşe, xorto. (Ewî ji gilîyê xorto hiz dikir. Ew berbirî meriva bûnê digot:- Xorto). Usa bijmarîne, wekî baxvanek şev-ro karê bike, xwûdanê birêje, gulên reng bi reng bighîne, lê cîyê sekinî, hinek merivên zorbe bên, wan gulan deste-deste bikin, xwera bivin. A, ya zargotina me usa bûye. Ev ciran-mîranên me bê şerm, bê etib çîrokên me, mesele-metelokên me, ya here şewat miqamên me weldigerînine ser nota û dibêjin: “Hoy Narê”, “Koçerî”, “Têlo”, “Qaz-qaz” û yên mayîn yên mene.

Lê belê, te pêsîra wana girtinê û pirsînê, wekî usane, ça kilama “Hoy Narê”, “Qaz-qaz”-ê bêje, bestirê zûr dibî li te dinihêrin. Ewanara şirove dikî, ku ew miqamana ser gilî-gotina, ser kilaman hatine xuliqandinê, ewana bi teleqreşî dest davêjine qirşik-qalan.

Xorto, ez tera kurt-kurmancî bêjim: “Usa bizanbe ji roja xortîya xwe destpêdik li hewşa kal-bavê xweda bi kula dilê xwe avayîkî çendî-çend ode çêdikî, dixemilîni, nişkêva yekî nehiş tê dibêje: “Ev hewş, ev

ode yê mine". A, ya me van cîrana di mesela sazbandîya kurdan ahaye.

...Xelîlê Evdile ji salê 60-î dest bi lêdan û efrandarîya miqamên kurdan dike, digihîje helanêd bilind. Wexta ewî "Mem û Zîn" lêdida, te qey digot, wexte wan bêmiraza ji kûraya sedsalîyan, ji axa sar derxe û destên wan bide hev. "Ker û Kulik" usa lêdida, meydana şer dihate ber çavan, tire-tira pîyê "Bêcanê" li te tesele dibû, dayîka Werdek dibû çîyakî bilind, Emer axayê nemam ber pîyê te dibû xwelî.

Xelîlê Evdilê nêzîkî 30 salî li Yêrêvanê para radîoya kurdî xemiland. Ewî him miqamên gel bi hostetî lêda, him jî miqam pey miqaman, qam pey qamqn diefirand.

Ji bîranîna me:

- Em, xwedanê van rêza û Xelîlê Evdile hevalên hev bûn. Bibûne rêwîyê rîyan, bibûne piştovanê heve rojên dijar. Carekê me ji wî pirsî:

- Tu çend miqamên govenda, sîyara, mêranîyê, mêrxasa dizanî?

- Xorto, diware bêjim, lê qey dibêjî gişkî dizanîm. Dizanî çima usa dibêjim? Carna li dewata yek minra dibêje, filan miqamî lêde. Ez ku wî miqamî nizanbim, dibêjim:

- Xorto, ca wî miqamî devko lêde, yanî jî bifitînê... Hema ewî devê xwe vekirinê, ez dest xweda wî miqamî lêdidim. Ay, bona wê yekê dibêjim, ez gişkî dizanîm.

Lê ser vê yekêda dixwezim zêdekîm, bêjim, merivê herî sobekar tu wexta nikare berekê qevzke, derbazbe.

... Şayî, dewatên kurdên Ermenîstanê, Gurcistanê, Azerbaycanê, Qazaxstanê bê Xelîlê Evdile derbaz bûnê, gelean hevra digotin:

- De, ew çî dewate, wekî Xelîlê Evdile nexemilandîye.

Gel lêdana wî, dewat derbaz kirina wî xemileke nebînîyayî dijmari. Bi gilîkî, ew dewata, ku Xelîl derbaz dikir, te tirê dewat ser dewatêda, şayî ser şayêda hatîye.

Gellek cara em bûne şehedê wê yekê, xwedanê dewatê mehekê berê dihat ji Xelîlê Evdile hîvî dikir, wekî filan wextî bê dewata ewledê wî şênke.

- Sala 1989-a Xelîlê Evdila bi hezaran kurdanra tevayî ji cîyê kal-bava, ji Ermenîstanê zorê hate leqandinê.

Ewî li vira, bajarê Bakûyê gellekî hesreta weten dikişand, usa bibû ji rohê xwe, ji zurna xweye hizkirî bizirî bibû.

Ji gotima Xelîlê Evdile:

- Xorto, ez ser tiştekî metelim. Ermenîya mesela Qerebaxa Çîya kirine menî berî hemû Azerbaycana dan, lê çima berê me kurdên musulman dan?

Ya rast birê xwera bêjim, ez gellekî ber xwe dikevim. Li wira, min her sibe çîyayên me mêze kirinê, ruh ber ruhê minda dihat. Naha xerîbî, bê cî-wartî li min kudret tê. Ecêba ser ecêbê ewe, wekî cara qe naxwezim zurnê bidime destê xwe.

Ji bîranîna me:

- Te qey digot, ewî zanibû, wê zûtirekê mala xwe heta-hetayê barke dunya tarî, lema jî îdî kêma nêzîkî zurnê dibû.

Rojekê bi têlê mera axivî û hîvî kir, ez bême mala wî. Ez çûm. Hema li hewşê me bihîst, çawa dengê zurna Xelîl der-dor hingavt bû. Em dêrîda ketinê hundur, ewî zurne ji ser lêvên xwe hilda, cî nîşanî me da, em rûniştin ewî got:

- Mizgînîya min bide, kurê min Sîyabendra kurek bûye. Îro sêrojîya wî bû. Min nave wî nevîyê xwe danî-Xelîl. Ew li min çûye. Raste Sîyabend jî zurnê lêdixê, şukur dengê sazbandîyê ji silsiletekê derbazî yeke mayîn dibe. Lê nuqutîye dilê min Xelîlê mezinbe û wê dewsa Xelîlê Evdile bigire!

Pey van gilî-gotinara me êpêcekî derdê gelê xwe ser hevra, ber hevra bîr, anî

Me zozan bire aranê, aran anî zozanê. Em ber dilê hevda hatin. Lê dilşewitîyê sazbandîya kurdan zanibû, wekî ew ro bi ro xweda diçilmise. Me jî zanibû, ew çiyakî sazbandîya kurdane, lê ro bi ro dihedime.

Ji rasthatina me:

Ew nêzîkî salekê bû li Bakûyê navenda çanda kurd "Ronahî" bi fermî hatibû damizrandinê. Ez sedr-serokê wê bûm. Bona komakîlam-reqasê, ya bi nave "Berbangê" serhevda bînin û li kûlûba ser

nave "Bakû fehlesi"- yêda êvarîkê- şayê derbazkin, em çûbûne mala Sîyabendê Xelîl. Êpêce wede bû, wekî me hevra diaxivî, çawa bikin di nava demeke kurda bona kurdên Azerbaycanên konsêrtê bidin. Di nava wî wedeyîda nevîyê Xelîlê Evdile-Xelîlê Sîyabend ji me dûr neket. Me bi ezîzî nevîyê Xelîl da ser çokên xwe û jê pirsî:

- Navê te çîye?

- Navê min Xelîloke.

Ji vê bersivê em usa şabûn, per-baskê me tune bû bifirîya.

Belê, em bawarin Xelîlokê îro, wê sibê bibe Xelîlê sazband, çiqasî zuryeta Xelîlê Evdile, Sîyabendê Xelîl, Xelîlê Sîyabend û yên mayîn hene wê nehêlin ew xezna kilam-reqasê, dengbêjî-sazbandîya kurdan bêne bîr kirinê.

Gotineke me:

- Hineka gotine, wekî bona gel ji rûbayê gerdûnê bidî hildanê, gotî ziman û sazbandîya wî jê bê stendinê. Lê bila neyar û felek rind bizanibin, ew her du bilindayan tu dema ji gelê Kurd nayê stendinê ! Bona kurdan ziman-sazbandî him roye, him jî hîve. Ro û hîv hatinê stendinê, dûmeka dinyayê duqusude.

Dîsa bîranînek – rasthatina dawîyê

- Em dîsa li mala Sîyabendê Xelîl mêvanê sazbandîyê bûn. Em li odekê beşder bibûn û guh dida miqamê wî, yên nûh. Vê demê ji mêvana yekî nicande min û got:

- Kerema xwe, rabin oda dinê binêhêrin.

Min nihêrî, wekî Xelîlok gêzî daye ser sîngê xweyî biçûk û ew jî “miqamê” xwe lêdide.

Min şabûna ew maç kir û got:

- Bêrxê, gellek hukumdara bi gêzîya zemîn, wede, dewrê xwestine him sazbandîya te, him zimanê te gêzîke, ji te bistîne; lê îro te ew gêzîyana pêpes kirîye, sera derbaz bûye, her qaşê gêzîya malbeta Xelîlê Evdîle kirîye sîmê sazê û miqamên govend, dîlana gelê xwe, ya paşwextîyê lêdidî. Lêde, lêde, ez bi heyran!

Ji neynûka dilê meyî şikestî:

- Axa wetan şirîne. Kudretîya cîyê kal-bava, hesreta kevir-zinaran, avên çem-kanîyan, dilşewitîya tîrbên ezîza, Xelîlê mîna çîyakî hê 50-î salê wî xitim nebûyî bire axa sar.

Zivistana sala 1991-ê, 2-ê meha sibatê Xelîlê Evdîlera nebû bahar. Vê zivistanê felekê nehîşt bahar ser wîda bê, dunya wî guhast.

Wê salê li Qazaxstanê, Marza Cambûlê bi qazaxî rojnama bi navê “Akjol” derdiket, rûpêlekî bi kurdî, bi navê “Sibe” ronahî didît. Min derbarê mirina Xelîlê Evdîleda gotareke bi navê “Nexşê dor bi reş” nivîsî û rêdaktorê wê Kurbanelîyê Îlîaz

Mamêdovra şand. Ew gotar di wê rojnamêda hate weşandin. Diqewime hinek weklandin hebe, me biryar kir jêrê wê gotarê çawa heye usa bidin:

Nexşê dor bi reş

Xelilê Evdile. Ev nav hatinê kişandinê xweberê- xwe beşera mirovan xweş dibû, dil tijî hub-hizkirin dibû, reqas, govend, dihol, zurne, bi gilîkî, şahî dikete bîra te,

...Evdile denqê bilûrê birî, dê xwe avîte pêşîra wî û qot:

- Evdile, lawo, çavên me tevayî ronbe, tera kurek bûye!

Timê mala bavêda dengê bilûr û tulumê dihat. Zarotîyêda, hema hevt salîya xweda, wextê li gundê wan dibû şayî, wedê zûrnevan qeydê govendê lêdixist, govendê li hewşê govek dida, Xelîl mîna zarên mayîn virda- wêda nedirevî, yanê dikete piştgovendê, yanê ker-lal rex zurnevan disekinî û ev migamê lêxistî, ser qeydê bavê lêxistîda, tijî dilê xwe dikir. Sibetirê ber berxan, karan qamûşek qul-qulî dikir û pifdikir, dengê ne virda, ne wêda tenê li wî tesele dibû. Aha, hê biçûktîyêda Xelîl bû heyr hejmekekarê bilûra bavê xwe.

Rojekê bavê têderxist, wekî Xelîlê biçûk îdî bûye maşoqê bilûrê. Bilûrek da destê wî û yek jî bi xwe hilda, hêdî-hêdî ew hinkir, kurik anî dunya miqamên kurdî. Lê evê bextewarîê pir nekişand, bav bê wext çû ser diloanîya xwe, Xelîl ma sêwî.

Lê dilê wî nebû sêwî. Hêdî-hîdî nav dengê wî, daha rast dengê zurna wî gihîşte hêlanên bilind. Îdî bona Xelîl gellek cara şayî paşda diketin, ji ber ku îro vî gundî ew dibire dewata ewledê xwe, sibê gundekî mayîn. Paşê jî komelên Ermenîstanê, Gurcistanê, Azerbaycanê, Qazaxstanê, Asya Navîn.

Salê 60-tî Xelîlê Ebdîle bû hizkirîyê radîoya Ermenîstanê, ya para xebirdanê kurdî. Em bi xwe bûne şehedê çendî-çend dewatê wî derbazkrî. Xelîl qeydê, miqam lêxistinê, te tilîyên wî nihêrînê, te hew zanibû ewana mîna piçe-piça evîndara hevra xeber didin. Wedê îdî govend dihate teribandinê, ewî bi çavên xweye girva çavdikire diholvanê xwe û te qey digot, dibêje:

- Xorto, amadebe, emê serê hespê buguhêrin. Elbêra qeydê dihate guhastinê. Lê wekî sergovend merîkî reşesvan bûya, elbêra govend dîsa şên dibû.

Van rojan ev nexş-nîgarê miqamên kurdîye, ku Xelîlê Evdile, xemilandibû, nitirand bû reş girêda. Xelîl bû mêvanê 50 salê zivîstana vê dunya ronahî. Vê zivistana sala 1991-ê Xelîlê Evdile bû para axa sar. Koraya te! Xelîlê Evdile, te xwera xezneke gelê kurd bire dunya tarî! Çavê felekê, wext-zemîn, çavê mirovên telaqreş korbe mecal neda ev çiqilê çanda millet bê xeyîkirinê.

**Sala 1991-ê
Bakû.**

Hêleşana jîyanê

Em, du ewledên salên nefîkirinê-Nadîr Nadîrov û Ahmedê Hepo li welatekî-bajarekî xerîb rastî hev hatin. Yek me 78 salî, yek jî 74 salî bû. Sala nefîkirinê 1937-a, sala bona beşeke kurdan, ya heşir-meşirê Nadirê tîfal 5 salî bûye, ez yê xwedanê van rêzan xizanê xizana 3 salî bûme. Malbeta wana tevî bi hezaran malbetên kurdan dibin derdixine best-beyarên rêspûblîka Qazaxstanê, ya me tînin derdixine Qirgîstana tî-birçî. Hevtê salî şûnda yek çawa akadêmîk, yek çawa nivîskar dewatî welatê wanî aza dikin. Di nava serbuhurîya meda gellek mîna hevbûn hene. Şirîta çarenûsa me zemîn, dewrê, rêjîmê mîna hev reş-sipî hûnandîye. Di nava derd, kul, nexweşî, belengazî, şayî-şîna meda cudatîya weke serê derzîkê hebe, tunebe, ewê Xwedê zane.

Wekî ez ji serbuhurîya wî qalkim, yanê jî, ji ya xwe binivîsim, xwendevanê binihêrin herdu jî mîna hevin. Her tenê cudatîya mezin di nava pêşekê medaye.

Ezê di vê bîranînêda gellekî bi kurt car-cara xwendevana rîya jîyana akadêmîk Nadîr Nadîrovra bibim, car-cara çaranûsa xwera bikime nas. Emê binihêrin rorobarîya wana yeke.

Ez biçûkê malbeta me bûm, Nadirê tîfal pey nuxurîyê malbetê Enverê Keremra, sala 1932-a tê dunê. Wê cî bi cîbe, wekî çend rêza derbarê Enverê Keremêda binivîsin, ji ber ku, ew ne ku

dibe stûna malbeta xwe, lê wan salên diwarda dibe piştovanê gellek kurdan. Berî nefîkirinê Enverê Kerem têxnîkûma kurdan, ya Pişkavkazê, li Rewanê xilaz kiribûye. Rûsî rind zanibûye, gava şuxulekî kurdekî di dîwanêda (wan sala kurdan hukûmetêra digotin: "Dîwan"), hevdiale, ew dibe piştovanê her kesî. Dersdarîyê dike, helbesta dinivîse, dibe yekî navdar.

Jîyanêda usa minra li hev hat, min ew sala 1992-a, li Almaata, 60 salîya Nadîr Nadîrovda dît. Destnivîsara helbest, bîranîn, pêkenînên xwe da min, wekî ez bixûnim, nêta xwe bêjim, bi gilîkî destê alîkarîyê dirêjî efrandarîya wî bikim. Çi ji destê min hat, min kir û pêşnivîsarek jî nivîsî. Sala 1998-a pirtûka Enverê Kerem Nadîrov, bi navê "Hesreta sala" li bajarê Almatîyê ronahî dît.

Xwendevanê hêja!

Li vir dilê min tijî bû, lema jî min berê xwe da dunyayê:

-O, dunyayê, şîrîta te çiqasî dirêj bûye, sebira te çiqasî fire bûye!

Te hey çarenûsa her mirovekî bi sebir, lê weke nexşê xwe ser şîrîta xwe hûnandîye, îro jî dihûnî. Dunya, wekî ez rûnê, qelemê bidime destê xwe, bi hûr-gilî derbarê rîya jîyana xwe da binivîsim, paşê yek ewê minra bixûne, diqewime dilê min bisekine.

Lê ez bi ecêb betalê wê yekême, tu çawa çarenûsa ewqas mirovî dihûnî, tu çawa derd-kul, şayî-şîna wan dikişînî?

Vê demê ji dunyayê dengê hate min:

-Hûnandina çarenûsa mirovan destê minda mîna rûnê helandî hêsaye, derd-kulên mirovan, şayî-şîna wana tevî hev bûnê, dijî hev şer rakirinê, xwîn rêtinê, şîpûkên xwezayê qewimînê, paşê gişk ser şîrîta min hatinê raxistinê, ez daha jî bi hêz dibim û şîrîta min qayîm û dirêj dibe!

Dunya, te kurt ya xwe got, ezê jî ya xwe bi kurt bêjime xwendevana. Malbeta meda-dayîka min çîrok- bêjbû, bavê min mesele-metelok qal kirî bû, birên min kilam strayî bûn, xûşka min dilok hizkirî bû. Jinên birên min, govend girtî bûn, van gişkan paşdemîyê qelem dane destê min, ez binivîsim, binitirînim, biefîrînim, dawîyêda bibime nivîskar. Dîya min timê du çîrok me zararan digot. Çîrokek awa destpê dikir:

-Zarno, delalno, hebû, tune bû, pîrek hebû, bizineke wê hebû; hebû, tune bû, kal-pîrek hebû; hebû, tune bû padşahkî gellekî zulmkar hebû...

Ê, dayîkê, dayê, canê, nava van hebûn, tune bûnên teda çi bêjî hebûye! Tu nebê te hê zarotîyêda mera gotibûye, hûnê mezin bin, lê bizanbin xêncî qencîyê, serfinîyazîyê jîyanêda tîbûn, birçîbûn, xizantî, zalimtî, zordestî, berdestî, şer, dewê neheq henin. Bona bikaribî dijî wana şerkî, wana pêpêskî serra derbazbî, Yekîtî, Piştovantî, Heqî, Rastî, Comertî pêwîste. Xût mîna mêrxasên çîrokan.

Çîroka din derbarê gundê meda (yê ku, me nedîtîbû), derbarê der-dorê wêda, ji çîyayê serbilind, serberf, ji kanîyên ava sar, ji çemên ku, şev-ro dikirne leme-lem dikişîyan, ji xerîbîyê, ji rev-bezê qal dikir û kere-ker hêsir dibarand.

Ê, dayîkê, dayê, canê, tu nebê te hê zarotîyêda mera gotî bûye, welatê we heye, mezin bûnê li wê xweyî derên.

Ezê dîsa ji çîroka dîya xwe wera qal kim:

-Lawo, em xwedanê malbeteke mezin bûn. Xanîkî meyî binerd, teng hebû. Êvar-êvarê min cî-nivînê zaran usa rex hev, rex hev datanî, buste erd nedima, min pîyê xwe bavîta. Cî tune bû, min tera hêleşan dagirta. Min rojan tu ser milên xwe, şevan jî rûdiniştim, ser herdu pîyên xwe tu dihejandî.

Xêncî van gotinên wê, duake wê, daxwezeke wê îro jî bîra min daye:

-Lawo, biçûktîyêda xanîyê meyî tengda min nikaribû tera hêleşanê vegirim. Bila Xwedayê Mezin jîyanêda hêleşana te mîna daxweza dilê min vegire, bide hejandinê!

Ê, dayîkê, dayê, canê, Xwedayê Mezin, kaltîya minda, daxweza te du cara anî sêrî! Tu dizanî ew çi bi çibûn? Sala 2005-a bi dewatnamê çûme Kurdistana rengîn. Yek jî meha sibatê, sala 2008-a tevî Nadîr Nadîrov.

Ez û akadêmîkê navdar, na, yê dunê eyan, jîyanêda çend cara rastî hev hatine, ketine tepûşa hev.

Ezê ji wan rasthatina hinekan bi kurt qalkim:

-Ew 4-5 sal bûn, min Bakûyêda, di îdara bi navê "Çapemenîyêda parastina sura dewlet"-ê-da kar dikir.

Ew îdare ya sênzûrayê bû. Li her 15-e komelên Sovêtêda ew îdare hebû û wezîrîya wê li Moskvayê bû. Hemû rêwerz-telîmat me ji wir

distant, mehtîya karkaran jî, ji wir dihate stendinê. Bê mora sênzûrayê ne rojname, ne kovar, ne pirtûk dihatine weşandin, ne bernamên radio-têlêvîzorê dihatine dayînê, belakirinê.

Çawa dibên, dunêdîtina karkarên wê îdarê gellekî fire, bi zanebûn, haj ji çapemenîyên Yekîtiya Sovêtê hebûn û her kesî tab, turîş nedikir li wur karê bike.

Bila bi pesin nîbe, min weke sî salan wê îdarêda kar kir û bûme piştovanê gellekan, kêrî wan hatim. Lema jî ez hinekî haj kar, ulmê Nadîrov hebûm, him jî rind zanibû ew kurde.

Zivistana sala 1975-a bû. Karra girêdayî weke 15-20 rojan ez şandime Moskvayê fêrgehan-kûrsan, xwendinê.

Ez mêvanxana bi navê "Akadêmîya"-yê da dimam. Herro li bûfêta wêda taştê dikir. Li wir her kesî sinî hildida, dor bi dor diçûn xwera xwerin hildidan.

Rojekê ... Ax, çi rojeke xweş û geş bû. Sinî destê min da, dorê sekinîbûm. Min piş yekî bejin bilind gav dida. Pê-pê pey wî diçûm. Nizanim çima nişkêva xiroşekê ez hingavtim. Min dixwest hemû kesê pêşîya xwe wêda devdim, derbazbim, herim. Tu derada jî lez nediketim. Nişkêva ew jî hate dilê min: "Xwezila yê pêşîya min vegere li min binihêre". Çima? Kî zane? Êmê çend deqîqan jî derbaz bû, nizanim çawa bû, ez litimîm, sinîya destê min li wî kesî ket. Ewî zivirî li min mêze kir, qe tiştek ne got. Min enîya wîye fire, dêmê wîyî qemer dît. Xwîna min usa ser wîda kelîya, te qey

digot, ew birê mine, eva çend sale me hev unda kirîye.

Ew kesê pêşîya min çî hilda, çî hilneda ji dorê derket, min jî bi lez-lez hinek xwerin hilda, da pey wî. Li dora her stolê du mirov rûdiniştin. Ez û ew kes dora stolekê rûniştin.

Sebra min nehat û bi rûsî ji wî kesî pirsî:

-Hûn ji kêderêne?

-Ez,-ewî bi rûsîke paqîş got,-ji Alma-Atême, navê min Nadîre.

Ji vî navî dilê min da ber tîra, xwîna deremên min legem dan, ez bûme mirovekî bi coş.

-Biborînin,-min bi bawerîke mezin got,-Nadîr Nadîrov.

-Belê!

Min qe nizanibû, ez çawa ji cîyê xwe rabûm, min çawa ew hemêz kir û ev peyvî anî serzara:

-Hûn kurdin?

-Belê!

-Ez jî, ji Bakûyê, Ahmedê Hepome.

Me careke din hev hemêz kir.

-Kek Ahmed, min navê we bihîstîye, qotar,serpêhatîyên we rojnama "Rya teze"-da xwendîye!

-Min jî navê we bihîstîye, ez zanim, hûn ulumdarin, dîrêktor-serokê însîtûteke ulmîye mezinin, navê we ne ku Yekîtiya Sovêtêda, lê ji wê der bi rûmeteke bilind tê kişandinê.

Em bi her alî hevra bûne nas. Me têtêfon, navnîşê hev nivîsî. Ji wê rojêda ew navnîşan bû ya dostîyê, biratîyê.

Nadîrê Kerem Nadîrov ji jîyana xwe nefîkirinê qewmandinên usa qal kir, her yek mijara serpêhatî, romanên bû. Ewî ew yek jî got, wekî çawa dersxana deha xilaz kirîye, çawa Stalînra name nivîsîye.

Çend rojan şûnda ulumdarê bi hêja vegerî Qazaxstanê, ez hê Moskvayê bûm. Şevê xewnêda Xaliqê Jorîn nuqande dilê min, derbarê nefîkirina me da bedewnivîsarekê binivîsim. Ew mijar roj bi roj, meh bi meh, sal bi sal dilê min, hiş-sewdayê minda hate hilatinê. Ez ketime arşîva jî, rastî gellek evreqa hatim. Evraqên derbarê rasthatina serokê rêspûblîka Azerbaycanê-Baxirov tevî nemir Mûstafa Barzanî leqem, hêz da min, min destpêkir derbarê nefîkirina sala 1937-a nivîsî û ew hat bû romana "Birîn"-ê û sala 1996-a ewê ronahî dît.

Lema jî xwendevanan pirtûk vekirinê rastî van rêzan tê: "Rewayî ulumdarê ulmê kîmyayê, yê duneyî navdar, neftkarê Yekîtîya Rêspûblîkên Sovêtêye Sosîalîstîyê yê bi sîyanet, akadêmîkê Akadêmîya Qazaxstanêyî ulma, akadêmîkê Kurdayî yekem û yê çend dewletên din-Nadîrê Kerem Nadîrov dikim, ji ber ku rîya jîyana wî di nava xelegê salên nefîkirinêra derbaz bûye û gihîştîye hêlanên ulmê bilind, him jî di romanêda kê-m-zêde derheqa wîda bi bedewî tê nitirandinê".

X X X

Rasthatina sala 1991-ê. Derbarê vê rasthatinêda me kê-m-zêde di bîranîna xweye bi navê "Camêr"-da nivîsîye, ya ku pirtûka meye bi navê "Hêsirên xwînê", sala 2002-da hatiye weşandinê.

Ji wê bîranînê çend rêz: "Bahara sala 1991-ê bû. Ez-Ahmedê Hepo û Adîlê Cemal (hevalê ji nehîya Laçînê), ji pêgehîn-stansîya mêtroya ser navê "28 Aprêlê" bi pêlekana hildikişîyane jorê me dicedand derêne dunya ronik"...

"Em ji pêgehîna mêtroyê çend gava dûr ketibûn, yekî parava destên xwe kire milê me, kete nava me herduya û bi kurdîke şîrîn got:

-Peh, hûn çawa rind kurdî xeberdidin. Min qe bawer nedikir Bakûyêda hinek bi kurdî xeberdin. Min vagonêda bihîst hûn çawa kurdî xeber didin, hûn peya bûn , ez jî peya bûm, min got, kabinê ewana kîne"...

Em hevra bûne nas. Em pê hesîyan Gulhuseynê Heso ji Qazaxstanê, ji bajarê Alma-Atê hatiye, wekî dîsêrtasîya ulmê doktorîyê biparêze-xweyîke".

Em wê jî pêhesîyan, wekî akadêmîkê Akadêmîya Qazaxstanêyî ulma Nadîrê Kerem Nadîrov di alîyê ulmda serkarê wîye.

Vê qewmandina ferzra akadêmîk Nadîr Nadîrov hate Bakûyê. Ew hatin bû ya dîrokî, ew hatina wî Azerbaycanêda bû ser bilindaya kurdên li vira. Ulumdarên Azerbaycanêye navdar, yên institûtên Akadêmîyêye ulma, yên înstîtûta neft-kîmyayê ew bi heyte-hol pejirandin. Gulhuseynê Heso jî dîsêrtasîya bi serfinîyazî parast û navê doktorê ulmê kîmyayê stend.

Sala 1992- a.

Destpêbûna meha kanûnê – dêkabrê - sala 1991-ê min ji akadêmîk Nadîr Nadîrov namek û destnivîsara dewetnama bona 60 salîya wî stend. Em pêşta hevra pev ketibûn, wekî wê dewetnamê, ya bi rûsî, minra bişîne ez li Bakûyê di çapxanekêda bidime weşandin. Ew

dewetname bi wêneyê akadêmîk ji 8 rûpêla bû. Hevoka destpêbûna dewetnamêda dihate gotinê:

- Sala 1992-a wê 60 salîya nêftkîmîkekî sereke, ulumdarê navdar di alîyê sîstêma katalîzayê û kîmîya-fîzîkêye têklîyêda, Akadêmîkê Akadêmîya Ulma yê Rêspûblîka Qazaxstana Sovêtêye Sosîalîstîyê, profêssor, doktorê ulmê kîmyayê, laûrêtê xeleta Dewletê, kesayetê kardarê ulmê Rêspûblîka Qazaxstana Sovêtêye Sosîalîstîyê bê derbaz kirinê. Belê, min ew dewetname weke 300 hebî da weşandin û akadêmîkra şand.

4 yanvara sala 1992-a, bi serkarîya min (ez wê demê sedrê Navenda çanda kurd “Ronahî”-yê bûm) 7 kes bona beşterî 60 salîya akadêmîk bin, çûne bajarê Alma-Atê.

6 yanvarê, qesra ku, têda 60 salîya akadêmîk dihate derbazkirinê, çawa dibên, te derzî bavîta erdê ne diket. Xêncî karkarên bersîvdar, yê partîya Komûnîstîyê, ulumdar, nivîskar, helbestvan, rewşenbîrên rêspûblîka Qazaxstanê, bawer bikî ji hemû quncikê Sovêtê, ji welatê wê der, ulumdar, mirovên peya bilind tevgelî wê şayê bibûn.

Ya sereke bona me Kurdên Yekîtiya Sovêta
berê, ew yek serbilindayîke mezin bû, ku kê
derbarê akadêmîkda diaxifî digot:

-Ewledê gelê Kurd!

X X X

Sala 2008-a.

Ev rasthatina min û ya Nadirê Kerem ji hemû
rasthatina cuda û ya taybetî bû. Wezîrîya Çandê,
ya herêma Kurdistanê Fêdêral ji Kurdên Yekîtiya
Sovêta berê akadêmîk, yek jî ez dewatî fêstîvala
helbestvanê gelê kurdî herî mezin Cegerxwîn
kiribû.

Ez du roja berê, nîvê şevê hatime Dûbayê.

Ji meydana weke "nîvdunya"-yê derketime bajar.
Bajarê şewq-şemal bona min bû şeva tarî, ji ber
ku, min erebî nizanibû. Ker-lal sekinî bûm. Lê min
hê li Bakûyê zanibû, wekî mirovekî bi navê kek
Salar wê min pişwaz bike. Ji Kurdistanê hejmara
têlêfona wîye desta dabûne min. Barbirekî ereb
bal min sekinî bû, min derxist hejmara têlêfone,
pênc dollar da wî û bi destê xwe ew da
serwaxtkirinê, ez dixwezim bi vê hejmara têlêfonê
biaxivim. Ewî hejmara têlêfonê berav kir û min kek
Salara axivî, ewî gote min, têlêfonê bide ereb, bila
ew minra bêje tu kuyî û ji cîyê xwe nelive. Ew
hevra axivîn, ereb bi destên xwe ez dame
serwaxtkirinê ji vira tu derada neçe. Min derxist 5
dollar dirêjî erebkîr, lê ewî dirov hilneda, hişt çû.

Deh-panzdeh deqîqa şûnda maşînek pêşberî min sekinî, ji wê zilamekî 30-35 salî peya bû û berbi min hat, bi kurdî got:

-Mamoste Ahmedê Hepo, ser çavara hatî!

Me hev hemêz kir, mîna bira rewşa hev pirsî. Ewî ez birime mala xwe.

Ez pêhesîyam, wekî kek Salar Evdulqadir Samed ji bajarê Hewlêrêye. Rewşenbîrekî gellekî hêjaye, eva çend sale hatîye bajarê Dûbayê û vira firma vekirîye.

Xwendina wîye bilind heye.

Nava du rojanda kek Salar ez bajarê Dûbayê gerandim. Em li wir rastî Konsûlê Herêma Kurdistanê Îmad Mûjûrî hatin. Weke sehetekê me hevra derbarê Kurdistanê Başûr, derbare rewşa wê, derbarê pirsên sîyasîda nêt pevguhastin. Çend gotinên heq derbarê- kek Salar da:

-Kek Salar, bi gorîya min zarok hatinê dunê, mezin bûnê, jîyanêda lap kêr paravedibine ser du beşan. Yek dibe jîyanhîz, teqildarê wê, yek dibe xwehîz, pêpeskirê teqildarîyê, yek her tiştîda bedewîyê digere, yek nava bedewîyêda reşayê digere, yek li her der-doran ronahîyê digere, yek tarîyê, yek dixweze hewar-gazîyê bike mizginî, yek dixweze mizginî bibe hewar- gazî, yek merzelkolê mirovane, yek derdkêşê mirovane,

Salarê bira, tu ji mirovên beşa yekêyî. Kurt, lê bi dil dibêjim:

-Tu jîyanêda timê sorgulîyê digêrî!

Nava wan du rojanda min dît çawa ji her çar beşên Kurdistanê mirov derê te dukutin. Tu kêrî bi dehan mirovan têyî. Ez bûme şehedê wê yekê jî

ku, karmenda bi 10, bi 100 hezar dollar didiane te, wekî tu bona xêra wana biparêzî. Rewşêra girêdayî te hinek ser navê xwe datinî bankê, (bila xwendevan bizanibe, wê yekêda selef tunene), hinek mala xweda xayî dikr. Xwedan dirav derê te vekirinê, te bi dilgermî ew dipejirand, bi dilşayî verê dikir.

Kek Salar, Xwedayê mezin dilekî paqîş, zehmet kişandina hineka daye te! Her bijî, birao!

Kek Salar, bê şik tu weteya navê xwe dizanî. Ez jî bêjim, bila yên nizanin, bizanibin. Salar-bi zaravê soranî serfermedar, serkarê êlêye. Kirinên te û weteya navê te rorobarî hevin.

8 sibatê, şev Nadîr Nadîrov têlêxist, wekî ew hatîye Dûbayê û li mêvanxana binavê "Qesir "-ê cî-war bûye.

Belê, em, du ewledên salên nefîkirinê-Nadîr Nadîrov û Ahmedê Hepo li welatekî-bajarekî xerîb rastî hev hatin. Bajar Dûbay bû, dem, wede 9-ê meha sibatê, sala 2008-a bû.

Kek Salar em bi maşîna xwe anî meydana firindê.-Firînda Dûbay-Kurdistan.

Em, du ewledên salên nefîkirinê, nikî hev rûniştîbûn û difirine mala dîya, dîya xwe Kurdistanê.

Min derbarê vê rêwîtiyêda danîşan dinivîsî ûser wê nêtê bûm diqewime ew paşdemîyê bona me bibe bîranîneke dîrokî.

Ew sehetek bû em difirîyan. Kek Nadîr berbirî min bû:

-Kek Ahmed, ca kerema xwe hevokekê, duda bixûne, ka binê tu çi dinivîsî?

- Akadêmîkê delal, -min bi şîrênayî got, -şukur vê rojêra! Min nivîsiye, wekî em kurd li erdê du kes rastî hev hatinê şadibin, lê îro li erşê ezmîn weke 150-î ewledên kurdan rastî hev hatîye, hemû bi zimanê dê hevra diaxivin, ji vê hetabîyê wêdatir tu hetabî tune. Gişk difirine serek bajarê Kurdistana Aza-Hewlêrê!

Akadêmîk kêf xweş bû û serda zêde kir:

-Welat hebûnê, hetabîyên awa li hev zêde dibin, dibine yên bê jimar. Tu jî dibî yekî xwedan maf!

Wê wêda Akadêmîk kete nava dunya xwe, ez jî ketime nava şîrînaya zimanê dê. Wekî vê demê yekî ji min pirskira:

-Dunêda çi şîrîne?

Minê bikira qîrînî:

-Zimanê dê!

Nava heyîtiya zimanê dêda, ku firindêda di hate bihîstinê, axavtina dayîka min, ya derbarê hêleşanêda kete bîra min; çavên xwe girtin û dilê xwera derbaz kir:

-Dayîkê canê, dayê! Bila ruhê te şabe, îro sewta zimanê te minra dilokan dibêje, firinda welat minra bûye hêleşan!

Te li erdê cî ne didît minra hêleşanê vegirî, lê îro firinda welat, li erşê ezmîn hêleşan vegirtîye, min dihejîne, wekî min çi dîtîye, çi kişandîye, gişkî bîr kim û têkevime xewa şîrîn, lê xewêda jî heşyarbim, ji ber ku, neyarên me li parêzgehada xwe telandîye. dîcedîne firsendê bistîne, tetêke bi sît ewnaxn gilêkî zêdeke; Ne hêmîn be, ne jî kirina neyar bîrke, îdî bese firsendê ji destê xwe

bernede! “Bîrneke firsend ketinê destê neyaran, mirovn jî nel dike”!

Min nizanbû, ez xewêda bûm, nava bîranînada bûm, dengê ez hişyar kirim:

-Rêwîyên birêz! Amedebin, qayîşan bavêjine nav- kêlkên xwe, em digihîjne bajarê Hewlêrê!

Ev jî Hewlêr, ev jî meydana firindê! Min dora xwe nihêrî. Çîyayên mîna refên qulinga peyhev rêzbûyî hatine kivşê, dengê karkarên li medana firindê guhên minda bû kake-kaka qulingan! Nizanim çima min dest ustuyê Akadêmîkra bir, serê xwe danî ser sîngê wî. Êmekî awa em ker-lal sekinîn. Nadîr Nadîrov kêlimî:

-Bira, dîrokêda gel hebûne axa wan bê sero- bin bûye, leşkerên wanî bi hêz hebûye, xwedanê dewleta bi navdar bûye, kawranên wan jî vî serê gerdûnê, çûye serê din, zimanê wan bi sedan ziman kiribûne bin bandora xwe, lê îro ew jî rûbayê dunê hatîye hildanê. Bi sed salan gelê me bona axa xwe, bona dîrok, ziman, erf-edet, bona heyîtiya xwe nehîştîye şûrê destê wî zeng bigire, ber dujmin, neyaran çokvenedaye! Şukurbûna xwe bîne, çîyayên meye serbilind cîyê xwedanin, parezgehên wan, pêşmergeh, gêrîlan timê hişyarin!

Me heta naha wêneyên çîyayên Kurdistanê di kovar, rojnamada dîtibû. Naha em pêşberî wan çîyayên hesret sekinîne. Eva dîroke, çerxa wê rast hatîye badanê! Ca vegere van çîyan mêzeke! Binihêre ewana çiqasî serbilindin! Qe xwedanê van çîyan serberjêr dibe!

Vê gavê xortekî gote me:

-Kek Nadîr, Ahmedê Hepo, derva hîvîya wenin.

Şabûna dunyayê tijî dilê me bû û me meydanêra da gavan, derketine derva.

Derva du kes pêş meva hatibûn. Yek kurê pismamê min Celîlê Tahar, yek avtoajoyê Bêwar Barzanî bû. Wana em anîne mêvanxana bi navê "Çar cira".

Xwedê "Çar cira"-yê şênke.

Derî-dergên wê, hewş-avayê wê bi xemil-xemil bû. Ber şêmîka mêvanxanê wêne-portrêtê helbestvan Cegerxwîn hatibû danînê, fêzê jî bi herfên gir nivîsibûn: "Hûn bixêr hatine fêstîfala helbestvanê Kurdayî mezin- Cegerxwîn".

Em ketinê hundur, tayê yekê bi mirovan kim-kimî bû.

Xanimeke bejin bilind, dêm fire, geş, çavbelek nêzîkî me bû û destê xwe dirêjî akadêmîk kir:

-Hûn bi xêr hatine. Ez nevîya Cegerxwînîm, navê min Silîvaye. Silîva Cegerxwîn.

Em bi dilgermî hatine pejirandinê. Ewê program-bernama fêstîfalê da me û got:

-Biborînin, karê min pir-pire, bona we ode hatine cuda kirinê, mêvan gellekin. Bawerîya we hebe, me tenê bona we herduya ode cuda-cuda kirîye. Herin bila we cî-warkin, êvarê emê dîsa rastî hev bên.

Xortekî rêvebirtîya (admînîstrasîya) mêvanxanê nîşanî me da, li wir nasname jî me

standin, oda 105-a ser navê akadêmîk, ya 211-a ser navê min tînivîsin.

Xizmetkarê-keçika ereb rêvebirî li min kir, derê odê vekir, bi zimanê Kurdî, her tişt minra şirovekir: Derî çawa vekim, çawa bigirim, ronahîyê çawa vêxim, çawa bitemirînim, kêra, kêderêra çawa têlêxim. Odeke şûştî-mûştî, her tişt bi paqîş, dibiriqî.

Xwendevanên delal!

Çima ez awa bi hûr-gilrî dinivîsim. Gava ez ji Kurdistanê vegerîyam; rojekê li şayîkê bûm. Derbarê Kurdistanêda pirs, ser pirsê didane min. Yekî jî, ji nezanîya xwe pirsî:

-Apê Ahmed, qe avayên wanayên rind hene? Dibên, hê ewana malên binerda dijîn!

Evê pirsê ez agirdadayî kirim. Keremkin, binihêrin neyar çiqasî mêjûyên me hinekan xwerîye, bi derewên xweva em pêpes kirine.

Lo kurdo, heşîyarbe! Derbarê çanda xurek petinê, ya kinc xwekirinê, avayî avakirinê, hunermendî, çekbendîyê, karbendîya li Kurdistanê hê berî zayînê ulumdarên dunê elametî dane, nivîsîne. Ew cîranê ku, te bi hesûdî devdide hezekê, gellek tiştî ji kal-bavên te hildaye. Lê îro te dewsa nezana datîne.

Birao, bixûne û bîra xweda xayîke binihêre rojnamevanên naveyan Mîroslav Zîkmûnd û Îrjî Ganzêlka di pirtûka xweye bi navê – “Kurdistan welatê şoreşan, bûyeran û bawerbûnêye” çî nivîsîne: “Kurd hezar cara hatine kuştinê, wekî welatê wanî bedew gulvede, wekî buyer bibine rastî, wekî yên dereke hebûna wana nedizin. Lê

wede hatîye neyê kuştinê, lê bijî. Bijî li Kurdistanê-bona Kurdistanê”.

Odêda ez bernama fêstîvalêra bûme nas: “Programa Fêstîvala şaîrê Mezinê Kurd Cegerxwîn”. (Bi gorîya min bi zaravê kurmancî gotî awa bihata nivîsarê: “Programa Fêstîvala helbestvanê Kurdayî mezin Cegerxwîn”). Bername bi mijarava kim-kimî bû, ew ser roja, panêla û seheta hatibû paravekirinê. Bernamêda navê min jî hebû-Ahmedê Hepo-bandora helbestên Cegerxwîn li ser Kurdên Rûsîyayê. Bernamêda ev jî hebû: “Parvekirina Xelat û Dîyarî”. Dilê minra xêzek, janek derbaz bû. Ev xêz rîya Kurdistanêye dahatîye bi şewq-şemal bû, jan, jana kul-derdên salan bû, ku îro bûye şaya bê tixûb.

Sebira min odêda nehat, daketime tayê jêrîn. Li tayê jêrê, hola mêvanxanê, çawa dibên, behra mirovan bû, hinek ber hevra, hinek kêleka hevra diçûn-dihatîn, hinek ser dîvan, kursyan rûniştibûn, hinek du-du, sisê-sisê sekinîbûn hevra diaxivîn. Hevokên bi kurdî mîna dengê çemê leme-lem guhên mînda dihatine bîhistinê.

Destê gellekada bernama fêstîvalê hebû, hinek hevra dibûne nas. Gava pêhesîyan ez ji ku hatime û kîme, bi bawarîya Xwedê, nava çend deqîqada dora min çît girtin. Ezhelbestvan, nivîskar, ulumdar, lêkolîvan, rewşenbîrên ji her çar beşên Kurdistanê, yên ji welatên Avropayê hatîra bûme nas.

Min xwe pirs da xwe:

-Ev çi roje? Ev xewne?

-Na, ev roj, hafîya, wê rojêye ku, Kawayî Hesinkar rabû bi kirina xweva bingeha salnama gelê Kurd danî û ji wê pêda bona azadarîyê, bona rojên awa, xwîna ewledên gel mîna çemekî gur hey herikî û tu kesî nikarbû bi zor-zordestîyê, bi tirs-xofan, kela-zindana, bi kuştin-qirêbi agir-şewatava ruhê welat hizîyê bitemirîne!

Vira helbesteke helbestvan Cegerxwîn, yê ku îro bi sedan mirov beşterî dora ronahîya efrandarîya wî bûne, kete bîra min.

Du rêz ji helbesta bi navê "Gotina welat":

Ne pir maye kurê min, ey Cegerxwîn,
Hûnê serbest bibin, mizgîn û mizgîn.

Ey helbestvan, fîlosofê dûrdîtî mizgîn, sed car mizgîn, bila ruhê te şabe, me pê avîtiye nava serbestî, azadarîyê.

Vê gavê Silîva Cegarxwîn bi du kesên bejinbilind, namilpen hatin. Hatina wan bû sedemê şayîke mezin. Li vir gellek, usa jî ez herdu kurên Cegerxwîn-Keyo û Azadra bûme nas û wêne kişand.

10 sibatê, sala 2008-a, li Hewlêrê, di hola Pêşewada dest bi ewlekarîya fêstivalê bû. Hola bedewe bilinde bere dirêj çawa dibên, te derzî bavîta, erdê nediket.

Ez û kek Bêcan nikî hev rûniştibûn. Kek Bêcan salên nodî, ya sedsalîya derbaz bûyî, li Bakûyê Ûnîvêrsîtêt-da dixwend. Ewî hemû xwendevanê kurd, yên ji herçar beşên Kurdistanê

beşterî navenda “Ronahî”-yê dikir, alîkarî dikir û ya sereke nava cîwanên cîda ruhê gelhizîyê, welathizîyê gur dikir.

Ji bernama fêstivalê: “Merasîma vekirina fêstivalê. Li Hola Pêşewa demjimêr-10: 30-ê sibehî merasîmên fêstivalê li layê Tîra Mûzîka Duhokê da vekirin”.

Xwendevanên bi rûmet!

Ne ferze wekî ez bi hûr-gilî derbarê ewlekarîyêda binivîsim, lê ewê yekê bînime serzara, wekî her gaveke fêstivalê bi fermî, bi hukumetî, dewletî, bi rizim dihate avîtinê.

Yanzdehê sibatê, panêla êvarê da, 5 kes wê bi axivîyana. Navê min jî nava wanda bû.

Em her pênc peyivdar li dîwanê, jorê rûniştibûn. Çar kesên pêşîya min îdî axavtibûn, dor, dora min bû. Rêvebirê dîwan-civînê gilî da min û ez nêzîkî mîkrefonê bûm, min dixwest dest bi raporta xwekim, ewî gote min:

-Mamoste, hinekî sebir kin.

Hema vê demê du kes nêzîkî rêza holêye pêşîn bûn û mirovên li wir rûniştî ji cî dane rakirinê.

Li rêza pêşîn her tenê du kes man, akadêmîk Nadîr Nadîrov û Wezîrê Rewşenbîr yê hukumeta Herêma Kurdistanê Felekeddîn Kakeyî.

Weşekî şûnda Prêzîdêntê Herêma Kurdistanê maqûl Mesûd Barzanî bi destê mirovan hatin. Ew bi çepikên gurva hate pêşwazkirinê. Prêzîdênt Mesûd Barzanî kêleka Nadîr Nadîrov rûnişt.

Hol seqirî. Min jorda ew ber çavên xwera derbaz kir, dêmên mirovan bi qeş bû, ji çavên wan

nûra nebinîyayî dibarî, min tirê, ronahîyê bitemirînin, her derê wê dîsa bi şewq-şemalbe. Ez şabûm, wekî Prêzîdêntê Kurdistanêyî ewlîn wê bi xwe guh bide min, lê him jî dilê minra tîr ser tîranra derbaz dibû. Min raste-rast li prêzîdênt nihêrî. Ew beşerxweş bû.

Ji şewla dêmên wî, ez ruhdar bûm. Wê weşê rêvebirê civînê şanî da, wekî ez dest bi mijara xwe bikim. Ez jêrê bintara mijara xwe, ya ku min pêşberî 500 mirovî zêdetir, ragîhand, radestî xwendevanên birêz dikim.

**Hewar-gazîya Cegerxwîn
(Bandora helbestên Cegerxwîn ser
Kurdên Rûsiyayê)**

Berî her tiştî ez ne ku, bi dilekî, lê bi hezar dilî we beşterbûyê rêzdar, yên tevgelên civînbilind-fêstîvala ku, herêma Kurdistanê Azada tê derbazkirinê, selam dikim û her yekê wera helandina derdê kişandî dixazim!

Qewmandinên zemîn, ewana xirab bin, yanê qencbin, dîrokê reş-sipî dixemilînin, gel jî ne ku, bi piranîya xweva li gerdûnê tê naskirinê, lê bi kesayet-şexsîyetên ku ji nava wî derketîva tê naskirinê. Dîrok û gel cêwîne. Herêk, qewmandinên dîrokê ewledên gel, yên hişkûr dikarin jîyanêda wana bona kêrhatina qel usa bidine mîyaserkirinê, gişk zendegirtî bibin. Wê demê gel dîlana şayê digire, dost şa dibe, dujmin jî kor dibe. Paşê jî gel wanra dibê: Ewlad! Û

peykelên wan heta-hetayê dilê xweda bilind-bilind, bilind dike ! Xwezila min wî gelî, ewledên wêye zane, dûrdîtî, yên ji paşila gel derketî, pêşewitîyê wê, dikare wededa serederîyê ji qewmandinên qewmî derxe, bi serfinîyazî gel pey xwe bibe û azadarîyê, altindarîyê dest bîne. Şukur Xaliqê jorîn ewledên meye usa ne yek bûne, ne deha bûne û wana dîroka gelê xwe, ya mirovayê sor xemilandine, hela serbarê serda teqil dane ser pêşta çûyîna gulvedana gerdûnê. Lê heyf ne cîye, ne jî wede heye, wekî ez navê her yekî wana bikişînim, ser kirînên wan rawestîm û wana bidime şirovekirinê. Lê ruhê vê bilîndcivnêra gêrêdayî, ezê wê yekê bêjim, wekî destpêbûna sedsalîya XX-da Rebê alemê ewledekî usa da gelê kurd, wekî her ku, ew mezin dibû, pê davîte nava jîyanê, dît, tê derxist çawa gelê wî ji alîyê dujminda tê zêrandinê, lema jî hê cîwantîya xweda, xwe da ser rîya azadarîya gelê xwe û bi mêrxasî, hişkûrî, bi sîyaseta kûr û dûr pêşîya sêlava gur girt, ne hîşt gelê wî di nava avbeza dîrokêda roda here. Ew ewled-Mustafa Barzanî bû!

Lê dîrok ewledên mayîn jî digihîne, yên ku, têdigihîjin, rewşa gel, ya kolera qayîl nabin, dinihêrin pêşewitîyê gel ketîye pêşîyê, dewa rastîyê-heqîyê dike, ew kesê mayîn jî weke hêza xwe dibe piştovan. Ji wan ewleda yek jî Şêxmûs-Cegerxwîn bû. Şabûna here mezin yek jî ew bû, wekî Mustafa Barzanî û Cegerxwîn herdu jî di salekê da hatine dîne.

Çima min navê herdu xweşmêra hevra kişand? Bona nêta xweye jorgotî makkim, ezê

gotineke neyarê gelê kurd, yê herî dev bi xwîn bînime holê. Ez naxwezim navê wî bikişînim, ditirsim devê min herambe. Wî neyarî gotîye, ey gelê min, gava kurdan çek hildan, bona azayê şerkin, qe metirsin, lê gava kurdan him çek hildan, him qelem-pênûs hildan bitirsin.

Pîroz, sed car pîroz, sedsalîya XX-da hetabîyê derê gelê kurd kuta! Şûr û qelem, hêz û sîyaset di dîroka Kurdistanêda ghişte hev. Digewime pirsên, mirovek, dudu çi dikarin bikin? Çawa mînak ezê ser nêtek-gotineke Akadêmîk Şekroyê Mhoyî rehmêtlêbûyî rawestim. Ew dinivîse: "Dîroka hemdunyayêda minakên usaye zelal hene, gava astengên bi çareqûsgiran derdikebine pêşîya gel, netewîyan, ewana beqî keseyet-şexsiyetê rûmet bilind, yê ku, hemû qenderên gel, yê qenc hilçiniye nava xwe û yê ku, herêka pêşta çûyîna gelda weyneyeke mezin listîye, bi serfinîyazî wan pîrsgirêka safî dike. Di sedsalîya XX li Kurdistanê mirovekî awa gênerâl Mustafâ Barzanî bû".

Îro şayî, şaya Cegerxwîne, em gişk beşterî dora ronahîya efrandarîya wî bûne. Pêwîste, gellekî girînge çend gilî-gotina derbarê wê yekêda bêjim, çawa em kurdên Yekîtiya Sovêta berê, bi helbest, bi efrandarîya Cegerxwîn hesîyan.

Salên Yekîtiya Sovêtêda hemû rê-dirb, derî-dîwan ber kurdên sovêtê hatibûne dadanê, ne dihiştin tu kes kurdên Kurdistanêra bêne girêdanê, heleqetîyên wan hebe. Lema jî dikarim bêjim, her tenê salên 60-da, yê sedsalîya derbazbûyîda, kurdên sovêtê pêhesîyan, wekî helbestvanekî

wanî şoreşvan Cegerxwîn heye. Ew agahdarî bi rêke dirêj û diywara derbaz bibû, hatibû gihîştimû camêrekî, ulmdarekî kurdên sovêtê. Cara yekem zanîyar-ulumdarê navdar Qanatê Kurdo pêdihese, wekî helbestvanekî meyî bi navê Cegerxwîn heye. Qanatê Kurdo dinivîse, wekî sala 1947-a (Sankt-Pêtêrbûrgêda) li înstîtûta rohilatzanîyêda ez mijûlî ziman, êtnografîya û edebîyata netewîyê kurd dibûm. Wê institûtêda gellek zanîyarên rûs, yên mezin û navdar dixebitîn... Rojekê ez li sivdera înstîtûtêda rastî profêssor Kraçovskî hatim. Ewî ez dame sekinandinê, devê çentê xwe vekir û kitêbek jê derxist, dirêjî min kir got: "Xortê delal, han ji tera vê kitêbê, dibe hewasa te pêra bê, bi kurdî nivîsiye, Îrannasê navdar Vladîmîr Fêdorovîç Mînorskî ji Londonê şandîye, lê binihêre, bixûne, dibe kêrî te bê". Paşê Kurdoyêv dinivîse ku, ez pêhesîyam û şabûm, wekî şaîrekî me Kurdayî awayî navdar heye.

Wê wêda Kurdoyêv didomîne, wekî ew sala 1953-a diçe Ermenîstanê. Ew, tevî helbestvan, êtnograf Emînê Evdal birîyar dîkin, boşa kurdên sovêtê berevokeke helbestên Cegerxwîn bidine weşandinê. Kurdoyêv dibêje hingê hevalekî me kurd li Komîtêta Navendê Partîya Komûnîstên Ermenîstanêda dixebitî.

Ewana diçine bal wî û meremê xwe wîra dibêjin. Ew kurdê xwedanê kara bilind, milê xwe nade ber wê xwestîna wana û dibêje, ku ez çi zanim Cegerxwîn kîye, diqewime ew dujminê sovêtêye.

Gotineke kal-bavên meda te gotinê: “Zêrê xalis zeng nagire”. Sal derbaz dibin kurdên sovêta berê hêdî-hêdî bi efrandarîya Cegerxwîn dihesin. Sala 1957-a zanîyar Qanatê Kurdo çend helbestên Cegerxwîn di nava gramêra xwe da, dide weşandinê. Wê wêda sala 1959-a, çend rojnamên rêspûblika Azerbaycanê nivîsîn, wekî berevokeke bi navê “Almanaxa edebîyata kurda” ronahî dîtîye. Wê berevok – Almanaxêda ji efrandarîya 9 helbestvan û nivîskarên kurdan bi welgera zimanê Azerbaycanî helbest û çîrok-serhatî hatine weşandinê. Wê almanaxêda du helbestên Cegerxwînê hunermend ronahî dîtibûn. Wan helbestan helbestvan, ulumdar Şamîlê Selîm, ji Qezaya Kurdistana berê, werdigerîne zimanê azerbaycanî. Tîraja wê pirtûkê pênc hezar bû. Hema wê salê nefsdarê civakîyê, nivîskar, dîroknzan Nado Maxmûdov xwendevanên ermenî-filan bi efrandarîya Seyda Cegerxwînê ku, bi agir-alafa netewîyêva dişewite, dike nas.

Dibên dûman nikare timê usa bike, çîyayê bilind neyê kivşê. Neyaran, nexwestîyan çiqasî dicedandin, wekî efrandarîya Cegerxwîn, hewar-gazîya wîye bona azadarîyê, serbestîyê neyê bihîstinê, berga tiştekî negirt. Sala 1953-a “Bolşaya covêtskaya ênsîklopêdîya” (“Ênsîklopêdîya sovêtê, ya mezin”) derbarê gelê kurda, derbarê wêjeya wêye dewlemenda qiniyat dane weşandinê. Navê gellek helbestvanara tevayî, navê ronahîdar Cegerxwîn jîtê kişandinê. Bi nêrînên wan salan, ew yek serbilindaya gelê kurd bû. Bi hezaran mirovên sovêta berê pêhesîyan,

wekî helbestvanekî gelê Kurd heye, yê ku koletîyê qamçî dike û helana dide gelê xwe, wekî rabe bike hewar, gazî û berê xwe bide rizgarîyê, piştî xwe bide yekîtiyê.

Yekîtiya sovêtêda kovara weşana here belabûyî, ew ya bi nave “Drûjba narodov” (“Dostîya gelan”) bû. Sala 1963-a hejmara wêye 12-da gotareke bi fire, ya Rohilatzan-lyîsîan Klîmovîç, ku sala 1959 li Kurdistana Îraqê bûye, hatiye weşandin. Ew gotar ya bi ulmî, bi lêkolîna zanîyarî, hatiye navkirinê “Derbarê kurdan û wêjeya kurdan da” navê gellek helbestvanên kurdanra tevayî, navê Cegerxwîn jî dikişîne û hêjayeke mezîn dide wî. Ew Rohilatzan wê gotarêda dinivîse, wekî ruhdariya helbestvanên Kurdan beqî serkarê azadarê gelê Kurd- Mustafa Barzanîye.

Ew çî ku, me jorê anî serzara gellekî hindik bû, wekî helbestvan, filosofekî mîna Cegerxwîn bi her alî di nava kurdên sovêtêda bahata naskirinê, hezkinê.

Lê çawa mizginîya baharê dûmeqesk tîne, a usa sala 1966-a ulmdarê kardar, Ordîxanê Celîlyê rehmetlêbûyî mizginîya helbestên Cegerxwîn gihande me Kurdên Sovêtê.

Biborînin bona nêta jorgotî bê zelalkirinê, ezê çend hevokan derbarê xweda bêjim. Min sala 1964-a zanîgeh xitim kirî bû. Rêdaksîya rojnama “Rya teze” da dixebitîm. Sala 1965-a pirtûka mine yekemîn, ya bi navê “Adar” hatibû weşandin. Bila bi pesin nîbe nava helbestvan, nivîskar, zanîyar, rewşenbîr û yên mayînda hatibûme naskirinê.

Rojeke bahara, sala 1965-a Ordîxanê Celîl gote min, were mala me. Mala wan him mala mêvana, him mala alîkarê bêkesa, him mal ocaxa çanda kurdan bû. Bavê wan –Casimê Celîl helbestvan, ewled wêjezan, dîrokzan, sazbandzan bûn.

Koraya Ordîxanê Celîl, em pêşberî hev rûniştin. Ewî du cîzûbend (papka) anî danî pêşîya me got:

- Ahmedê bira, ez zanim te navê helbestvanê meyî naveyan Cegerxwîn ne ku, bihîstîye, him çend helbestên wî xwendîye. Ev du dîwanê wîne, min ji wan karpêka, çawa dibên, destê gul-helbest bijartîye, ji elîfba latîniya Kurdî, guhastîye elîfba kurdî, ya krîlî, (Yekîtiya Sovêtêda tenê bi krîlî dahate nivîsarê), wêra tevayî min pêşxeberek û derbarê emir-jîyana wîda nivîsîye, derheqa hêjandina helbestên wîda bi zanîyarî lêkolîn kirîye; wekî ev pirtûk bê weşandinê, bizanbe ew bona gel xizmetkarîke mezine. Hivî dikim rastkarîyê (korêktorîyê) li pirtûkê bike. Nivîskar Wezîrê Eşo jî rêdaktorê wêye.

Em hevra pevketin, qayîlbûn. Ulumdarê hêja serda zedekir:

- Gotî em zûtîrekê destnivîsarê bişînine çapxanê. Rind bizanbe Cegerxwîn ji wan şaîrane, yên ku timê tevî cmaetêne, wêra şadibe, wêra distirê û wêra jî tevayî ser birînê millet dikewgire. Navê kitêbê jî min danîye “Poêzîa Cegerxwîne bajarvanîê”.

Belê, min destnivîsara ulumdar, dost, birayê delal hilda, rûpûlê yekê nihêrî qatkir, rûpêlê duda

nihêrî, lê qat nekir û helbesta "Kurdistanîm ka"
xwend. Ez dubare nalîyam, kalîyam, mîna
qelînekan sêlêda qelîyam, mîna zaroka sêwî, yê
ber dîwer kire îske-îsk.

Rêzdarî, çil du sal ji wê rojê derbaz bûye,
gava min cara yekem helbesta "Kurdistanîm ka"
xwendîye. Ez sedî sed bawerim îro ruhê
Cegerxwînê hizkirî ser serê me digere, lema jî
karnîyarî ruhê wîyî paqîş dibim:

- Ey Seyda, ew Kurdisdana ku, bibû
daxweza te, îro beqî xuluqdarê xuluqdara Mustafa
Barzanî û beqî warhêşînê wî, beqî peyhatîyê wî
rizgare. Lê wê demê helbesta "Em û gur"
xwendinê min careke mayîn xwera zelal kir, wekî
yekîtiya me tune, him jî mesele- metelokeke ku,
car-cara dîya min digot, kete bîra min:

Min got, te got,

Golikê çêlek dot.

Îro çêlekê em bi xwe didoşin.

Bi kurt kurmancî bêjim, em çar meha di
çapxanê da çerçirîn û ew pirtûka ku, bû neynûka,
her kurdekî, ew xwendinê, xwe wîrda didît, bi
hezar hebî hate weşandin.

Pey ronahî dîtina wê pirtûkêra helbestên
Cegerxwîn bilq da xwîna her kurdekî Sovêta berê,
nava ruh-sewdayê wanda welathizî, daxweza
azadarîyê, serbestîyê, rizgarîyê da zêdekirinê.

Radîoya Ermenîstanêye bi Kurdî zû-zû
helbestên Cegerxwîn dida.

XXX

- Gava efrandar dikare ji dilê gel biefrîne, binitirîne, têkeve nava rewşa heyî, ew dibe hunermendekî nemir!

XXX

Donzdê sibatê civîn hate domandin, panêla êvarêda, seheta 16⁰⁰, destbi ewlekarîya parevekirina xelat û dîyarîye bû. Biryar hatibû pejirandinê, wekî xelatê bidine wan kesa yên ku, raporên wan bi wete, bi lêkolîn-ulmî bûn. Her kesê ropor dayî şayîşa wê yekê dikişand, gelo kê layîqî xelatê bibe? Dîsa ez kek Bêcan nikî hev rûnîştibûn.

- Mamoste-ewî gote min, -qe nerehet nebe, ez û bawerim, wê esse xelatê bidine te jî.

Pey navê du kesara, navê min jî hate kişandin. Naha ez dijarîyê dikişînim derbarê wan deqîqada, wê şabûneda binivîsim, binitrînim. Her ew bêjim kek Bêcan niçande min, herim xelatê bigirim.

Xelat 10 karpêk-berhemên Cegerxwin bû ku, "Avêsta"- yê wesandibû, bustê helbestvan, yek jî portfêlekî giran-hêja bû.

Hebûna jîyana 70 salên min, ew xezina ji 10 pirtûkên helbestvanê şoreşvane.

Her rojê fêstivalê ser me tevgelanran bi tivdîr, bi ewlekarîyên kim-kimîva derbaz dibû xêncî civînen fêstivalê danekê çend avtobûs tijî em birine parlamêta Kurdistanê, rasthatîna li wezîrîya çandê, cuda tevî serokê bajarê Hewlêrê û yên

mayîn em heyir-hejmeke hîştin û her yekê me di hundurê xwe da heyîtiya Welat, mafparastina niştewaran, rojên dahatiye şewq şemal derz dikir û baweriya xweye miqîm rêvebirên Kurdistanê Aza dihanî.

Roja, 14-ê sibatê, sala 2008-a, bona me tevgelên festîvalê, bû rojêke evra, ya dîrokî. Wê rojê, pey taştêra, du avtobûs ber mêvanxana "çar çira"-yê sekinibûn. Tevgelên festîvalê rê nedidane hev, bawer nedikirin, wê avtobûsan sîyarbin, ji ber ku, rîya wan hetanî zîyare tatîrba nemir Mustafa Barzanî bû.

Hêweke xweş bû. Baranê hûrik-hûrik direşand. Ne ger bû, ne sar. Hênîkayî bû. Mirov soqaq, kuçaranra kimlî-kimlî dimeşyan. Min tê derxist, çawa mirovên Rûsîyayê sê, çar, pênc mehên zivistanê ser xwera derbaz kirinê, derketinê baharê şadibin, bineliyên Kurdistanê jî çend mehên germ parava hîştibûn, vê meha bona me zivistanê, bona wan meha baharêra şa dibûn.

Em ji Hewlêra hên, ji ya nûhdem derketin, ketine nava rîyên kemberên çîyan. Dûrva te li wan çîyayên koloz bilind mêze kirinê, tu dema nedihate hişê te diqewime nava wanra rê derbaz dibe. Lê her ku, berbi çîyan diçûyî rîyên mîna kefên destan tu zendegirtî dihîştî. Rêbarî, şênaya der-doran beraya rîyara dihate kivşê.

Rêbero, rêkaşo, malî ava!

Nişkêva dilê minra ev yek derbaz bû: Neyar van rîyaran çûnê wê xwe-xwera bêje:

- Xwedanê van rîya di ser meranin! Me îdî daye der! Ax, wex, xwezila ev çîyana tunebûna,

meyê kurd di nava roj danekêda ji rûbayê dunê bida hildanê!

- Neyaro, mixeneto, rind bizanbe, kurd û çîyan cêwîne! Bi hezar-hezr salan wana hev parastîye, wê ji vir pêda jî hevra bibine kelemên ber çavên xêrne-xwezan!

Ew êpêce wede bû, em deve-devî şemê Rêzanêra dişûn. çemê ku, nava du çîyara şîrînê û Pîrîsêra şev-ro dikire leme-lem dikişîya gundên rêzên çîya kuribû du para. Gundek li vî alî, gundek wî alîye, ewana bi pirên ecêbva hevra hatine girêdanê.

Em gihîştine mentîqa Barzana, gundê Rêzanê, fêzê gundê Dorê, wê wêda Barzane. Li gundê Rêzanê hê dûrva avayîkî bilind, yê ku, bane wî bi tenik-şîfîrê sipî hatîye wer girtin, tê kivşê. Ew avayî yê Taharê Celoye. Alîyê dê da pismamê mine. Tahare Celo bi malbeta xweva çawa hatîye derketîye vira, ew mijareke cuda, dirêje. Derbarê wê yekê da bîranîna bi navê "Rêwîyê bi mal"-da tê nivîsarê.

Em gihîstne cîyê-cî, cîyê bi zîyaret. Hinekî dût avtobûs rawestîyan. Ji naye tevgelên fêstivalê gultaceke bi dilê her kesî hatibû amede kirinê. Pêşnîyar hate pejirandînê, wekî akadêmîk Nadirê Kerem û ez wê gultacê hildin û bînin dayne ser tirba nemir Mustafa Barzanî.

Ew didema ser tirba nemirt hewcîyî pirtûk nivîsarekêye.

Gava em pašta vegerîn bi hîvîkirina min, herdu avtobûsê tevgelê fêstivalê derê mala Taharê Celo sekinin. Gişk peya bûn. Nûnerê

fêstivalê ketine xemxurîya vê mal-malbetê, rewşa wêra bûne nas...

Pêşberî gişka min pirseke ava da Taharê Celo:

- Tu ji welatê Sovêta berê ji Ûzbêkstyanê hatîyî Kurdistanê û vî gundîda cî-war bûyî, poşman nînî?

Tahar pêşîyê li çîyayên dora gund nihêrî, paşê çeme bintara malê ber çavên xwera derbaz kir û bi şabûn got:

- Cara yekem, ez heyrana Kurdistanê rengîbim. Ya duda, ji erdê, hetanî erşê ezmin ez ne poşmanim. Vira bûme xwedanê mal-hal, ew cîyê xweda. Ezê minakekê bikişînim, bila yên ji Kurdistanê dûr, usa jî hemû kurdên Sovêta berê xwera hafîyê derxin.

Ez bavê sê keçikan û du kurame. Herdu keçîkê min li vira cûne mer. Van rojan êzê kurê xweyî mezin bi zewcînim. Bûka min û zavên min ewledên Kurdistanêne. Bona mîn şabûna here mezin ewe, wekî min endamên malbeta xwe ji nexweşîya assîmliyasîyê xilaz kirîye. Mirîn emrê Xwedêye. Min dunîya xwe guhastinê, ezê bizan bim ev mirovên van gundan û ev çîyana wê bibine piştovanê ewledên min.

Îdî dereng bû em berbi Hemler rêkesin

Mala mêran

Mala zêran xirab dibe,
Mala mêran xirab nabe.

Mala mêr lê,
Kaniya zêr lê.

12 S. 2008, 4m mûnerêutevgele fesfivalê du
avtobûstijî çûne ziyarete mezelê ne min Mustafa
Bazmî.



Xweş gotine, kûr gotine, dûr gotine.

Mal-malbeta, ku me berê xwe dayê li gundê
Kamalîyê, nehîya Laçînê dima, dijîya.

Laçîn... Kî çawa wetaya navê Laçînê şirovedike,
bila şiroveke, lê hê biçûktîyêda ez bûme şehed,
wekî xortê bi bejin-bal, namilpen, enîfire,
kever, çavbelekra digotin:

-Xwedê xweyîke, çi xortekî laçîne!

Him bejin bilindayî, him enî firetî, him namil pentî, him çav belektî, him dêm nûranî bi tomerî bedewtî-Laçine. Him bedewa çîyayên bilinde koloz bi berf, him zinarên bêhîd, him şkevtên bi ecêb, him daristanên sixte, him gelî, newelên kûr, him kanîyên leme-lem, him çemên xuşe-xuş, him avên belekîyan, him xişte-xiştâ nêrî û mike-mika xezal û kar-bizinên kûvî, him bîn-buxsa paqış, him kulîlkên bîngulav, him pincarên bi hezar tem-lem, bi kurt hemû nexş-nîgarên xwezayê, hebûna wêye ser erdê û bin erdê, sertaça nehîyên çîya Laçine.

Piştovana nehîyên aranê, cîyê zozanên wan, dergê di nava Azerbaycan û Ermenîstanê-Laçine.

Dayîneke xwezaya Laçinê, dîdemeke bi hezar û yek rengîva, ya nava çarmedora çîyada cî-war bûyî ew Gola Reş.

Her ku tu nêzîkî wê bûnê ew mîna şeq-şemalekê diçirûse, bedewîya wêye bêhinber davêje derdoran. Tu ser wêra sekinînê, mîna neynûkekê wêneyê xwe têda dibînî. Te kulma xwe tijî av kirinê, vexwerinê tê derdixî destên te ditevizin, bedena te diqerime. Paşê hêdî-hêdî xwîn hundurê teda dikele, tamar-deremên tera ew çerx dide, dibeze.

Wekî tu çend rojan bêyî serhev-serhev dest, pî, serçavên xwe bi ava wê bişoyî, tuyê binihêrî qerçimekên dest û rûyên te minê bûne, sorayî hatîye dêmên te, pîyên te çîlqerqaşin.

Lê ser ecêbekê metel dimînî.

Ya Rebbî! Çima navê vê sînîya xwezayêye zêrînra Gola Reş gotine? Rehme li tirba bav-pîrabe, tê kivşê wana badilhewa gilîyê Reş

neanîne holê. Bona Gola Reş ji çîka çavan bê parastinê, bona dujmin çav nevêje, çav bernede vê xêlîya serê çîya, qesdbende mîna morîya çavan gilîyê reş pêkaniye. Kar-xebata minra girêdayî ez bi fermî li hemû nehîyên rêspûblîka Azerbaycanê diqesidîm, wê rêzêda li Laçînê.

Bona min Laçin pirr-pirr balkêş bû.

Min ji evraqa zanîbû, wekî 21 îyûlê sala 1923-a bi fermî di civîna Serwêrîya Navenda Komîteya Qedenkar ya Azerbaycanêda tê birîyar kirinê: "Li aqara, ku kurd lê dijîn, Qeza Kurdistanê bê damezirandinê".

Laçin jî navenda wê Qezayê bû. Min ew jî zanibû, wekî sala 1930-î 15 qezayên ku, Azerbaycanêda hebûn, gişk, usa jî Qeza Kurdistanê hate dirix kirinê. Dewsa qezan nehîyên cuda-cuda hatine saz kirinê. Yek jî nehîya Laçînê. Li wir rojnameya nehîyê pêşîyê bi navê "Şûra Kurdistanî", ("Kurdistana şûrayê"), 1936-1937, paşê, hetanî sala 1962, bi navê, "Sovêt Kurdistanî" ("Kurdistana Sovêtê") tê weşandinê.

Wedekî dirêj, bi dilekî êş-jan ketime pey rêç, saffikirina û menîya betal kirin, dirix kirina van destanînên dîrokî. Sê sedem, sê menî derketine holê. Du sedem ji alîyê hukumeta jorînda. Yek bi vekirî, yek bi veşartî. Ya vekirî, ew bû, wekî Kelbecer, Kûbatlî, Zengîlan çend km dûrî hevin, binelî bona pirseke biçûk-mezin nikarin bîn, herine navendê-Laçînê. Ya veşartî ew sîyaseta ermenîyan, ya dûr dîtî bû. Sîyasetzanên ermenîya ne dixwestin li ber pozên wan, li Qerebaxa Çîya, qeza Kurdistanê hebe. Ewê paşdemîyê nehêle

Xwemuxterîya ermenîyan di jîyanêda serbest gava bavêje, ew tevî Ermenistanêbe. Ermenîya bi destî Moskvayê, beqî piştovanên xweye li wir ya xwe kirin.

Ya sisîya-seqebendek.

Dîroka meye bi hêz, ya birêz, ya ku bona şerkarîya azayê, serbestîyê, ya ku hey xwestîye zincîra koletîyê hûrxweşke, bi rûpêlên geveze qencva kim-kimîye. Lê gotî bekeqomsîyên me, yên mîna Bekoyên Ewanî, li cî-cîya neyektîya me, çastîya hinekan, cudatîya ola me û sîyaseta meye nerm, merd ku timê derbên giran gîhandîye welathizîyê, dîrokê, çanda me, neyê bîrkinê. Sîyaseta meye nerm, merd ew çi bi çîye?

Me di dîrokêda dijî dujmin sîyaseta nerm domandîye û gellek cara merdtî kirîye. Lo, lo! Pêşikaro, sîyaseta nerm, merdtî nabe. Ew ne mêvandariye, kî berê xwe bide te, tu rabî merdtîyê, comertîyê, bawerîyê bikî, paşê jî ew kes rabe bi dujmintayî, neyarî te bixapîne. Wekî di vî alîda her tim gotinekê gel bîr nekî, tuyê bigihîjî merem, xwestina xwe:

Rê dibe buhust,
Neyar nabe durust.

Pêwîste di hemû avbeza dîrokêda dijî van kêmasîyên bi bobelet şerkarîya tomerî bê kirinê û neyê bîrkinê, wekî hetanî ew yekana bi carekêva neyêne binax kirinê, gelê kurd wê negihîje azadarîya xwe.

Yekê jî bêjin:

-Azayî bê sîyaset, bê şûr, bê yekîti tu dema çareser nabe!

Bona van stunên ku, nahêlin welat hilweşê, bindestbe xwîna rêti tu dema badihhewa naçe.

...Sala 1975-a. Meha gulanê bû. Hetanî wê salê ez çendî-çend cara bi fermî çûbûbe Laçînê. Lê wê salê ez û rewşenbîrê kurd, welathiz Adîlê Cemal ji Bakûyê derketin û me bona çend merema berê xwe da Laçînê.

Bona min ji Bakûyê hetanî Laçînê dunyak bû, ji navenda Laçînê wêdatir dunyak bû. Adîlê Cemal nasiya min dida her kevir-kuçikê rê, derheqa rewşa xwezayêda, derheqa her gundê em sera derbaz dibûn, derheqa yên mayînda bi lewz, zaravekî şîrîn qal dikir, dicedand weteya navê gund rêza şiroveke.

Ewî navê gundan dikişand, ew dûr û nêzîkva nîşan dida, pirs dida, xwe jî bersîv serhevda dianî:

-Ew gundê hanê Mîrîke.

-Zanî Mîrîk çîye?

-Kî zane diqewime di kûraya dîrokêda vira mirtî, axatî kiribûne.

-Ew gundê hanê Bozlûye.

-Boz rengê erdê, yê vekirîye, gewire. Boz him jî

beyare. Beyar jî bilindayî, gire.

-Ew gundê hanê Kalaça-Qeleçeye, weteya wê Parêzgehe.

-Ew gundê hanê Ehmedlîye. Helbestvanê naveyan Husêyîn Kurdoxlû, yê ku, ji efrandarîya

helbestvanê navdar Abdulla Goran dîsêrtasîya parastîye, ji vî gundîye.

-Ew gundê hanê Mînkende. Berê jî, naha jî, gundekî mezine, weke hezar mal-malbet lê hatîye cî-warkirinê.

Li vira Adîlê Cemal xwe ker kir. Te qey digot, navên gunda dike bîra xwe, êmekî şûnda dumayîn da axaftina xwe:

-Vira du gelî rastênhevin. Gelîyê din alîyê rastêye. Girkên çîya nahêlin ew gelî ji vir bê kivşê. Wira jî rêzên gundan hene. Ezê navê yekê, duda bikişînim.

-Li wî gelîda gundek heye jêra dibêjin-Zêrtî.

-Zanî Zêrtî çîye?

-Zêrtî ji du peyvînaye. Zêr û tî. Tî bi zaravê me gunde.

-Li wî gelîda gundek heye jêra dibêjin-Şêlanî.

-Zanî Şêlanî çîye?

-Şêlanî-şîlanî. Bintara wî gundî ewqas strîyên şîlana hene, mîna daristanekîye.

Hogirê min dîsa xwe ker kir û min têderxist, ew dixweze ez bi xwe ji navê van gunda xwera hafîyê derxim.

Min tirê per-baskên min hene û ez li erşê ezmînîm difirim û jorda rîya xaro-maroya bi xişil-mişil, kerîyên li berojan, garanên fêza gundan, mij-dûmana serê çîyan, mirovên bi karên cuda-cudava giro bûyî mêze dikim

û guhê min ser xire-xira dengê maşînê, wîte-wîta teyr-tûya, hole-hola şivan, gavan, berxvana û ser miqamên ku bi bilûr, fîqan tê lêdanêye.

Çawa çîrokada dibêjin, ez nizamim me pirr rê qedandibû, yanê hindik, nişkêva dengê Adîlê Cemal li min tesele bû:

-Eva gundê bav-pîrên meye. Naha rind mêzeke, binê qe gundê awaye şên-bedew hene?

Min wê gavê têdernexist ew şanîya çi dike, ya rewşa gund, yanê ya xwezayê? Demekê şûnda min ew yek derz kir, wekî hewa daqortîra tevayî, kezev—pişkên min fire dibin, bîna min tê ber min.

-Kek Ahmed,-hogirê min Adîl got,-tuyê çend roja li vî gundî bimînî. Gava ewir sayî bûnê, şevêkê nîvê şevê derê derva. Li erşê gundê me mêzeke, tuyê hewbizanibî stêrkên gerdûnê gişk li ser gundê me civîne.

-Bira,-min gote wî,-ezê şevêkê gotina te bikim.

Min der-dor mêze fikir. Mêrg, çîman, govek-govek kulîlkên reng bi reng ber çavên minra derbaz dibûn.

Te hew dizanibû hebûna xwezayê bûye çarmedoreke bilind nehêlê ez rewşa gund binihêrim. Gund gundê Kamalîyê bû. Berê jêra gotine Pûl.

Ez çend roja li wî gundî mam. Çawa dibên, min li ber tendûr û sêla gellek malbeta nan-xoyê xwer. Dor destexana gellekan mêvandarî hate dayînê. Ji wan malbeta yek jî ya Muzefferê Memmed bû.

Min derbarê vê malbetêda gellek tişt û qewmandinên hewaskar bihîstibû. Ev dundandî, malbet ne ku tenê gund, da lê di navberîyêda hatîye hêjmirandin yeke nandar,

comerd. Bê werimandin dikarim bêjim, ku rîdan sipîyên vî gundî gellek cara jî vê malbetê derketine. Ev kevneşopîyan îro jî didomin.

Derbarê vê malbetêda min qewmandineke nebinîyayî jî bihîstibû.

Pey mêvandarîyêra, odêda ez û Muzefferê Memmed man. Carna dipirsin, ava kanîya dera hanê şîrîne, yanê şore? Ya qenc ewe, tu bi xwe ji wê çavkanîyê avê vexwuyî.

Bi vê nêtê min berê xwe da Muzefferê Memmed:

-Kek Muzeffer,-min got,-çi qencî, navdarîyên ku, derbarê mal-malbeta we da qal dikirin, nava van çend rojanda min hinek bi çavên xwe dîtin, bi guhên xwe bihîstin. Lê pirseke mine ferz heye, dibe ez wê pirsê bidime te, tu jî weke heqîya Xwedê, weke navê vê malbetê bersîva min bidî, ne kêmkê, ne zêdeke. Diqewime dahatîyêda bîranînekê binivîsim. Keko, gava bîranîn çawa heye sipî-sipî, reş-reş tê nivîsarê, ew dibe rûpêlekî erf-edet û carna jî dibe dîrok.

Ewî bi çavên xweye girva êmê çend çirikan ez mêze kirim. Min usa tê derxist, gotinên min him xweşa wî hatin, him nehatin. Nizanim çima? Ew jî diqewimî ez neheq şikber bibûm.

-Kek Ahmed,-camêrê Muzeffer,- dest bi axaftina xwe kir,-hingî tu li gundê meyi, dinihêrim tu bal dikişînî ser erf-edet, ser rabûn-rûniştandinê. Kal, pîranra diaxivî, ji wan mesele-metelokan, têderxistinokan,gilî-gotina dipirsî, paşê jî kere-ker dinivîsî. Ev yek tişteki pirr-pirr xweşe. Ez jî

bûyereke kalkê kalikên me tera bêjim û paşê bersîva te bidim.

-Keremke, keko.

-Go, rojekê mirovrk ber zîyaretekêra derbaz dibe. Disekine û berê xwe dide wê, dibêje:

-Lê, zîyaretê, min ewqas cara bi derew sere te sond xwerîye, her Xwedê dizane.

Zîyaret jî dibêje:

-Lo, bêhişo, min jî ewqas caran zîyan gîhandîye mal-halê te, lê tu hêjî bi xwe nehesîyayî.

Ev mesele ji pêşîyên me, mera çawa şîret maye. Em zû-zû sond naxwin. Bona yê pêşberî xwe bidine bawerkirinê, em dibêjin:

- Bi sonda mêrê çê!

Ew kes bawerke jî, bawer neke jî, sonda me ewe. Me bi nêrînên kûrva hev mêze kir.

Vê cirikê kevanîya malê, jina kek Muzeffer-Zerxar xanimê mera çay anî û got:

-Çaya cetlîyêye.

-Rehme li dê-bavê tebe,-malxweyê malê got,-mala me tu dema bê mêvan nebûye. Lê Ahmedê Hepo ji wan mêvanayê ku, qelem dêstdaye hey dinivîse, usa bike paşê em nekebine bin qelema wîye reş.

Zerxar xanimê qe tiştek ne got, şerma serê xwe kire ber xwe, ji odê derket. Zerxar xanima dîya 8 zaran hêjî mîna bûkeke ber perdê şerm fikir, mêvanara bi axive. Ji rûyê wê gul-nûr dibarî. Hingî ez mala wanda dimam min ew yek rind tê derxistibû, kincên li bejina wêye nivçe timê paqîş bûn, him jî bîna kulîlkan jê dihatin. Paşê ez hînbûm, ewa kulîlkan der-dorê gund berav dike,

çawa dibên, xwera gulavê çêdike. Digotin, salê 12 meha bîna kulîlkan ji bejina wê tê. Tema xurekê destên wê demeke dirêj ji devê mirovan naçe. Hinekî şûnda kek Muzeffer dumayîn da axavtina xwe:

- Malxweya mala min ji ocaxeke bi nav denge. Malbavanê wê mêmên bi nav-deng bûne. Bavê wê Îmamkûlî rastî jî mêmekî çêbû, piştovanê belengaz û xizana bû. Dîya wê Gulgez jî jineke hildayî, dayîn bû, him jî bedewa ser bedewara bû. Ez her wext şukurbûna xwe tînim, wekî bûme zavê vê malbetê.

Ewî xwe ker kir, min jî deng ne kir. Seqirîyê em kirine nava xwe.

Muzefferê camêr carekê-duda li rûyê min nihêrî dixwest bêje:

-Keremke, pirsî xwe bide.

Min berxweda got:

-Min dixwest te derbarê dujintîya bavê xwe da qal kira.

Lê sere sêrîda bêjim ez dijî dujintîyême.

-Mêvanê delal,-Muzefferê camêr got,-yeqîn tera gotine ew pirs çawa bûye,lê te jî bawer nekirîye?

-Belê!

-Belêya te şîrînbê! Ezê wê qewmandinê çawa bûye usa bêjim, tu jî binivîse. Binivîse, bila bizanbin, dunê bi kirinên qencva şêne!

Navê bavê min Memo bû, jêra Memmed digotin. Ew keçika êlêye here bedew distîne. Perî perîya rast bû. Ewana çend salan tev hev dijîn, lê zarên wan nabin. Perî rind dizane di rûyê wêda

zar nabe. Ewê jî dizane, wekî Memmed wê gellekî hiz dike, ew gura tu kesî nake û naxweze wêya berde, yanê jî hêwîyê bîne ser wê. Lê Perî gellekî ber xwe dikebe. Ewa rîya ji rîya dijbêre, çawa bike, wekî yekî mîna Memmed bê ewlad nemîne.

Rojekê Perî diçe mala xalê xwe û dibêje:

-Xalo, ez vê carê çawa xazginî hatime mala te.

Xal pê dikene û jê dipirse:

-Çi xazginî?

-Xalo, bi min nekene, ez hatime keçika te Dune mêrê xwera bixwezim, bila ewa bibe hêwîya min! Xalo, ewê bibe xanima malê! Wekî ewa bêje min, lêlê, minra carîyê bike, ezê bikim.

Kurt bêjim ewa xalê xwe razî dike, Dune jî tîne rê, paşê tê pirsê mêrê xwe Memmedra dibêje, wî zorê dide qayîlkirinê. Ew pirs tê serê xwe. Wanra 5 kur, du keçik dibin.

Lê pirsê here balkêş ewe, wekî carna malekêda du xûşk hevra rênacin; rehma Xwedê li wanbe, hetanî roja qîyametê wana hevra gilîyê tel ne gotine.

-Belê, him dîya min hebû, him dêmarîya min. Lê em zar her ku, mezin dibûn, me ji Perîyê daha gellekî hez dikir. Lê ewê jî bizanbe, şîrê dayîkê, huba dayîkê bit u heyîtiyêva nayê guhastinê.

Gava ez mêvanê wê mal-malbata rengîn bûm, bi gellek pirsan hesîyam. Hate zanînê nuxurîyê vê malbetê Dostelî, birê wî Fexreddîn li Bakûyê dixûnîn. Hê wê demê hate dilê min derbarê wê rêwîtiyêda, derbarê malbeta camêrê

Muzefferda bîranînekê binivîsim. Min ew nêta xwe li gundê Kamallîyê Adîlê Cemal da hesandinê.

-Kek Ahmed,-ewî gote min,- Xwedê bila wê nêta te bîne sêrî. şeva ku, sibê emê vegeŕiyana Bakûyê, ez dîsa mêvanê malbavê Adîlê Cemal bum. Êvarda ewî gote min:

- Em hatinê gund ro li me dagerîya bû, çend rojin şeva gundê me bi sayî derbaz dibe, yeke emê sibê herin, were destê berbangê ji gund derên, ka binê sibe çawa li me ron dibe!

Em hevra pev ketin. Wê şevê ez Adîlê Cemal qe ranezan. Çawa çîrokada dibêjin, herek me hespekî bi bask sîyar bibûn, diçûne wî serê dunê, dahatine vî serê dunê. Derd-kulên me kurd, Kurdistan bû.

Adîlê Cemal mirovekî peyvîn xweş bû. Ewî dikaribû qewmandineke biçûk, usa hevbîne, mirov ker-lal guh dida wî. Ewî ji dîroka Qeza Kurdistanê, girt çû derkete pêşta hatina cejna Newroz, her serhildan, şoreşek ta-derzîyêra kir û bi kesereke kûr anî serzara:

-Xwezila qe na, rojekê em bikarbin li Azerbaycanê bi kurdî rojnamekê bidine weşandin!

Min dixwest bersîva wî bidim, vê weşê dengê avtoya ku, wê em hetanî Laçînê bibira hate bihîstinê.

-Ahmedê bira,- kek Adîl got,- rabe, rabe em rêkebin, ka binihêrin ji şeverêşê çawa derdikebine ronahîyê!

Em ji gund çend km-ra dûr ketibûn, hogirê minî rêwîyê rê maşîn da sekinandinê.

Em ji maşînê peya bûn. Wê deqîqê hêweke bi ecêb nava bedena minra derbaz bû, te tirê ez serma dikim.

Adîlê Cemal berê xwe da min:

-Ca steyrkê ser gundê me mêzeke.

Min nihêrî ewqas steyrk li ser gund têne kivşê, te hew dizanibû ewana daliqîne ser her malekê. Ya ne bawerkirî ew bû, wekî stêrk mîna govend-dîlana me hevra ketibûne reqasê. Min êpêcekî ew mêze kirin.

Adîlê Cemal niçande min:

-Îro çend roja min dixwest wê ecêba xwezaya van çîyayên me, yên erşên ezmîn tu bibînî! Te dît dunêda çi hene. Ez dinihêrim tu serma dikî, maşînê sîyarbe, em herin, lê rind bizanbe li erşê ezmîn govenda me hatiye girtinê, naqewime li erdê ewa bi destî neyar, dujminê me timê bê teribandinê. Rojekê bê, govenda meyê usa bê girtinê, emê nehêlin telaqreş têkebîne dîlana me, emê careke mayîn neyêne xapandinê. Desta wanê negihîje wê bilindayê.

-Lo bira, tu xût mîna helbestvanekî dilbirîn diaxivî.

-Belê, ez dilbirînim. Naha bêle helbesteke xweye kurt bêjim û em rêkebin.

Çima bindestin

Mad, kardox kurdin,

Mêrxas û merdin...

Qurefî berdin

Çima bindestin?

Derdê me giran,
Welat bû talan
Serbestî-derman...
Çima bindestin?

Xebathiz, karkar,
Şoreşvan, şerkar,
Gellekin serkar,
Çima bindestin?

Hevra şer kirin,
Nan, av jehr kirin,
Em hev nagirin-
Lema bindestin.

Li ser wê axa helal qe nedihate hişê me 15-
16 salê derbazbin, hejê Yekîtîya Sovêtê bikete,
emê Bakûyêda Navenda Çanda Kurd "Ronahî"-yê
bidine damirazandinê, bi kurdî rojnama "Dengê
kurd"-ê bê weşandinê, pirtûk-"Elîfba"-ya ulumdar
Bayramê Fetîda ev helbesta wî, wê ronahî bibîne.

X X X

Berbangekê xewêda veciniqîm, rabûm û
nizanim çima berbi pirtûkxana malê çûm. Bi
destên xwe virda, wêda pirtûk hevexistim, bloknotek
kete destê min. Ser hatibû nivîsarê-"Laçin, gulan,
sala 1975-a". Rast 20 sal ji wê mehê, ji wê salê
derbaz bibû, gava ez mala Muzefferê rehmet
lêbûyî bibûm mêvan! Him jî min gilî dabû ji wê
rêwîtiyê bîranînekê binivîsim. Xwestin û hêzeke
mezin tijî nava ruhê min bû û ez hatime ser wê

birîyarê, hema îro li mala Muzefferê Memo biqesîdim.

Hûn hew dizanin, ezê rabim karê xwe bikim, çawa sala 1975-a ji Bakûyê rêkebim, berê xwe bidime Laçina xwedanê hevtê hevt rewşa, ji wir jî herim bigihîjime xemila xwezayê-gundê Kamallîyê.

Na! Ew rê hatine birînê, ew daxwez hatine sero-bino kirinê. çima? Ya yekê, Muzefferê Memo dunya xwe guhastiye. Ji roja mirina Muzefferê Memo qewmandineke qewimî qalkim. Zivistan bûye. Dibên, xêncî nexweşên cî-nivîna gundda tu kesek mala xweda nema bûye, gişk hatibûne derê mala rehmetlê-bûyî. çawa bibên, şîn cîyê xweda. Hinek mêran şuxulê mêra dikir, hinek jina, keç-bûkan karê jina dikir.

Paşayê bira dinihêre keçikeke 14-15 salî derê male, destên xwe daye piştê xwe, ker-lal sekinîye; xwe jî, ji serma diricife. Ew nêzikî keçikê dibe, dibê:

-Keçê, tu çima awa ker-lal sekinîyî, dinihêrim tu him jî serma qerimîyî.

- Apê Paşa,-keçik bi kelogirî dibê,-min çavrijîyayê çi zanibû wê awa bibe, do min tilîyên xwe hene kirîye.

Apê Paşa xardibe tê rûyê keçikê dibê:

- Ewledê, evê kirina te dîlda ber dilê min, tişt nabe, here tevî keç-bûkan bibe, karekî bike.

Paşê Paşa tê ber laşê birê çokvedide û bi dengêkî nîvlerizî, lê bi firncax dibêje:

- Birao, tu nemirîyî, tu zindîyî, ji ber ku, te dilê biçûk-mezina da cîyê xwe girtîye.

Ew jî dibêjin, wê salê binelîyên gundê Kamallîyê eyd, cejinên heyî bi sarayî derbaz kirine.

Ya duda-êpece qewmandinên dîrokî qewimîne, împêrîke mezin hatiye hilweşandinê. Dîrok hey bûye şhedê wê yekê, wedê damezrandina sîstêmekê tê hilweşandin, ew pey xwe wêranbûn, kevil kirin, merzellan dihêle.

Yekîtîya Sovêtê jî hilweşîyanê ev kirinên reş hatine wekilandinê. Serbarê serda ne ku jîyana çend mirovan hate qusandinê, kete bin qezîyayê, lê navberîke fire hate dagirkirinê, çarenûsa hinek gela reşqemilî, gelqirî pêşta hat. Çawa ku li Azerbaycanê. Dunê bihîst, wekî şer di nava Azerbaycanê-Ermenîstanêda diçe. Hinek welat nuqî nava qewmandina bûn, hinek dûr sekinîn, mîna mêzekara ew mêze kirin.

Ermenîstanê beqî piştovanên xwe him Qerebaxa Çîya dagir kir, him çend nehîyên Azerbaycanêye mayîn, weke mîlyonekî revok û koçberên zorê derxiste roja reş.

Belê, ji wan nehîyan dagirkirî yek jî Laçîn bû. Meha gulanê, sala 1992-a neyar hemû aqara Laçînê, 132 gundên wê kire nava lepên xweye qilêr, lepên nava xwîna mirovada mewicî. Binelîyên Laçînê him azerbaycanî, him kurd li hemû nehîyên Azerbaycanê bela-bela bûn. Gundê Kamalîyê jî, ji wan gunda bû.

Belê! Bi dil herişî, belê!

Mal-malbeta, ku me îro berê xwe daye li gundê Kamalîyê, nehîya Laçînê dima, dijîya, lê

naha ewa jî mîna bi hezaran bûye revok û li bajarê Bakûyê, avana Ehmedlîya Kevn dimîne, dijî.

Avana Ehmedlîya Kevin li taxekî Bakûyêda cî-war bûye. Her çar alîyê gund bi avayên bajêre nûh yê bilindva hatîye wergirtinê. Aqara gund êpêcekî fireye.

Rojeke baharêye ne germ, ne sar bû. Ez û ewledekî Muzefferê Memmed- Fexredîn bi têlê pevketin, wekî li stansîya mêtroya bi navê "Ehmedlîyê" rastî hev bên. Wedê kivşkirî ew yek mera lihev hat. Pey silav-kilavara ewî bi beşereke xweş pirsî:

-Dunyayêda ew kîjan gunde lê mêtro heye?

Bi xwe jî bersîv da:

-Ew gundê meyî nûh, Ehmedlîya Kevne.

Gundê Ehmedlîya Kevin bintara mêtroyêye. Em kuçên wêye xaro-marora derbaz dibûn. Me gundê Kamalîyê bîr anî, derheqa bedewî-rewşa wêda gilî kir. Li cîkî Fexreddînê Muzeffer sekinî û kelimî:

-Eva hejêna malên meye.

Hejên-sûra malên biran ji kerpîçên kevir êpêcekê bilind hatibû hilçandinê.

Em ketine hewşeke mezine-fire. Avayên bira çend mêtira dûrî hev hatibûne ava kirinê. Her tişt bi pergar, bi sazdar, çawa dibên cî bi cî bûn. Em odeke fireda, nava endamên "Mala mêrada" rûniştine.

Dayîka malê, dayîka heyşt zaran, porsipîya bi rûmet Zerxara Îmamgûlû nava hemû ewlada da fêza gişkan mîna çiyakî giran cîyê xwe girtî bû.

Me bi hizkirineke mezinva hewalê hev pirsî.
Me rojên buhurî, mêvandarîya li gundê wan bîr
anî.

-Ê, birao,-dayîka Zerxarê ji dil axîneke kûr
kişand, got,-ez derdê hesretîya dikişînim.

Ya rast ez ser vê gotinê ecêb mam. Min li
wê, her çar kurên wê, her çar keçên wê, neviyên
wê nihêrî û xwest pîrskim, hesretîyê çî? Ewê dest
xweda nêta min derz kir û mîna dêke dunê dîtî
kêlimî:

-Min berê, berî revoktîyê, xwe-xwera digot:
“Dê-bavmra ewlad, paşê kê-m-zêde malê dunê,
dilekî şa lazime”. Lê hingî ermenîyên malwêran
bere me dane, em ji cîyê kal-bava reqetandine, ez
hatime ser wê nêtê, dûrî serê ewladan, berî her
tiştî welat, axa teye helal pêwîste. Ez hesreta
Laçinê, hesreta Kamalîyême.

Ewledên wê jî ber dilê wêda hatin, lê ewê
serê xwe hejand:

-Na, lawo,-berbirî kurê xweyî mezin Dostelî
bû,-ez hesreta tase ava kanîya Sincanême, ez
hesreta kevir-kuçik, tendûr, qelexa kerma, loda
gêhême. Ez hesreta tirbên mirîyên merzelê gundê
me dikişîmm.

Her ku, Laçin, gundê me dikebe bîra min, tu
hew dizanî dilê min didine ber pençirûkan,
dipertînin. Mirov her tiştî dikare destxe, her tiştî
dikare bikire, bifroşe, xênî ji Welat. Bila mirovê bê
welat neyê dunê!

Me tê derxist, wekî kela wê tijî bûye, lêlêye
hêsiran bibarîne, me dor bire ser nuxurîyê wê
Dostelî hekîm.

Mîna hemû zarên vê malbetê Dostelî jî li gundê Kamalîyê hatîye dunyayê. Ew li gund, nava qundaxa dê û hemêza xwezayêda givrik dibe. Rojekê dê ew bi şabûn şande mektebê. Sal-sal xwend, mezin bû, mekteba navîn bi qîmetê bilindva xilaz kir. Pê avîte salên xweye xortîyê.

Bi şewira dê-bavê, bi xwestina xwe birîyar kir bibe bijîjk, him li gundê wan, himli gundên derdoran bijîjk tune bû. Binelîyan bi hezar dijarîyava nexweş dibirin derdixistine ser bijîjkan.

Yek jî qewmandinekê gellekî bandore xwe ser wî hîştibû.

Ewî dersxana 7-da dixwend. Rojêke zivistanê bû, berfê davîte jûnîyan. Kurîkekî mamê wan ji ser lodê ketibû. Bi hezar dijarî sibetirê ew anîne Laçînê ser bijîjk. Dostelî jî wanra hatibû. Bijîjk virda, wêda kurik nihêrî û kelimî:

-We zû bianîya, meyê pêşîya xwînê bigirta. Lê îdî derenge.

Mirîna kurik dilê Dostelîyê tîfal herişand, gotina bijîjk jî di nava ruhê wîda hewasîya vî pêşekî pêşta anî. Dostelî îdpderz kiribû, bona bibe bijîjk pêwîst bû rind bixanda. Ji wê rojêda pirtûkên dersan ji destê xwe danenî erdê. Bera jî pirtûkên mayîn jî dixwend.

Rehme li webe bapîrno-“ Sal mîna bawîşkan tîn û dicin”. Salên xwendina dibistana navîn bi serfînyazî ser Dostelîyê êginra hatin derbaz bûn. Azmûn-îmtîhan da, attêstat danê.

Li ber şemîka dibistanê attêstat vekir nihêrî. Her tenê wîrda “4” (çarek) nivîsibûn. Ew “4” (çar) bi çavnebarî nivîsibûn, yanê na, wê mîdala zêr

bistanda. Wê rojê ew him şa bû, him posîde bû.
Paşê bav ber dilê wîda hatibû û gotibû:

-Lawo, bila jîyan mêdala zêr ji te nestîne!

Pey wê yekêra meremê wî tenê ew bû, here
Bakûyê û înstîtûta bijîjkêda bê pejirandinê. Lema jî
rojeke havînê berê xwe da çîyayên Laçînêye bi
zîyaret:

-O, çîyano! Ji we bilintir, ji we wêdatir
Xwedayê mezine, dengê min bigihînine wî, ez
diçim, lê destevala venegerim. Bi we sond duxum,
ezê her tenê kêrî mirovan bêm!

Belê, ew rojeke havînê ji Laçînê derket û
hetanî bajarê Bakûyê pê kuta.

Kal-bavan gotîye, bê ewir baran nabare.
Jîyana bê piştovan, dara çiqil şikestîye. Dostelî
berê xwe da mala apê xwe Elîbala. Elîbala
muellîm ew çend salbû înstîtût xilaz kiribû û
Bakûyêda kar dikir. Ev camêr bi kirinên xweye
qencva timê dibû piştovanê bi deharî malbetan

Paşayêvan, beqî wî, bi şêwira wî weke 30
kesan xwendina bilind dest tînin, ew dibe rênîşê
gellek binelîyên Laçînê.

Sibetirê mamoste Elîbala gote Dostelî:

-Birazîya, pêparê min, pêparê xêrêye, rabe
em herin evreqên te bidine înstîtûta bijîjkê,
nuqutîye dilê min tuyê bêyî pejirandin.

Ji gotina bijîjk:

-Min îmtahan dabûn. Em bê sebir hîvîya
agadarîyê bûn, ka binê kî înstîtûtêda hatîye
pejirandinê, kî na? Çendekî şûnda ewqas mirov
beşterî hewş, der-dorê înstîtûtê bibûn, te derzî
bavîta erdê nediket. Him yên îmtahan dayî, him

dê-bav, him qewm-lêzimên wan ber kîne-kîna tavê diqemilîn. Ez berbangê rabibûm çûbûme ber stûna radîyoyê sekinîbûm.

Ji wir nav, paşnavê wan kesa dikişandin kî hatiye pejirandinê. Ro ji nîverojê dagerî bû. Birçîbûn nedikete bîra min, lê tî bûm.

Min bixwesta jî, ez nikaribûm ji nava qelfê mirovan derê, herim avekê vexwum, kesekî nas jî tune bû. Ji Laçînê tik-tenê hatibûm. Tirpe-tirpa dilê min bû. Demekê xurt derbaz bûnê şûnda nav, paşnavê min jî hate kişandinê.

Navê kê dikişandin, ji şabûna yên dorêra tevayî dikirine qîrînî. Qe deng ji min derneket, şabûna lêvên min dihejîyan, lipitandin bi min nebû!

Nişkêva parava yekî ez hemêz kirim. Ew apê min-Elîbala bû. Ewî ez maçkirim û şûşe av dirêjî min kir. Hetanî ez hebim, ew şûşa avê wê ji bîra min neçe.

Xwendevanê înstîtûta bijîjkê ya dewletêye ser navê Nerîman Nerîmanov Dostelîyê Muzeffar ji cî-warekî quntara çîya hatibû ketibû nava behra bajarekî mezin. Ew behr-jîyana bajêr, bihîstina lêksîyên dersdar, ulumdar, xwendina dersan, bi sehetava li pirtûkxana debirandin, rewşa jîyanêye nûh û gellek-gellek qewil-pirsên mayîne dijar bûn.

Diqewmî ew di nava vê behrêda bahata xeniqandinê, yanê jî sobekarî bikira, ewa qevzkira. Qîreta netewîyê, sonda ber çîyan xwerî, tasa ava zelal ku dê pey reşandibû, keda bavê, şîrê dê, meremên qenc nehîşt ew bixeniqe, minêbe.

Salên xwendinê di jîyana her xwendevanekîda rêça xweye heta-hetayê dihêle. Nava 5-6 salên xwendinêda Dostelîyê Muzeffer xwe ji pirr-pirr tiştan parast. Dijwarîyan û hinek rewşên bajêr, yên genî dixwestin wî bidine terkîya xwe, lê ewî hey ewana gem kir û hey cedand, wekî ew bi xwe hespa jîyanêye kihêl sîyarbe, bi xwe wêya zengîke.

Belê, bi zanebûna xweye destanîva ew sal bi sal hînî sur, dunya bijîjktîyê dibû. Sala debixatirê jî hat. Sala xilazkirina înstîtûtê. Roja îmtihana dewletê, ya dawîyê danê şûnda, ji şabûna pîyê Dostelîyê Muzeffer erd nedigirt. Ew derkete hewşa înstîtûtê, hinekî ji avayê wê dûr ket, sekinî, zivirî êpêcekî ew mêzekir. Te tirê ew wêya nûh dibîne. Roja pejirandinê kete bîrê. Şabûna wê rojê, ya vê rojê himberî hev kir. Xwendevanê do, bijîjkê îro hate ser vê nêtê: "Him ew şabûn, him ev şabûn bona rojên jîyanêye paşdemîyê, bona xizmetkarîya mirovaye".

Çawa eyane pêşekê bijîjktîyê beş-beş, çiqil bi çiqilin. Dostelî beşa têrapîyayê bijartibû. Naha, gava em pêşberî hev rûniştine, min ji wî pirsî:

-Te çima têrapîya bijart?

Bijîjkê îroyîn zane, destemel bi zar şirînî kelimî:

-Têrapîya-beşekî bijîjktîyêye tomerîye. Li gundê me, usa jî li gundên der-doran tu doxtorek tune bû. Wekî ez bibûyama nişdar, yanê doxtirê çavêşê, dilêşê minê nikarbûya alîkara her alî bigîhanda nexweşên gundên me. Min ew çiqil qest bijart.

Yekîtiya Sovêta xwedê giravî her tişt, her kar bi pîlan bû. Pey qedandina înstîtûtêra her yek bi şanî dişandine ser kar. Pêwîst bû te sê salan li cî-warê kivşkirî kar bikira, paşê bahatayî dîplom bistenda. Bona vê yekê komîsya dihate amadekirinê.

Bijîjk Dostelî pêşberî komîsyayê sekinî bû. Sedirê komîsyayê got:

-Paşayêv Dostelî, em zanin tu ji nehîya Laçînêyî, lê me birîyar kirîye te neşînine wira. Em dixwezî tu li bajêr bimînî, tuyê paşdemîyê bibî pêşekzanekî zane.

-Hevalê sedr, endamên komîsyayê, -Dostelî bi dengêkî mîna bergerinê berbirî wan bû, -hûn zanin li nehîya me bijîjk gellekî hindikin, ez hîvî dikim min bişînine Laçînê.

Endamên komîsyayê bi ecêb hev nihêrîn. Bona bajêrda bimînî, bixebitin hineke mayîn bertilî didan, lê ev bi xwe hîvî dike here nehîyê.

Birîyar hate pejirandinê û bijîjk Dostelî bi şanî şandine nehîya wîye hizkirî. Dema bijîjkê nehîya Laçînêyî sereke bihîst Dostelîyê Muzaffer şandine vira şabû. Ji ber ku ewî bijîjk Dostelî rind nas dikir. Di nava salên xwendinêda bijîjkê cîwan 2-3 mehê havînê dihate gundê Kamalîyê û dibû alîkarê her nexweşekî, hinek ji qeziya xirab dabû xilazkirinê.

Rojke havînêye germ ji înstîtûtê evreq-şanî dane destê bijîjk Dostelî, wekî ew here Laçînê, ser xebatê.

Laçîna rengîn bona wî her tişt bû. Çawa şagirt ji Laçînê derketibû, çawa bijîjk vegeirî. Çawa

cîwanekî ter çûbû, çawa xortekî gihîştî vegeîbû.
Serbarê serda hinekî jî, hevraz-berjêrê jîyanêra
derbaz bibû.

Naha ew oda bijîjkê nehîya Laçînêyî sereke
da
rûniştibû.

Bijîjkê sereke pêşnîyar kir, ew nexweşxana
nehîyêye navînda dest bi karê bike. Lê Dostelîyê
Mûzeffer awa berbirî wî bû:

-Doktor, komîsya înstîtûtê dixwest ez li bajêr
bimînîm, min ew yek nana kir, her tenê bona wê
yekê, wekî herim gundda bixebitim.

-Ne tu rind zanî gundên weda nexweşxane
tune.

-Belê, gotina weye. Ez hîvî dikim min
bişînine nexweşxana gundê Alxasliyê.

Bijîjkê sereke ber xwe da lêvên xwe anî ser
hev, him çîkekî xwe ker kir, gavekê şûnda kêlimî:

-Ez ser wê nêtê bûm tuyê vira bimînî, daha
gellekî kêrî mirovan bêyî.

-Doktor, hûn jî rind zanin xêncî ji gundê me,
çend gundên din weke 55-60 km dûrî navenda
Laçînêne, çûyîn-hatin diware. Payîz-zivistana lap
diware. Carna zivistanê berf dibare, rê tene girtinê.
Destê nexweş ji hemû dunê diqete. Wekî ez li wir
bim qe na, ezê bibime bawariya wane sibê.

Bijîjkê sereke rabû di nava kabînetê xwe da,
çû wî serî, hate vî serî, careke din zivirî cîyê xwe
rûnişt, pêûs hilda ser evraqê bijîjk Dostelî ber
xweda çî nivisî, çî nenivisî, serê xwe bilind kir, li
rûyê xort nihêrî û got:

-Qenc. Tera oxirbe! Dikarî sibêda dest bi xebatê bikî.

Bijîjk Dostelî spasîya xwe da wî û ji kabînetê derket.

Nexweşxana gundekî quntara çîyayên hizkirî bû destpêka karkirina bijîjk Dostelîyê Mûzeffer. Ji wê rojêda ewî xelata bijîjkêye spî xwekir, kumê qerqaş da sereê xwe, stêtoskop-fonêdoskor da ber guhê xwe, mirovên nexweş yên bi gazin, yên ku dihatine nexweşxanê Dostelî hekîm dibû alîkar û piştovanên wan.

Bawer bikî kê pîyê xwe davîte hewşa nexweşxanê berî her tiştî Dostelî hekîm dipirsî.

Rojekê, dersdarê gundê cîran yê bi nav û deng, tevî mirovekî tê nexweşxanê, bal bijîjk Dostelî.

-Dostelî hekîm,-ewî dest bi axavtinê kir,-ev kes kurapê mine, navê wî Qismete. Ew bi nexweşîya nêvrolojî-biriknasîyêva nexweşe. Birakî wî bi wê nexweşîyê dunya xwe guhast.

Dostelî hekîm nexweşra kete pire pirsyara. Hate eyankirinê, wekî ev nexweş carna xwevadiçe, bi sehetava hişê xwe unda dike.

Rewşenbîrê ku, nexweş anîbû bal bijîjk, rabû got:

-Dostelî hekîm, dinihêrim tu him mirovekî zarşirînî, him tê kivşe tu doxtirekî zaneyî, hişê min dibire tuyê, zûtirekê navekî qenc derxî. Dibên, dar bi berê xweva eyane, mêr bi navê xwe, doxtir jî bi kirinên xweva. Ez nexweş dispêrime te û diçim.

Ji wê rojêda bijîjk Dostelî ser rewş-qenckirina nexweş kar kir, hemû zanebûna xwe anî holê.

Roj ser rojanra derbaz dibûn, rewşa Qismet pak dibû. Lê li gund derew, buxdantî li hev dialîyan, digotin ku, bijîjk derzîyê tevdandinê li nexweş dixê. Qewm-lêzimên nexweş jî ketine şikberîyê, lema jî wana ji bijîjk hîvî kirin, ew destûrê bide ewana nexweş bibine Stêpanakêrt-Xankendê (serek bajarê herêma Qerebaxa Çiya).

Bijîjk Dostelî bi şabûn destûr da. Du rojan şûnda him nexweş, him pismamên wî hatine bal bijîjk Dostelî û gotin, wekî li wir nexweş ji hemû nêrîna derbaz kirin û xwemukur hatin:

-Nexweş bibine ser wî doxtrî, yê ku, ser qenckirina wî kar kirîye. Nexweş êpêcekî xweda hatîye.

Evê qewmandinê nava binelîyanda rûmeta bijîjk Dostelî bi carekêva da zêdekirinê.

Ew nexweş seranser qenc dibe. Lê bona carekêva ji şikberîyê dest bikişîne, wî nexweşî dişîne Bakûyê. Profêsorê bi nav-deng Mollazade, yê ser pirsên nêvrolojîyê, wî nexweşî dinihêre, mêze dike û dawîyêda dibêje:

-Dostelî Paşayêv xwendevanê min bûye, min ji wî bawer dikir. Ew bawariya min cî bi cî bûye. Bijîjk tu nod selefî qenc kirîyê. Maye deh selef, ewê jî ezê qenc bikim.

Eferîm Dostelî hekîmra wededa tu qenc kirîyî, diqewime tu zûtîrekê bimrayî. Tu paşda vegerinê pêş minva Dostelî hekîm selamke.

Qewmandinekê jî ta-derzîyêrakin. Rewşenbîrek ji gundê cîran bona nexweşîya xwe tê bal bijîjk Dostelî. Ew wedekî dirêj bûye, wekî ew kes bi kuxuka hişk kuxuyabûye. Nava hevtêkê-duda da bijîjk wî qenc dike. Dostelî Paşayêv wîra belgi-pe bê nexweşîyê dinivîse. Wirda dîagnoza "Plêvrîta hişk" dinivîse. Belgê nexweşîyê gotî li Laçînê, li nexweşxana navînda, bahata rastandinê. Serwêrê beşa tendurustîya nehîyê belgê nexweşîyê dinihêre, ecêbmayî dimîne û dibêje:

-Dostelî hekîm bê rêntgênê ev dîagnoz çawa danîye? Kivşkirina dîagnozên awa pir dijiware.

Çawa dibên, dawîyêda her tişt rast derkdikebe.

Bijîjkê xwedanê dayîna xwedê alîkî dermanê bijîjktîyê, alîyê dinda loxmantîya gel, ya bi hezar salaye cêrbandî, tevî hev fikir û dibû alîkar, qenckarê her mirovekî, yê ku karnîyarî wî dibûn.

Belghewêz, cetilî, tirşo, ginêminê, şîlan, gezgezk û bi dehan pincar-hêşîneyên Laçîna xwedanê hevt rişîyên xwezayê, dabû ber destên xwe.

Hinekê, ku ji gundên dûr dihatine nexweşxanê, qenc bûnê, derketinê berbirî bijîjk Dostelî dibûn:

-Doxtr, Xwedê timê te serbilindke, ez silamet bûme diçime gund, tera çi bînim?

-Minra filan pincarê hişkin, yanê ter bînin.

Meh bibûne sal. Ew sala duda bû bijîjk li gundên çîya ber tendurîstîya mirovanda disekinî.

Xêncî jî zanebûna wî binelîya derheqa wîda tiştên mayîn mîna bûyarekekê hevra qal dikirin:

-Doxtir Dostelî mêrivra usa diaxive, mirov wê deqîqê nexweşîya xwe bîr dike.

-Bijîjk Dostelî bijîjkekî çavtêre.

-Me gellek cara bi çavên xwe dîtîye nexweşên, ku mecalên wan tune dermîn bistîne, hekîm bi xwe standîye, daye wana.

-Welleh, peya ji wî gundî çûye gundê din, çawa pêwîste dû-derman daye nexweş, têr çûye, birçî hatîye.

Li gundê nehîya Laçînêyî herî dûr-nexweşekî çend sala hebû. Ev çend sal bû di nava cî-nivînada nale-nala wî bû. Hey di biribûne bajar-gunda, nîşanî bijîjkan nêrewana kiribûn, lê çaresera derdê xortê dest bi hene nebibû.

Rojekê hatine pey bijîjk Dostelî. Rêva, ser hespê bijîjk kûr û dûr kete mitala. Çawa dibên, zozan bire aranê, aran anî zozanê.

Dilê xweda gazî Xaliqê jorîn kir, wekî ji gund rûreş venegere.

Nexweş û bijîjk pêşberî hev rûniştibûn. Yekî îdî bawerîya xwe undakiribû, yê din bi hawerîya mezin, bi zanebûna destanî, bi piştovanîya Xwedê nexweş dida axaftinê. Dawîyêda, dema bijîjk rabû, ku fonêndo- skopê bide destê xwe nexweş mêzeke got:

-Xortê delal, hedîseke Pêxemberda tê gotinê: "Tirsê tu kes ji mirinê xelas nekirîye, feyda tirsê tune".

Dêmê nûranî, zarê şirîn, axavtina cî bi cî hinekî bawerîya nexweş zêde kir.

Oda dinda jî dê-bav, qewm-lêziman, der-
cîran bê sebir hîvîya wê yekêbûn, ka binê bijîjkê ji
bal nexweş kingê derê, çi bêje, çi nebêje?.

Fonêndoskop da destê xwe, quncikê wê kire
guhên xwe û despêkir movik-movik bedana
nexweş nihêrî. Li pişta wî nihêrînê cîkî kete
şikberîyê. Careke mayîn mêzekir, ji nexweş hîvîkir
geh bîna xwe bigire, geh berde. Bijîjk fonêndoskop
wêda danî, destê xwe danî ser cîyê şikber û hinekî
dewisand. Bû qûrîna nexweş. Nexweş dilê xwe da
rika xwe bijîjk anî, bijîjk dilê xwe da şabû. Şabû
wekî hest kirîye nexweşî ji ku tê. Tilîya xwe danî
nava du movikên fêza hestûyê bocikê, rind tê
derxist yek hinekî korta çûye. Dîsa ew dewisand.
Îcar nexweş daha qayîm qirîya. Dê-bavê wî xwe
avîtime hundur û hevra qûjîyan:

-Doxtor, em bextê tene, çi bûye?

-Qe metirsin,- bijîjk bi beşereke xweş got,-
min çavkanîya nexweşîyê dîtîye.

-Çiye?

-Du movikê piştê ji hev dûrketine, yek hinekî
kortda çûye.

Bavê nexweş bi herdu destava hatê serê
xwe:

-Xwelî serê minbe! Ne Xwedê giravî ez
cebarvanim!

Rastî jî ewî cebarî dikir. Lê nizanibû, wekî
gezîya ku, hatîye sere kur ji çîye, lema berbirî bijîjk
bû:

-Ka, ca kerema xwe nîşanî minde.

Bijîjk bi tilîya xweva ew der da kivşê. Bavê
xort-Hesen tilîya xwe da wê derê, movikê jorê, jêrê

bi tilîya xwe nihêrî. Paşê bi destekîva ji paşa ustû, hetanî qarçikê movik û rehên piştê ber tilîyên xwera derbaz kir, kur hêdîka da ser piştê û ji bijîjk pirsî:

-Nêta te çiye?

-Pêwîste zûtirekê bibine Bakûyê, têkine rêntgênê, wê şûnda nexweşxana tramatalojîyêda bidine razandinê. Ew cîyê zerb lêketîye bavêjine kipsê.

-Na, doxtor,-ewî neqayîlbûna xwe anî serzara, -bi alîkarîya Xwedê ezê wî bi xwe qenckim.

Ewî awa got û gazî kurê xweyî din kir:

-Lawo, kavirê meyî kel bîne çawa qurban şerjêke. Şukur doxtor derdê birê te dîtîye, bavê teyê jî wî qencke. Derd dîtîne şûnda derman hêsaye. Bijîjk rabû wekî nehêle kavirê şerjêke, lê xwedanê malê got:

-Doxtor, eva pêşta nêta me bûye, wekî derdê Şemo bê dîtîne, emê qurbanê şerjêkin. Lo, eva qurban hindike. Te berê min da nexweşîya kurê min. Çawa te got, du movikên wî ji cî leqîyane, rehên piştê jî li hev sîyar bûne. Ezê bi van tilîyên xwe wana têkime cî, bigihînime hev.

Camêrê Hesên cîyê xweda direqisî, şabûna nizanbû çî bike, çî bêje, dîsa karnîyarî kur bû:

-Lawo, zû bike, qurbanê şerjêke!

Paşê vegerî ser bijîjk:

-Lo, ez heyran, him jî minra dûv lazime. Ezê hema naha wan herdu movikan bigihînime hev, hinek dûv, zerika hêkan, bikime melhem. Ezê ewê melhemê bikişînime ser du-sê ta-qatê kitana dest

pê neketî. Ewê nêrbendê bidime ser movikan û rehên piştê. Ne bi gotina min, lê bi gotina Xwedayê mezin hevtekê şûnda kurê minê rabe bigere.

Bijîjk Dostelî vê yekêra qayîl nebû, got, wekî pêwîste têkine rêntgênê, şikil bê kişandinê.

Lê cebarvan ji nêta xwe dest venekişand.

-Doxtor, ewî bi hemdê xwe got,-ez heyrana zanebûna te bibim. Te kirina xwe bi zêdekarî kir. Eva sê sale ewî nava cî-nivînadaye. Wekî hevtêkê şûnda ew berxêr nebe, ezê hê gotina te bikim.

Bijîjk nihêrî ewê ya xwe bike, rûnişt navê çend dermanê xwerinê nivîsî.

-Erê, ew derman pêwîstin.

-Lê ev qeziya ji ku pêşta hatîye?,- Dostelî bijîjk pirsî.

Şemo bi xwe bersîva bijîjk da:

-Doxtor, naha ez tê derdixim ev xeta ji ku hatîye. Betirpêrar li gund dewat bû. Min xortekîva guleş girt. Min ew hilda ser serê xwera anî erdê xist. Sibetira wê ez pêş bavê xweva çûme ber pêz.

Payîza dereng bû. Zîpîkeke usa lêkir, kal-pîra digot, hê zîpîkên usa nedîtine. Êvarê êş, janê avîte paş-pîlê min.

Wê rojêda ji nava cî ranebûm. Ji wê rojêda herekê gilîkî got. Hineka digotin, ez tirsîyame, ez birime ser şêx-mella, hineka gotin zîpîkê serê min xistîye, ez gêjbûme. Çend meha doxtorê serîya ez nojdarî kirim, çend meha doxtorê dila. Tiştê derneket. Eva nêzîkî sê salaye derdê min nedihate dîtîne. Hinekan jî digot ez radîkûlîtê ketime.

Wê şevê bijîjk wî gundî ma. Mirovên gund biçûk û mezin hatine dîtina wî. Sibetirê li gundê cîran bû şar-war, wekî Dostelî doxtor derdê nexweşê sê sala dîtîye û dest bi nojdariyê kirîye.

Sibetirê Dostelî bijîjk vegerî nexweşxanê, lê dilê wî bal Şemo bû. Hevtêkê şûnda gilî hat gihîşte bijîjk, wekî Şemo ji nava cî-nivîna rabûye, bi gopala di nava malêda digere.

Mehekê şûnda Şemo bi xwe hate nexweşxanê bal bijîjk Dostelî. Wana mîna bira, mîna du xerîbên salan hev hemêz kirin. Naha him bijîjk, him nexweşê ji qezîyayê qencebûyî şa dibûn.

Ji vê yekê şûnda navê bijîjk Dostelî tevî qewmandinê din jî bû û mîna bûyerekê li gellek nehîyên rêspûblîkayê gerîya. Ew nav-dengê wî hat derkete Bakûyê. Wezîrîya tenduristîyê name şande nexweşxana Alxasîyê, wekî bijîjk Dostelî bişînine Bakûyê bê kûrsên zanîyarîyêda bixûne.

Ew sê sala şûnda hate Bakûyê, kûrsên bijîjkêda xwend û ew hate-hetayê bajarêda ma.

X X X

Jîyana bajêr mîna behreke bê sero-binoye. Li nehîyê êl-êlê, obe-obê, gund-gundan, mêmêran, camêr-camêran nas dike, zanin kî kîye, kî ji kîjan malê-malbetêye.

Rastî jî, di nava jîyana bajêr û ya behr, okêanêda mîna hevbûnê heye. Behr û okêanada mesîyên mezin, yên gir-hûrîkan, biçûkan dixwun, dadîqurtînin. Lê -belê, bijîjk Dostelî bajêrda ne ku nehate daqurtandinê, lê nav-dengê wî, zanebûna

wî daha jî bask da. Bajêrda roj bi roj hate naskirinê. Ji nehî û gundan hey mirov dihatine bal wî. Nexweşên ku, dikaribûn bi rîya têrapîyê bêne lêhirandinê, ewî bi xwe bona qenckirina wana çi ji destê wî dihat fikir, yên mayîna dibû şêwirdarekî delal.

Îdî navê wî bilind-bilind dahate kişandinê.

Naha gava ew avana Ehmedlîya Kevinda, polîklînîka here mezinda çawa dewsgirîyê doxtorê sereke karê dike ji berbangê, hetanî êvara dereng xeleta sipî li bejina wîye. Ji ber ku nexweşek diçe, yek, du, sê tîn.

Êvarekê ez û ew nava avanra derbaz dibûn. Hetanî em hatin gihîştine hewşa wana, mirovan rê nedida em derbaz bin. Yê ew dîtî ji wî alîyê rê, derbazî vî alîyê rê dibû, kêf-hal, rewşa bijîjk dipirsîn, him jî dest venedikişandin, ku werên, bi hevalê xwera tevayî bibine mêvanên me.

Min ji wî pirsî:

-Bijîjk, rûmetê di çida dibînî?

-Rûmet destanîn tiştekî diware. Lê ewa destê mirovade. Ya yekê gotî tu pêşekê xwe rind bizanbî, wekî mirov ji te bawerkin.

Ya duda gotî navê xwe, ji nefsa xwe bilindir bigirî. Bertilî stendin rûreşîye. Pêwîste her bijîjk sonda Hîppokrat neteribîne. Gava bijîjk ji nexweş, yanê ji xwedanê nexweş bertilê dixweze, distîne li erdê ruhê Hîppokrat diêşe, li jorê Xwedayê xwe bîr dike.

-Dostelî, bira, te navê bavê bijîjktîyê, ye ulmî Hîppokrat kişand, ew dibê; "Bijîjk-karkarê

hunermendîyêne". Çi heleqetîyên bijîjk û hunermendîyê?

-Dunyayêda bêjimar pêşek hene. Pêşekê bijîjkê pêşekeke bi zîyarete. Mirov hene-nexweşin, diçine zîyaretê qenc dibin. Ya sereke bawerî wana qenc dike. Gava dengê diholê, pêra jî sewta miqamê, yanê jî dengê kilameke xweş li nexweşê giran tesele bûnê, ew nexweşîya xwe bîr dike, ew serê xwe bilind dike, dikebe nava rewş-halekî nûh.

Ez çend cara bûme şehedê wê yekê. Nexweşxana gund, ya ku ez lê dixebitim nava, gunda bû. Wedê dibû şayî, nexweş hinek derdiketine derva, hineka xwe dida ber rodera guh didane sazbandîyê. Hinekan jî hîvî dikir, herine dewatê. Min destûra hinekan dida. Ewana bi kêfxweşî vedigerîyane nexweşxanê. Bijîjk bi axavtina xweva nebe sazbandê nexweş, bi kirina xweva nexweş nede bawer kirinê, way halê wî nexweşî.

Mesele-metelokeke me, tu hew dizanî bona vî camêrî hatîye gotinê, bona vî camêrî hatîye hinartinê: "Çi bêjî bejina sîyarê min tê".

Emê her ewê jî derheqa vî mêrê ji mala mêranda bêjin, wekî Dostelî bijîjk xwedanê malbendeke mîna kulmekêye. Xanim-xatûna mala wî, dayîka çar ewledên wî Yasemen xanim dotmama wîye, dersdare. Her çar ewledên wan xwedanê xwendina bilindin. Min xwest derheqa wêda jî kê-m-zêde binivîsim, lê ewê bi kubar-kubar got:

-Derheqa minda binivsî jî dibe, nenivisî jî. Ji roja bûktîya xweda, min du mektebada dersdarî kirîye. Yek li mektebê, yek jî li malê! Ez ji çarenûsa xwe razîme.

Lê emê çend hevoka binivîsin û bêjin mala mêra yek jî wê demê xirab nabe, gava jina malê, kevanîya malê hemû çiqilên malbetêda şîr helalbe.

Yasemen xanim keça hunermend-sazbendê êlê Adiguzele.

Em çendî-çend caran li şayî-dewatada bûne şehedê wê yekê, biçûk û mezin awa karnîyarî wî dibin:

-Hunermendê êlê, kerema xwe filan miqamî lêde.

-Hunermendê êlê, filan miqamê kurdî lêde, emê dîlanê bigirin.

Wê wêda dewat daha jî şên dibe, dîlan fitil-fitil tê, derbaz dibe û ruhê kurdîtîyê dil hinavada bilq vedide.

Me dixwest li vira rawestin, niqîtkê daynîn dawîya bîranîna "Mala mêran". Lê me rê tera dît, wekî em navê çend mêrên çê, yên ji vê malbetê nekişînin, diqewime ew nivcîbe.

Me jorê got, wekî Dune-hêwîya Perîyêra 5 kur, 2 keçik dibin û ji wana me her tenê derbarê kek Muzefferda wera qal kir.

Gava ew pênc kur îdî têgihîştin rûspîyê gund dibêje:

-Xaliqê jorîn, em ber te gerîyan, wekî tu keçikeke xêv bidî Mehmmed, me ne got, 5 bizota bidî wî!

Ew pênc bizot, pênc bira-Muzeffer, Taliş, Paşa, Elîbala, Hesên jîyanêda yek ji yekê paştaneman. Ewana bûne xwedanê mal-malbeteke navdar, ewledên wan yekê ji yekê zêdetir kir. Ji wan ewledan yekê çawa minak bînine hole. Osmanê kurê Paşa hat gihîşte hêlanên bilind. Ew karmende, merde, comerde.

Sala ku, Laçin hate dagir kirinê, Osmanê delal bû piştovanê bi dehan revokan, mala xweda jî cî da wana.

Per-baskê Xwedê ser kurapên wîye mayînbe, ew gişk hevra ketinê govendê, govenda wan dibe yeke ne teribandî. Çawa rojên serfinîyazîyêda, usa jî rojên tengasîyêda hevra dibine kela altnebûyî!

Lema pêşîya gotîye:

Mala zêran xirab dibe,
Mala mêra xirab nabe.

ÇÎYA BILINDE, RÊ DI BERA...

Kurd çîya gellekî hizdikin. Kî çawa vê yekê şirovedike bila şiroveke, lê bi gorîya me, her ku, dujmin, zordestîya zor danê gelê kurd, ewî mîna bira pişt kutaye çîyan û ji wê yekê serbilind, qayîm bûye. Kutasî, çiqasî ba-bager, berf-zîpik, hej çîya dixe, ew dîsa cîyê xwedaye. Lê çîya çiqasî bilindbe, çiqasî bê fesalbe, sert û zexmbe dîsa rê dide însîn. Lema gel gotîye: "Çîya bilinde, rê di bera".

Emirda merivên usa hene, wekî ew nefsdar di dîroka gelê xweda, bi kirina xwe ji çîyayê herî bilind bilind-bilind tê xanêkirinê. Çawa Qanatê Kurdo! Çîya jî hene kuda diçî here, piş xweva vedigerî ew tê kivşê, ji welat derketinê weke hesreta dê-bavê, weke kesera ewlêd ew çîya te berbi xwe dikişîne.

Ez îdî emirda ahlîm, li Kurdistana Tirkîyayê nejîme, ber çîyayê Agrîyera derbaz nebûme, lê vî alî Erez, li Ermenîstanê, gundê me pêşberî Agrîyê bû. Hema zarotîyêda dîya min me zarara digot, wekî ew çîyayê hanê çîyayê meye-Agrîye.

Paşê salên emir ez nava dîrok, wêje, çanda kurdanra derbaz kirinê, nêtxwestina mine here mezin ew bûye, ewe, wekî minra hevbê ber wî çîyayê zîyaretîra derbazbim, bisekinim, ber wê bejina xwe bitewînim û xarbim hinek xwelîya wê hildim bavêjime devê xwe, mirin emrê Xwedêye.

Kî dizane, dibe ku wextê dê destê Qanatê biçûk digire û bereka Agriyêra derbazî vî alî dibe, guhê wîda dibêje:

-Lawo, timê hesreta vî çîyayî û ya axa wê bikişîne, ewê her dem hêz-sehetê bide te; Xwedê te bilindke mîna vî çîyayî!

Xwendevanêd delal, werên em tevayî ber bilindaya rîya çîyayê ulmê Qanatê Kurdora derbazbin.

Qanatê Keleş Kurdoyêv sala 1909-a li Susîyê di nava dûmana çîyayê Agriyêda çavên xwe vedike. Rojên zarotîya wî rastî dijarîyê tê, dest bi şerê Duniyayê Yekemîn dibe. Sala 1918-a tevî gellek malên kurdan Keleşê camêr jî, ji rûyê zêrandin, birçîbûn, tîbûnê bar dikine bereka çîyayê Elegezê (Ermenîstanê).

Qanat tu dijarîya nanihêre xwe xwendinê digire. Sala 1928-a derîkî bextewarîyê li wî vedibe û tevî çend zîlamên din bona xwendina bilind tê derdikeve Sankt-Pêtêrbûrgê. Duniyake nûh ber çavên wî vedibe, vira çawa dibên ew pê davêje nava ulmê giran, vira ew pêdihese, ku ew ewledê çito gelîye. Çawa mafê vî gelê mêrxas tê pêpeskirinê û çawa hinek wekîlên milletên mayîn buxdana davêjine zimanê dîya wî û dixwezin bidine kivşê, wekî zimanekî aha "tune".

Qanatê Kurdo xwe ulmê zimanzanîyê digire û hebûna zimanê Kurdî digihîne rêza hemû zimanê Şerqê, bi ulmî dide kivşê zimanê kurdî, ne erebîye, ne farsîye, ne tirkîye, ew tevî van zimana nehatîye pêyvend kirinê, lê di nava wanda cîyê xweyî layîq girtîye. Firqîya wan zimana û ya

kurdan her ewe, wekî bi wan zimanana hukumên dewletê û hukmetê heye. Lê, sed car lê, tu kes destûrê nade yek bêje ew erebe, ew tirke, ew farse, ezni zanim ew çîye? Ez bi Xaliqê jorîn, bi Qurana me hemû muselmankim ew zimanekî tamî-tame, mîna ava zelal, zelale, her tenê ciranê wan zimanaye!

Bextewarîya here mezin ew bû, wexta Qanatê Kurdo kete nava ulm ulumdarên dunê eyan, yên mîna N. Mar, L. A. Orbêll û yên mayîn bi dilekî beristan zanebûna xwe dane wî û teme ser teme danê, ku ew hemû salên jîyana xwe pêşkêşî zimanzanebûna kurdan bike.

Cîye bê gotinê paşwextîyê, wextê Qanatê Kurdo dereca ulmda hat gihîşte wan ulumdarên, wan akadêmîkan ewî derheqa her yekîda bi şêkirdarî nivîsî û ewî jî teme da hemû qelemgirtên kurdan, wekî xêrxazê gelê kurd bîrnekin.

Qanatê Kurdo nêzîkî 50 salî xwe pêşkêşî pêştaborîna zimanê kurdî kir.

Dîroka ulmda, edebîyatê da kesên usa hebûne, ku tenê lêkolînek kirîye, tenê helbestek nivîsîye û navê wî ketîye nava navê nemîrîya. Wekî Qanatê Kurdo tenê ferhengê Kurdî-Rûsî binivîsîya, çiqasî zimanê kurdî li rûbayê dunê hebûya, navê wî jî, wê bahata kişandin.

Tu mirovek nikare nava bîranînekêda kar, kirina ulumdarekî ku, seranser jîyana xwe bona gelê xwe helandîye ser hevda bîne. Bona bilindaya ulmê Qanatê Kurdo bê ber çavan emê jêrê jimara pirtûkên wî nivîsî, ya netew, pey hev rêzkin û bila bê dîtinê, wî camêrê ser camêra gelê

xwera xezineke çawa hîştîye, ku ne tê kirinê, ne tê firotanê!

1. Giramatîka Zimanê Kurdî, Lênîngad, s. 1957.
2. Giramatîka Zimanê Kurdî, bona komên 5-8. Yêrêvan, s.1960.
3. Ferhenga Kurdî-Rûsî. Moskva, s. 1960.
4. Zimanê Kurdî, bona komên 3-4. Yêrêvan, s. 1979.
5. Giramatîka Zimanê Kurdî Anegorî matêrîalê zaravên Kurmancî û Soranî. Moskva, s. 1978.
6. Ferhenga Kurdî-Rûsî (soranî). Moskva, s. 1983.
7. Tarîxa Edebîyata Kurdî, cîlda yekê. Stockhoim, s. 1983.
8. Tarîxa Edebîyata Kurdî, cîlda dua. Stockhoim, s. 1985.

Me jorê her tenê bi rêbarî serîk efrandarîya Qanatê Kurdo xist. Bi dehan gotarê wîye ulmê, yên bi lêkolîn ser karpêkên wida bidî zedekirinê, ewê bibine çîyakî zanîyar. Bila ulumdar paşwextîyê ser wan karpêka kûr û dûr mitalekin, monografîya binivîsin. Lê bona mezinaya ulumdarên ,mîna Qanatê Kurdo tenê kar û barên wî kirî hildî û li ser lêgerîna derbazkî ewê nîvcîbe. Wextê merivtaya xêrxazîyê, dilşûşetî, rehmdarî û qenderên qence mayîn bal ulumdarên mezin hebûnê, emirda yek ya mayîn tew dike.

Qanatê Kurdo çawa xwe pêşkêşî ulm kiribû, usa

jî xwe spartibû xêrxazîyê, qencîyê, helalîyê. Ew piştovanê rastgelê bû. Evan gişkana bi kirineke wîye nebîrkirîva makkin.

Sala 1975-a bû. Xebatkarekî Akadêmîya Rêspûblîka Azerbaycanê, yê Înstîtûta Zimanzanîyê-Mesûd Memmedov karekî ulmî nivîsîbû.

Ew ewa çend sal bû ser wê yekê dixebitî, wekî zaravê Xeleç zaravekî kurdîye. Lê hinek ulmdar bi şik berbirî vê yekê dibûn û pirs pêşda kişandin, wekî zimanzanê kurd-Qanatê Kurdo bibe aponêntê wî û roja dîsêrtasîya bê xweyîkirinê, ew li wirbe. Xwedanê dîsêrtasîyayê rehmaetlêbûyê Qenetê Kurdo nasnedikir, ewî jî me hîvîkir, ku em evê yekê hildine ser xwe.

Me Qanatê Kurdora name nivîsî, çendekî şunda bi têlê pêra axivî. Ewî bi têlêfonê got, wekî min hema îro wera name nivîsîye, hûn hîvîya namê nesekekin, minra xebatê kirî bişînin. Hema min dit ku dîsêrtasîyayêda ulm heye ezê ese bêm. Me usa jî kir. Çendekê şunda, şevêkê nivê şevê têlêxistin. Min desteka têlêfonê hilda. Deng dengê Qanatê Kurdo bû. Bi dengekî şa got:

-Min dîsêrtasîya xwend, rinde. Çi wextî pêwîste ezê bêm. Ew xebateke hêjaye. Diqewime hinek çavnebarîyê dîkin, lê, gotî em nehêlin.

Bona vê bersivê em gişk şabûn. Aha, ew roj hat gihîşt. Qanatê Kurdo hate Bakûyê. Qesira Akadêmîyayê bi merivava kim-kimî bû. Hê dest bi enenekirina dîsêrtasîyê nebibû. Hinek ulumdarên dora wî çîft girtibûn, pirs pey pirsê didane wî. Ewî destên xwe dabû piş xwe û bi lewzekî şîrîn bersiva wan dida. Naskirîyan, nas nekirin tê derxistin, wekî pêşberî wan mirovekî xwedanê kana ulmê bilind sekinîye. Hinekê şunda dest bi enenekirin û

parastina dîsêrtasîyê bû, Mesûd Memmedov derbarê kar-xebata xweye ulmîda nêtên xwe ser hevda anî. Ulumdar, karkarên ulmê cuda-cuda pirs ser pirsane dane dîsêrtand, alîkîda pirs hev ket, alîkîda zelalî hate hole. Lê çawa dibên, xerîbo, ne li vî alî çêm, ne li wî alî.

Ya rebî! Qanatê Kurdo derkete ber dikê. Seqirtîyê seranser qesr hingavt. Ew mîna çîyakî serî bi berf dihate kivşê.

Ewî hêdî-hêdî dest bi peyvîna xwe kir, ji dîroka zimanê kurdî gilî kir. Zimanzanîya Îranîyê usa bi zanebûn hilat, usa bi bawerî, usa bi ulmî da kivşê, wekî zimanê kurdî wê rêzêda cîye xweyî layîq girtîye, zaravê xelec jî çiqilekî wîye.

Paşê pirs pey pirsan dane wî. Carna te tê derdixist ku, nava wan pirsanda pirsên li hev piçilkî jî hebûn. Qanatê Kurdo ser van pirsan vedibîşîrî, nava vê vedişîrênêda tinaz hebû, qerf hebû, yê pirsên usa didan paşê ji şerma serê xwe dikirine ber xwe. Wê weşê me xwera ew hafî derxist ku, hinek "Ulumdarê" li wir beşderbûyî hê nizani bûn zimanê kurdî dikeve nava cêrga zimanzanîya Îranîyê, yanê ya Tirkî. Doktor-profêssor Qanatê Kurdo ew jî rind zelal kir, wekî zimanê Kurdî dikeve nava malbeta zimanê Îranîyê.

Ganatê Kurdo bi dengê miqîm, bi dengê bilind got, wekî zimanê kurdî bi gramêr mîna Mesûd Memmedov beqî wî çîyayê bilind dîsêrtasîya parast û navê ulme zimanzanîyê stend.

Ji wê rasthatinê minra, wek tiştê giran, hêja-wênek maye. Ew wêne li pêşberî Akadêmîya Azerbaycanê hate kişandinê.

Qanatê Kurdo ne tenê ulumdar bû. Nava ruhê wîda agirekî gûr vêdike. Ew agirê milethizîyê bû. Ewî mîna hinek ulumdarên tenê ji nefsa xwe hiznedikir. Vî nefsdarê navdar hemû tişt dikiir, wekî ulumdarên kurdan pêşta bîn û ewana kurdzanîyêva mijûl bin. Qanatê Kurdo çendî-çend keç-xortên kurd bir derxiste Sankt-Pêtêrbûrgê û him di alîyê ulmda, him di alîye aborîyêda bû piştovanê wana.

Hema li Azerbaycanê, Şamîl Eskerov, Masûd Memmedov, Husêyîn Kurdoxlû bi şêwir û alîkarîya wî navên ulumdarîyê stendin.

Bi gorîya min ev bîranîna min, ya derbarê kuling lêdayê kana zimanzanîyê Kurdî wê, wê demê tew, cî bi cîbe gava ez çend salên derbazbûyî jî bîr bînim.

Cara yekemîn sala 1965-a min Qanatê Kurdo rêdaksîya li "Rya teze" dît. Pêhesîyam, wekî qe na, zimanzanê delal, salê carekê ji Sankt-Pêtêrbûrgê tê Yêrêvanê û esse dibe mêvanê rêdaksîyayê. Ew nabe mêvanê xwerin-vexwerinê, lê dibe mêvandar û şirovekirê zimanzanê dewlemend.

Em karkarên rêdaksîyayê-weke 15-e kesa beşterî oda redaktorê sereke-Mîroyê Esed bûn. Gişk bê sebir hîvîya Qanatê Kurdo bûn.

Mîrovekî bejinêda nivçe, serbilind, enî fire, dêmgeş, hate hundur. Gişk berda rabûn. Ew fêza gişka rûnişt, pey hal-hewalra, dest bi axaftinê kir.

Hema ji hevoka pêşîn min tê derxist ev kes xwedanê zanebûneke bêhimbere. Ew ser rastnivîsara zimîn, gilî-peyvîn-gotina sekinî, yên ku, rojnama "Rya teze"-da hatibûne weşandin.

Ew dersdar, pispore bû, em şagirt. Ji wê rojêda min xwe xwera hafî derxist, wekî zimanê kurdî dewlemende û yê ku dinivîse, bila zehmet bikêşîne, ji gilî-gotin, peyvînên dereke dûrkeve, paqîş bi kurdî binivîse.

Ez weke 6 salan rojnameya "Rya teze"-da xebitîm, zimanzanê zimana her sal dihate rêdaksîyayê.

Her mêvandarîke Qanatê Kurdo, ya di alîyê zimînda, bona min dibû zanîgehek. Îro ez hewdizanim min çend zanîgehên zimanzanîyê xwendîye û salên dirêj bi dehan zimanzanên pispore ders dane min.

Ji rasthatina ewlîn gellek bilindariyara tevayî, minra ew yek çawa bîranîna ne bîr kirî maye ku, ulumdarê hizkirî ferhenga xweye bi "Kurdî-Rûsî" bi destên xwe ser nivîsî da min, him jî me karkarên rêdaksîyê tevî wî wêne kişand.

Sala 1992-a.
Bakû.

XERÎBÎ Û SERBILINDAYÎ

Xerîbîya salên dirêj wîra derdê welat, hesreta qewm-lêziman, xwestina heval-hogiran, zîyaret nekirina tirbên bapîran, ew kirine nava xeleqên zincîra hevalîyayî, dîlda xwîn bû telte-telte, por sipî bû, dêm qercimîn, lê xîreta kurdîyê, ruhê şoreşîyê û şerkarîyê nehîşt ew nava hemû dijwarîyada bihêle.

Ji ber ku, hê zarotîyêda ruhê şoreşîyê di nava hiş-sewdayê wîda xwera cî digire. Vê yekêra girêdayî ew dibê:

-Bi serkarîya Mûstafa Barzanîyê nemir dest bi şoreşê bibû. Pêşmerge zû-zû dihatine gundê me. Xwedêgiravî me-zaran wanra hevaltî dikir. Pey çûyîna wanra me xwera ji textan tifing çê kiri bûn. Em dibûne du desta. Destek dibû pêşmerge, yek dibû eskerê hukumetê, ceş. Me peşk davît, kî bibe pêşmerge, kî bibe esker. Ez naha, vî emirê xweda jî şame, wekî qe carekê jî, minra peşka ceştîyê neketîbû.

Em zar derdiketine nava kevir-zinarên fêza gundê me û hev didane ber "gulla". Bi devên xwe dikirin:

-Parte, part!

Me "dujmin" alt dikir.

Ew kîye?

Ew ewledê kurd-Xêyredînê (Xêyrî) Neşet bêgêye. Xêyrî sala 1930 li bajarê Duhokê, Kurdistanê başûr (Îraqê) hatîye dunyayê.

Ew ji nifşê (nasil) hakimên mîrtîya Behdînane. Dîrokzanê kurd Celîlê Celîl dinivîse: "Di destpêbûna sedsalîya XIX li aqara Kurdistanê çend Mîrtîyê mezîn hebûne. Yek jî, ji wana Behdînan bûye". Serbajarê vê Mîrtîyê bajarê Amêdîyê bûye. Hêleşana pêşîyê wî li vî bajarî hatiye hejandinê.

Evê Mîrtîyê ji sala 1339 hetanî sala 1842 domandîye. Mîrê mîrtîya Behdînan, yê paşîn Îsmayîl paşa bûye, birê wî Fetûllah paşa welîyê birê xwe bû û ew bapîrê Dr. Xêyrî bûye. Malbeta wana di dîroka gelê kurda weynekeke mezin listîye. Dîrokêda ev malbet, çawa malbeta Sêyfeddîn eyane.

Xêyredînê Neşet beg li welatê xwe xwendina bilind dest tîne.

Salên 60-î, ya sedsalîya derbazbûyîda li Îraqê qewmandinên sîyasî gellekî li hev dikeve.

Xêyrîyê cîwan tê girtinê. Wîra hukmet êdamê derdixin. Sala 1963-a ji girtingeha bajarê El-Kutê direve.

Rêke dûr-dirêj, bi xof-tirs, tixûbê sê welatara-Îraq-Îran-Azerbaycanêra peya derbaz dibe, tê Bakûyê.

Ew çawa êmigratê sîyasî li vira cî-war dibe. Xêyrîyê Neşet begê li Bakûyê pêdihese, wekî hukumeta Îraqê dubare wîra hukumê êdamê daye birîyar kirinê.

Pêwîste derbarê jîyana wîye li serbajarê Azerbaycanê çend hevokan binivîsîn. Vira xwendina xwe didomîne, bi kel-bin ser hînbûna

zimanê Azerbaycanî û rûsî dixebite. Nava wedekî kinda mifta van zimana jî dest tîne.

Ew li vira dizewice, ji ewlada keçikek dibe qismetê wî.

Sala 1967-a li Ûnîvêrsîteta Dewletê ya Azerbaycanê (Ûnîvêrsîteta Dewletêye Bakûyê ya naha) kafêdra zimanê erebîda dikebe ser xebatê û heta naha ew wira karê dike.

Di nava van salada dîsêrtasîyê diparêze. Pêşîyê çawa navzendê ulmê filologîyê (1983). sala. 2006-a dibe doktorê filologîyê professor. çend monagrafiyan, bi dehan gotarên ulmî dinivîse.

Sala 2003-a pirtûk-monagrafiya Dr. El-Abbasî Xêyrî Neşet ya bi navê "Guhastînên sêmantikên erebîzmê di nava zimanê Azerbaycanêyî wêjeyîda" ronahî dibîne.

Anatasîya monagrafiyêda tê gotinê, wekî ev karpêka nefsdarê civakîyêyî pêşveçûyî yê Îraqê-Xêyrî El-Abbasî ya derbarê "Guhastînên sêmantikên erebîzmê di nava zimanê Azerbaycanêyî wêjeyîda" ya yekemîne. Eva hêjayîke pirr mezine, serbilindaya ewledê gelê kurde.

Monagrafiya binge hî derbarê wê yekêdaye, wekî çawa gilî-peyvînên erebî ketine nava zimanê Azerbaycanî, çawa weteya hineka hatiye guhastînê.

Bona karpêkeke awaye zanîyarî bikaribî biefrînî, derxî meydana zimanzanebûnê, pêwîste cêrbandina teye salan hebe, him bi erebî, him bi Azerbaycanî kûr bizanbî, haj wêjeya klasîk û

nûhdem hebî, pêra jî mifta sura zimanzanîya dunyayê bikaribî bidî xebatê. Çavkanîyên, ku ulumdar pêk anîye, şedetîya zehmetkêşîya doktorê ulmê filologîyê, pofêssor El-Abbasî Xêyrî Neşet, ya bi salên dirêj dide.

... Ji sala 1970 heta roja îroyîn ez û mamoste Xêyrî hevra dostîyê, destebiratîyê dikin. Nava van salada jîyana wî çawa hatîye derbaz bûye, ez rind dizanim. Ew timê nava çarçeva xerîbîyêda bûye, lê ew ser bilind bûye, tu dema bawarîya xwe unda nekirîye. Sal derdaz bûn. rojekê jî şabûna wî li erd-esmîn cî-war nebû, ji ber ku li welatê wî rêjîma qetilkar, ya şevkorîyê bi carekêva hate hûrxaşkirinê. Ewî rê ji rîya dijbart, wekî here welat. Lê minra usa hevhat meha tebaxê, sala 2005-a herime Herêma Kurdistanê Fêdêral, ji wezîrîya rewşenbîra minra dewetname hate şandinê. Wê şabûnê ezê tu dema nikarbim bi nivîsar bidime kivşê, lê qe na, bi çend peyvîn, goinava ya dilê xwe bêjim. Min hewzanibû xwîna bedena min, seranser hate nûh kirinê, cîyê reqemê salên temenên min-71 sal, hate guhastinê, bû xortê 17 salî.

Min dewetname bi erebî stendibû, derbarê vê yekêda min mamoste Xêyrîra têlêxist. Û hîvîkir ew sibê bê ber poçta navîn him dewatnamê bixûne, him Wekîlxana Kurdistanê, ya li Îranê, bajarê Nexedîyêra biaxivin, ji ber ku, ji Kurdistanê têlêxistibûn, wekî ez çawa bême welat.

Weşekî ewî dengê xwe nekir, paşê bi kelogirî got:

-Ahmed bira, ez gellekî şame, ezê sibê filan sehetê bême ber poçtê.

Sibetirê wedê kivşkirî em rastî hev hatin.

Mamoste Xêyrîyê Neşet begê bona min dubare şabû. Têlêxist her tişt safî kir, rîya mine bona herime Kurdistanê zelal-zelal bû.

Min karê çûyînê kir. Rojekê berî çûyînê em dîsa rastî hev hatin. Ewî gellek dexwezê dilê xwe anî serzara:

- Eva nêzîkî 50-î salaye bona cî-warên kal-bavan, bona her mirovekî welatê xwe dinalim. Wedê tu bê gav dimînî, salên dirêj dûrî welatê xwe dijî, ew yek dilê teda dibe birîn. Ew birîn ji hemû birîna bi şewate. Birîn laşê mirovanda derketinê, zû-dereng dermanê wê peyda dibe, ew der dibe, kê m dikişê û tu hê mîn dibî! Hesret, keser, derd kişandina welat, ya qewm-pismaman wê demê, wê ji nava laşê min bikişê derê, gava ez der-dorê zarotîyê bigerim, gava ez çîyan, newal, gelî, şikevt, zer-zinarên welat mêzekim, hêwa wê daqurtînim, ezê hewbizanbim dunêda mirovê herî hetab, dewlemend ezim,tenê ezim!

Me hev hemêz kir, serhevda kelogirî bûn. Paşê min pirsî:

-Xêyrî bira, çi daxweza te heye bêje min, mirin tunebe, ezê bicedînim bî nime cî.

Ewî hejmareke têtêfonê nivîsî da min û got:

-Eva hejmara têtêfona mala birê min-Sêyfeddîne, mala wî li bajarê Duhokê ye.

Min bi şabûneke mezin hejmara têtêfonê hilda. Lê min têtê derxist ew dîsa dixweze tiştêkî bêje, loma min pirsî:

-Kek Xêyrî, venekişe, dîsa dilê tera çi derbaz dibe bêje?

-Minra şûşe ava welat bîne, yek jî bêje birê min, bila minra hinek hişkûlikên (tûtê hişkirî) Duhokê bişîne.

Ewî awa got, pişt a xwe minda kir, desmala desta ji berîya xwe derxist, hêsirên çavên xwe paqîş kir.

Ez êpêcekî ber dilê wîda hatim:

-Xwedê hezbike tuyê jî rojekê herî welat.

Ewî herdu destên xwe ber bi erşê ezmîn bilind kir...

Çarê meha neha, sala 2005-a, seheta 15, ez ji tixûbê Îranê, derbazî tixûbê Kurdistanê bûm. Hema wê rojê şev seheta dua avtoajo, ez anîme Hewlêrê, mêvanxana "Burc Erbîlê".

Xwendevanên bi rûmet!

Ez çawa hatim derketimê Hewlêrê, çawa rastî prêzîdêntê herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî hatim, 23 roja min li welat çawa derbaz kir, ew mijareke dinêye, ezê vê bîranînêda her tenê çi ku, nefsa mamoste Xêyrîra girêdaye qalkim.

5 îlonê, danê êvarê, min bi têtêfonê mala birê mamoste Xêyrîra axivî. Sêyfeddînê birê wî bi xwe têtêfon hilda.

Çawa min got ez kîme, ji ku hatime, weşekê deng nêhat, paşê îske-îsk hate guhê min. Çirîkek-dudu jî derbaz bûnê şûnda, wî bi dengêkî peroš got:

-Hûn ser sera, ser çavan hatine! Hûn kêderêne, em bêne pey we.

Min got, wekî ez lib ajarê Hewlêrê, mêvanxana "Burc Erbîl" ême, rojekê ezê bi xwe bême Duhokê. Her êvar min kek Sêyfeddîn hevra diaxivî...

16 îlonê ez çûme Duhoka rengîn, êvarê em bûne mêvanê kek Sêyfeddîn.

Çima dibêjim em? Ji Hewlêrê mêrsêdêsa Wezîrîya çandêva hatime ser tirba nemir Mûstafa Barzanî, wê wêda bi destûr, kurê pismamê min Celoyê Tahar ez anîme Duhokê.

Gava em ber derê avayê du tayê, yê mala kek Sêyfeddîn ji maşinê peya bûn, 10-15 mirovan em pişwaz kirin. Gişk qewm-pismamên mamoste Xêyrî bûn.

Avayê bi pergal, mala şûştî-mûştî, paqîş, mirovên dêm qeş em heyr-hejmekekar hîştin. Ez dijiwarîyê dikişînim wê rasthatinê bi hûr-gilî qalkim. Mamoste Sêyfeddîn qe ji min dûrnediket. Derbarê birê xwe da pirs ser pirsî dida min.

Bersîvên xweş bihîstinê, te hewdizanibû eva çendî-çend sale ew nava zivistanêke hişke-holda qerisîye, min ji wîra mizginîya baharê, germayî anîye.

Danê şivê em dora destexaneke mezin, fire civîya bûn. Xwedê zêdeke xwerekên bi tem-lem, fêkîyên cuda-cuda destexan xemilandibû. Welleh, billeh destexaneke dewlemend bû, mêvandarî mîna mêvandarîya mîran bû.

Me şîrîn-şîrîn, Xwedê çi dabû, xwer, vexwer, ji destexana nîn hate hildanê, çay anîn. Destexana çayê jî rewş bi rewş bû.

Vê gave kek Sêyfeddîn bi ecêb ji min pirsî:

-Tu û Xêyrîyê bira rastî hev hatinê, çawa kêf-halê hev dipirsin?

Ez weşekê ketime mitala, dilê xwera ew yek derbaz kir, wekî yeqîn mamoste Sêyfeddîn, dixweze bizanbe di vî alîda me erf-edetê kal-bava xweyî kirîye, yanê na?

-Mamoste Sêyfeddîn, -ez kelimîm, -em destê xwe nadine ser sîngê xwe, em dest didine destê hev û kêfxweşîya hev dikin.

Kek Sêyfeddîn giran-giran ji cîyê xwe rabû, hemû beşter bûyî mêze kir û berbirî min bû:

-Destê xwe bide destê min, usa bizanbe ez Xêyrîyê birame.

Ez jî rabûme ser pîya û min destê xwe dirêjî wî kir.

Ewî êmê çend deqîqa destê min berneda. Destê xwe ji destê min kişandinê, destê xwe da ber pozê xwe, te tirê ew gulavê bîn dike. Kesereke kûr rihast û got:

-Min bîna Xêyrîyê bira kişande kezev-pişkên xwe, xwîna laşê min dapalîya. Of,dilo rehetbe, rehet!

Ewî awa got, pişta xwe meda kir, bi desmala desta, hêsirên çavan paqîş kir.

Bona ewî ji wê rewşê derxim min got:

-Mamoste, şukur rê-dirb vebûne hûnê zûtirekê hev bivînin.

Nizanim kek Sêyfeddînê çi bigota, dengê têtêfonê hat. Berî gişka ew rabû berbi têtêfonê çû.

Têtêfona malê, çawa dibên, dîwêrda darda kirî bû. Me gişkan li wî dinihêrî. Ewî desteka têtêfonê hilda, pey silvav-kilavêra got:

-Belê, belê ew li mala meye!

Û karnîyarî min bû:

- Ahmed, kek Bêwar Barzanî te gazî ber têtêfonê dike.

Rastî bêjim çok li min hejîyan, min xwe-xwera got: "Yeqîn li mal tişteke qewimîye". Min têtêfon hildanê, kek Bêwar bi dengekî şa got:

-Kek Ahmed, sibê esse vegere Hewlêrê, dusiba, prêzîdênt cenabî Mesûd Barzanîyê te bipejirîne.

Ewî ew jî serda zêdekir, wekî nivîskar bavê Nazê dixweze te bivîne, ew Duhokê dijî. Têtêfona wî da min.

Min şabûna kire qîrinî! Gişk şaşmayî man. Min menîya şabûna xwe gote wana û serda zêde kir:

-Kek Sêyfeddîn, nanê mala we helale! Tê kivşê berêda mala we, mala mêvan û xêrxwezan bûye. Xêrîyê dostê min jî mirovekî dilpaqîşe, lema vê êvarê, ser destexana we, mizginî dane min. Ezê prêzîdêntê Kurdistanêyî yekemîn, ewledê nemir Barzanî bivînim, serokê Kurdistanê aza hemêz kim, maçkim.

Şabûna me bû şayî! Kurê mamoste Sêyfeddîn yê biçûk-kasê danî ser magnîtafonê, me jî govend girt.

Hetanî kûraya şevê şabûn, gilî-gotinên me hate domandinê.

Vira giringe çend hevokan derbarê Bêwar Barzanî da binivîsim û bila xwendevan bizanbin ew kîye?

Bavê kek Bêwar-Evdilrehmanê rehma tîlêbûyî pêşmerge nemir Barzanî bû.

Ber destê me çend belge-dakûmêntên arşîva, yên ku, derbarê şoreş, keseyata Mûstafa Barzanîyê nemirdanin, henin. Yekê wanda tê gotinê:

-13 noyabrê sala 1947-a rêveber Azerbaycanê M. C. Baxirov serkarê dewleta Sovêta Î. V. Stalînra dinivîse, wekî 15 îyûnê sala 1947-a di tixûbê Îranê-Sovêtêra desta Kurdên Îraqê weke jimara 500 mirovî, bi serkarên wan Molla Mûstafara derbazî navberîya me bûne. Paşê belgêda ew yek tê ser zara, wekî me ew mirovana nava çar nehîyên rêspûblîkêda dane belakirinê.

Ew nehî evin:

1. Axdam - 148 mirov.
2. Axcebedî - 97 mirov.
3. Kelbecer- 100 mirov.
4. Laçin - 150 mirov.

Molla Mûstafa û çar mirovên wîye nêzîk Bakûyêda hatine xayîkirinê.

Nava wan çar mirovada navê bavê Bêwar Barzanî hatîye nivîsarê. Bêwar Barzanî ber pirsîyarê kovara "Gulanê"-ye.

Ew xwedanê zanebûneke kûr, çandeke bilind û xemxurê her kesîye.

X X X

Sibetirê em hinekî Duhoka rengîn gerîyan, rastî nivîskar Bavê Nazê hatin. Berêda me hev nas dikir, li Moskvayê çend cara rastî hev hatibûn

û efrandariya wîra nas bûm. Me tevayî wêne jî kişandinê.

Vê bîranînêda ewê jî bînime serzara, wekî 18. IX-2005-a Serokê harêma Kurdistanê Fêdêral bi rêz Mesûd Barzanî ez pejirandim. Min çawa jorê jî da kivşê, ew rasthatin, bîranîn mijareke dine.

23 meha neha, sala 2005-a berbangê min berê xwe da Kurdistanê bi hesret, piştî xwe da welatê nexwestîyên kurdan û bi dengê bilind got:

- -- -Dayîka dîya min Kurdistan, îro ez paştî vedigerim! Tu hemû derd-kulên xwe, kirinên neyara bike kefen, ez ustuyê xwe balînim, xwera bibim, bila careke mayîn dengê top-tifîngan guhê teda neyê!

Min çok veda, axa Kurdistanê weke çepilên xwe hemêz kir, maç kir, hêsirên çavan xwe paqîş kir û paştî vegerîm.

... 26 meha neha, sala 2005-a, bûme mêvanê mala mamoste Xêyîrî.

Dilşakî dilêşekîra bi monik-monik qal dikir, wekî ew çawa çûye derketîye welatê dê û çawa vegerîye Azerbaycanê.

Min lîtr ava welat û hişkolekên ji Duhokê anî da mamoste Xêyîrî. Ew sivik ji cîyê xwe rabû, badin-stekanek hilda çend cara av tewarda, hat cîyê xwe rûnişt, bi destê ricaf şûşa ava Kurdistanê hilda, hinek valakire badînê û vexwer.

-Hingî ez ji welat dûr ketime, - ewî bi dengê şa got,

-Xwedê zane min çiqas av vexwerîye, lê hey dilê min dişewitî. Ev ava te anî tîbûna mine salan şêkand! Aloşa salan ji laşê min derket!

Paşê devê tûrikê hişkolekan vekir, kulmek hilda, hinek avîte devê xwe, xwer û ez hemêz kirim bi kelogirî got:

-Bîna xwezaya Kurdistanê, tem-lema barê axa wê ji van hişkoleka hat, te tirê nava çend deqîqa da ez cîwan kirim! Xwedê te şake!

-Kek Xêyrî,-min got, - îdî Kurdistan hatîye damirazandinê, rê-dirb vebûne, Xwedê hezke tuyê jî rojekê welatê xwe zîyaretkî.

Ewî qe tiştek ne got, herdu destê xwe bilind kire hewa.

20. XII-2005. Bakû.

Naverok

1. Xemildarên jîyanê	7
2. Bîranîn û xewin	11
3. Roja nebîrkirî	20
4. Kirin pêşê mêrane	26
5. Nanê sêlê, zikê birçî	34
6. Malbeta bi rûmet	41
7. Deva Sipî	76
8. çîya bû, zû hedimî	89
9. Hêleçana jîyanê	99
10. Mala mêran	131
11. çîya bilinde, rê dibera	167
12. Xerîbî û serbilindayî	175

زنجیره‌ی چاپکراوه‌کانی سالی 2011ی وه‌زاره‌تی رۆشنبیری و لاوان

به‌رپۆه‌به‌رایه‌تی گشتیی رۆژنامه‌نووسی و چاپ و بڵاوکردنه‌وه

به‌رپۆه‌به‌رایه‌تی بڵاوکردنه‌وی هه‌ولێر

ژ	ناوی کتێب	ناوی نووسەر	بایه‌ت	نرخ	لاپه‌ره
532	مذکرات یوسف حنا یوسف (أبو حکمت)	یوسف حنا یوسف	مذکرات	5000	264
533	له‌ که‌شاری هه‌زو زمان و ئه‌ده‌دا	عه‌بدوله‌حمان مه‌عروف	وتار	2000	192
534	لێکدان‌وه‌ی شیع‌ر و نامه‌زانی پشت‌وه‌ی نیکمست	ئالوات محم‌ده‌	ره‌خنه‌ی ئه‌ده‌بی	2000	184
535	په‌سه‌به‌که‌ له‌گه‌ر زه‌ره‌رخنه‌ی (با)	سه‌ره‌ه‌نگ خام‌وش	شیع‌ر	1500	120
536	برێی نیشتمان	و. عه‌بدولستار جه‌باری	چیرۆک	1500	112
537	په‌ندێن ژانی گوتنێن زانا نافه‌ارین جه‌انی	محم‌ده‌ سالح پێندزێنی	گه‌شتی	5000	328
538	خ‌م و خه‌نده	عوسمان رسول	شیع‌ر	1500	120
539	هونه‌ری گوێگرێن	و. په‌ه‌زاد خه‌وێزی	ده‌روونناسی	3000	246
540	فیه‌که‌ی ئاده‌ شا	د. مه‌وحسین ئه‌حم‌ده‌	پێزان	1000	64
541	فیه‌تینیزم و چه‌ند خۆپێندنه‌به‌کی تازه	و. نامه‌ده‌گه‌شتی په‌یان عه‌زیزی	گه‌شتی	3000	200
542	فره‌ه‌نگی په‌ختان له‌گه‌رانی ژنی کرمانجی (1926-1932)	مست‌فا سالح مست‌فا	ئه‌ده‌ب	5000	224
543	فیکرو فاسفه‌ ده‌قی جه‌انی	و. تاریق کارزێنی	لێک‌لێنه‌ره	5000	336
544	تایه‌ده‌ساری	تاهیر عوسمان	کۆمه‌له‌ وتار	3000	192
545	مروژ و جاک	د. عارف حه‌یق	کۆمه‌له‌ وتار	3000	312
546	بهره‌ورییه‌کانم	مست‌فا عه‌سک‌ری	بهره‌وری	5000	360
547	هێلان‌که‌م له‌ کوردستان	سازان مه‌ده‌قی مه‌نده‌لاری	گه‌شتی	5000	304
548	عه‌لی شوون مه‌ل‌گر	نه‌حسین شێروانی	فۆلکلۆر	2000	80
549	خه‌یاڵیکی پووج	به‌ختیار تاهیر	کۆرته‌ چیرۆک	1000	40
550	مه‌قابله‌ت و نه‌فسانه‌ی مه‌یله‌تان	ئیدریس عه‌بدوللا	فۆلکلۆر	3000	272
551	ئه‌ده‌ب وه‌ک به‌شیک له‌پووج	غهم‌گین بۆلی	لێک‌لێنه‌وی ئه‌ده‌بی	2000	136
552	دوره‌وازه‌یه‌که‌ به‌ره‌و فاسفه‌	کامه‌ران تاهیر	وتار	1000	88
553	خه‌ونی شادی	کۆکرده‌وه‌و نووسینی نیازی حه‌مه‌ عه‌زیزی	شیع‌ر	2000	208
554	چه‌په‌که‌ گه‌لێکی رۆتیار بۆ کوردستان	ئه‌مه‌یه‌که‌ر عه‌لی ئه‌یسه‌م‌عیل	شیع‌ر	2000	248
555	سیاسی ته‌هره‌که‌ له‌ کوردستان له‌ رۆانه‌ی بێسۆزی بۆ ئه‌نگلی	ئا: وریا ره‌حمانی	سیاسی	4000	280
556	سیاسة‌ الحکم	ترجمه‌: عبده‌لرحمن الیاسا	دراسات	3000	168
557	کوردو ئه‌یسلام	ئه‌حم‌ده‌ بالایی	مێژوایی	5000	548

558	ساتى راستگىيى	و: شەرىف عەبدوللا	كۆرەن چىزىك	2000	136
559	مەرىگى گەرنەنە	سامى سەلىمان فەقەن	زۇمان	3000	204
560	دەردى ئوۋى	د. رەھىق شىۋانى	شىبەر	2000	208
561	پىرسىيار لە دەردەۋى سىۋەكەى ئىوتىن	ئا: سۇرەن غەزىز	گەشنى	3000	416
562	غەللىز ۋەكۇ پىئورەك بۇ سانگۇرەۋى شىبەرى ئالى	يادگار رەسول پالەكى	لېئىكەنەۋە	4000	624
563	ھەۋرە تىرىشقا	مۇكەررەم رەشىد ئالە بانى	چىزىك	3000	168
564	بەئىتەكانى ئىنگىلىز ۋە كوتارى مەۋرەۋانى كورد	بەھات ھەسەب قەرداخى	سىياسى	2000	120
565	فاعلىة المصرح اللىبىي.. بىن الفكر والفن	ا.د. فېصل ابراهيم القنادى	فنون مسرحية	5000	544
566	پىل	غەزىزى مەلە ۋەش	زۇمان	3000	296
567	شۆۋرە ئادەبىيەتلىك نىزامى خەبات (2003-2006)	د. ئارىيانا ئىبىرھىم	زۇننامە نوۋىسى	5000	560
568	يانەى ۋەرزىشى مۇلاڧ لەيلى (41 سالەيدا)	ن. ئا. شېخ سەئاد عەبدوللا بىزىنى	ۋەرزىشى	4000	296
569	پېتىچ داستانى كوردەۋى	ياسىن ھەسەن گورەن	فۇلكۇر	3000	248
570	نظام العالمى لىبىد زەئىلا قومبىن الاثبات فى الفنون الاوسط	رەبىۋار عەبدۇلھىم بابكەيى	سىياسى	3000	288
571	ۋەرە با يارى يەكەن	ۋەركىتلى: زەئاد مەھمەد مۇراد	زەئىتى	—	48
572	سىفېيەكان2	ئا- ۋەركىتلى: شىزەاد ھەيىنى	گەشنى	3000	264
573	الادب الكوردى	د. كەمال مەھمۇد	ادب	2000	80
574	منطقة رىكان	لەزەز اسماعىل عەبدۇلھىم كەركانى	جەغرافىيە	2000	96
575	ئىبىزىيەنى ئىتالىيەلىك اسەنەۋى ئەمال. لەر كۆرۈنەنلىك	رەھىم شا مەھمەد	زەمان	2000	184
576	ھەزىزەن د پىرسىن قەسەمەنى دا	مەھسەن ئۆسمەن	ھەزىز	3000	340
577	بۈۈكە بەردىنە	ئازاد كەرىمى	ئەدەب	2000	128
588	لەبەر ئاكرەتلى مام سۇق ھەسەن كۆرۈ	مۇزەفەر ھەسەن غەزىز كۆرۈ	فۇلكۇر	2000	176
589	زەردەخەنەكانى ئاۋ ھەگەيە گەردى	ن. ئەمەد كۆرۈ: ھەمەد كۆرۈ	گەشنى	1500	176
590	پۇتۇرتىتى شەئىرەنى ئاۋدارانى كورد	نۇسەين ۋ ئامادە كۆرۈ: كەمال ھەزار	ھونەرى	5000	120
591	ۋنار نۇسەين	ۋەركىتلى: جەمال مەھمەدى	زۇننامەۋانى	3000	280
592	سورىا سابىع اسۋا دولە فى العالم ائىنھاكا لىحقوق الانسان	ئازاد كۆرۈ	گەشنى	3000	432
593	نفاق سۇلەيلى الاكادىر لىحقوق لىحقوق لىحقوق لىحقوق	زەئىب ۋەھىد دھام	قانون	2000	96
594	ئابلىق جېھاننەبەكان	ئاكىر غەبەللا	ھونەرى	6000	168
595	ئەتەسسى پارىزىكەى ھەۋلەز	د. ھاشىم ياسىن ھەمەد مەيىن كامەران ۋەلى مەھمۇد	جۇگرافىيە	5000	72
596	خەدرى زەئەدە	مەھمۇد غەبەللا مەھمۇد	چىزىكى فۇلكۇر	2000	144
597	سۇرەكان بەقاجاڭ بۈۈكەن كۈستەۋە	ئولتۇرۇش كاپۇر- كاپۇر ۋەھىر	زۇمان	4000	224

304	5000	سیاسی	خوشه‌وی علی پاپیر	نلاره‌یی و ژبانی کۆله‌مهرکی کورد له هه‌نده‌واندا	598
256	3000	ره‌خنه‌ی ئه‌دبی	ئازاد عه‌بدولواحید	کولتور و ناسنامه	599
96	2000	هونه‌ری شائو	مه‌حمود زامدار	یه‌ناز	600
184	5000	مێژوویی	و. له‌عه‌ره‌یه‌ره: ره‌فیل مه‌لا گه‌رم هه‌رکی	ژبانی نابینی له‌ نه‌هری یۆ بارزان	601
88	-----	گه‌شتی	نادر روستی	چۆن ره‌فتار له‌ گه‌ل گه‌شتوگه‌زاندا بکه‌ین	602
136	2000	وتاری لیکۆلینه‌وه	ره‌هوف مه‌حمود پور	خۆنگه‌ی گه‌ران له‌ هه‌ره‌یه‌ی خۆنه‌کاندا	603
192	2000	گه‌شتی	رئین ره‌سول ئیسماعیل	وامایانا	604
240	3000	مێژوویی	نوسینی: عه‌باس سلیمان سه‌ایل	لوپستان له‌ مێژوودا	605
260	3000	گه‌شتی	ئاماده‌کردنی: نامق هه‌وراسی	هه‌ژار له‌ سه‌نه	606
262	2000	شعر	خالد کۆچه‌ر	جانتای سه‌فه‌ری نه‌سجارت په‌یه‌تی له‌ گریان	607
40	1000	شعر	سلوی گولی	سفر مه‌موم احلامی	608
192	3000	بیره‌وه‌ری	ئه‌حمه‌د ئه‌ه‌بۆ	خه‌مه‌دین ژبانی	609

ئەحمەدى ھەپۆ

خەمەلدارىن ژيانى

بىر ئانىن

PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

